ZANÎNGEHA YÜZÜNCÜ YILÊ

ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ

| | |
|---|---|
| **TEZA** | **REHNDÎ DERÛNÎ** |
| **LÎNSANSA** | **DI HELBESTÊN EBDULA PEŞÊW DE** |
| **BILIND** | **SAFEN MOHAMMED HUSSEIN HUSSEIN** |

**ŞAXA MAKEZANISTA**

**ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

**RÊBANDAN - 2017**

**ZANÎNGEHA YÜZÜNCÜ YILÊ**

**ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ**

**ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN û ÇANDA KURDÎ**

**Teza Lîsansa Bilind**

# Rehendê Derûnî Di Helbestên Ebdula Peşêw De

**SAFEN MOHAMMED HUSSEINHUSSEIN**

**14950001074**

**Şêwirmend**

**Alk. Doç.Dr. Nesîm SÖNMEZ**

**WAN– 2017**

T.C.

**YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVESİTESİ**

**YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ**

**KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

**Yüksek Lisans Tezi**

# Abdullah Peşev'in Şiirlerinde Psikolojik Boyutlar

**SAFEN MOHAMMED HUSSEINHUSSEIN**

**14950001074**

**Danışman**

**Yrd. Doç.Dr. NESİM SÖNMEZ**

**VAN – 2017**

# ETİK BEYAN SAYFASI

Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Yaşayan Diller Enstitüsü Tez Yazım Kurallarına uygun olarak hazırladığım bu tez çalışmasında **(**Rehendê Derûnî Di Helbestên

Ebdula Peşêw De**.**

Tez içinde sunduğum verileri, bilgileri ve dokümanları akademik ve etik kurallar çerçevsinde elde ettiğimi.

Tüm bilgi belge, değerlendirme ve sonuçları bilimsel etik ve ahlak kurallarına uygum olarak sunduğumumu.

Tez çalışmasında yararlandığım eserlerin tümüne uygun atıfta bulunarak kaynak gösterdiğimi.

Kullanılan verilerde herhangi bir değişiklik yapmadığımı.

Bu tezde sunduğum çalışmanın özgün olduğunu bildirir, aksi bir durumda aleyhime doğabilecek tüm hak hayıplarını kabullendiğimi beyan ederim.

# Naverok


Kurte ........ vii

Özet ........ viii

Abstract ........ ix

Pêşgotin ........ xi

Destpêk ........ 1

Beşa Êkem ........ 2

1. Saykolojî û Edebîyat ........ 2

1.1.Term û Têgeha Saykolojîyê ........ 2

1.2. Edebiyat û Rexneya Derûnnasiyê û Mekteba Derûnşîroveyîyê ........ 3

1.3. Metoda Derûnşîroveyî Di Edebiyatê De ........ 8

1.4.Dîroka Rexneya Derûnnasiyê ........ 10

1.5. Pêwendî(Eleqe)ya Derûnnasî û Şîîrê ........ 11

1.6. Huner û Edeb ........ 12

1.7. Jiyan û Berhemên Siegmund Freuyd ........ 13

1.7.1 Jiyana Freuyd ........ 13

1.7.2. Girîngtirin Hizr û Ramanên Freuyd di Parvekirina Straktora 'Eqlê Mirovan de. 14

1.7.3. Kesayetî Bi lêramana Freuyd ve ........ 15

Beşa Duwem ........ 17

2. Jiyannameya Ebdulla Peşêw ........ 17

2.1.1. Jiyana Ebdulla Peşêw ........ 17

2.1.3. Nerînên Nûseran Derbarê Kesatiya Ebdulla Peşêw ........ 21

2.2. Hêma û Hêmagerî di Helbestên Peşêw de ........ 22

2.2.1. Naskirina Çemkê Hêma û Hêmagerî ........ 22

2.2.2. Serhildana Hêmageriyê ........ 23

2.2.3.Cûrên Hêma ........ 25

2.2.3.1. Hêmagerya Mirî (giştî) ........ 25

2.2.3.2. Hêmagerya Zindî (Kesî) ........ 26

2.2.4. Sedemên Bikaranîna Hêmayê ........ 26

2.2.5. Çavkaniyên Hêmageryê di Helbestên Peşêw de ........ 31

Beşa Sêyem ........ 41

3.1. Bê Hîway – Hîwa - Bêhêvî yî - Hêvî! ........ 41
3. 2. Hêvîya Civakî ya Hîm Danîye Li Ser Daxwaza Azadî, Evînê û Hevaltîyê ........ 46
3.3. Reşbînî ........ 47
3.4. Aştî ........ 52
3.5. Bîra (Ramana) Mirinê ........ 54
3.6. Mirin ........ 56
3.7.Geşbînî ........ 61
3.8. Xurbet ........ 62
3.9. Azar û Renc (pîkol) ........ 67
3.10. Evîn ('Eşq) ........ 72
3.11. Şerim ........ 77
Encam ........ 80
Çavkanî ........ 81
Xwe Jînenîgarî ........ 85

**Kurte**

Di vê vekolînê da armanca me ew e ku pêwendîya di navbera wêje û derûnnasîyê da têxine rû, di ser da jî pêwendîya helbest û derûnasîyê binirxînin. Çimkî karê serekeyê rexneya derûnnasî ew e ku pêwendîya wêje, huner û kesayetiyê bi şêweyekî bingehîn û giştî binirxînin. Ji ber wê ev vekolîn ji pêşgotin, kurte, detpêk, naverok, encam û çavkanîyan pêktê. Di beşay ekem da me nasandin ji bo ‘’derûnnasî û wêje’’ yê kir û di navberê da jî me behsa çend mijaran kir. Di beşa duyem da me behsa ‘’Jîyannameya 'Ebdulla Peşêw’’ û çend hemayên ku di helbestên xwe da bikar anîye kir. Di beşa sêyem da jî me çend ramanên derûnî ku di helbestên ‘Ebdulla Peşêw da hene xistin rû. Hinek ji wan; bêhêvîtî, hêvî. Civakîya ku hîmdanîye li ser daxwaza azadî, evîn û hevaltîyê, reşbînî, aştî, ramana mirinê, mirin, geşbînî, xurbet, azar û renc, evîn û şerim. Li aliyê teorîyê ve me bi kurtî behsa wan ramanana kirîye û paşê jî me mînakên helbestê ji bo wan daye. Di dawîyê da jî em gihîştin encamekê ku me di vê vekolînê da gelek çavkanîyên kurdî, ‘erebî, farisî û îngilîzî bi kar anîn ku di dawîya vê vekolînê da bi şêwazeke zanistî me ew diyarkirin.

**Özet**

Bu çalışmada amacımız edebiyat - psikoloji ilişkisini ortaya koymak ve psikoloji ile şiir arasındaki ilişkiyi incelemektir. Çünkü psikoloji eleştirisinin temel fonksiyonu sanat ve edebiyatın kişilik ile ilişkisini incelemektir. Bu çalışma önsöz, özet, giriş, içerik, sonuç ve kaynaklardan oluşmaktadır. İlk bölümde edebiyat ve psikolojiyi tanımladık ayrıca birkaç konudan bahsettik. İkinci bölümde Abdullah Peşew'in biyografisini inceledik ve şiirlerinde kullandığı bazı öğelerden bahsettik. üçüncü bölümde de Abdullah Peşew'in şiirlerindeki umut, umutsuzluk, özgürlük isteği, aşk ve arkadaşlık, barış, öiüm fikri, ölüm, gurbet, acı, keder, aşk ve utanç gibi bazı psikolojik unsurları inceledik.Teorik yönden bu tür unsurlardan bahsettik ve şiirlerden alıntılarla örneklendirdik. Sonunda çalışmamızı son uçlandırdık ve çalışmamız için kullandığımız kürtçe, ingilizce, farsça ve arapça kaynakları bilimsel araştırma kuralları çerçevesinde sunduk.

**Abstract**

The objective of this research is to expose the relationship between literature and psychology as well as the relationshipbetween poetry and psychology, because the major task of psychological criticism is to evaluate the relationship of literature, art and personality in basic and general form. Therefore, this research includes: introduction, abstract, body, three chapters, conclusion and resources. Chapter one contains the identification of ((psychology and literature in addition to various discussions on this issue)). Chapter two is dedicated for a summery about ((the life of Abdullah Pashew and several signs that are used in his poems)). In chapter three some of the psychological terms are exposed that can be seen in Abdullah Pashew's poems including (( hopelessness-hope, social hope based on love for freedom, loving and friendship, pessimism, peace, death remembering, death, optimism, homesick, hurt and effort, love and shyness)). Theoretically, a summary of each of the terms has been exposed preceded by showing some sample poems. Finally, we reached the point that we have exposed these results. Various resources are used in this research such as Kurdish, Arabic, Persian and English resources. At the end, we have exposed them scientifically.

**Spasî**

Ez pir spasiya mamosteyên hêja û rêzdar ên beşê zimanê kurdî li Zanîngeha Yüzüncü Yılê dikim ku bi ked û dilsoziyeke herî mezin bi me re westiyan. Herwiha ez pir sipasiya Alk. Doç. Dr. Nesim Sönmez dikim ku erkê serpereştîkirina vê lêkolînê li stûyê xwe girt. Herwisa sipasiyeke min a bêhed ji birêz Dr. Mizgîn mamoste li beşê kurdî yê Zanîngeha Selaheddinê ku pir alîkariya min kir. Li dumahî de ev xebat pêşkêşî bav û daykî xwe dikim û her wisa ji bo hevjîna xwe jî gelek sipasiyan dikim.

**Safen Mohammed HusseınHUSSEIN**

16 / 01 / 2017

**Pêşgotin**

Eşkere ye ku pêwendîyek xurt û bihêz di navbera wêje û derûnnasîyê da heye, bi wê jî dema ku berhemên wêjeyî û helbestî hatine holê vê pêwendîyê serîhilda ye. Çimkî dema ku helbestvan deqeke helbestî dihûne, ev deqa helbestê delaletê li hest û hidama (nest) helbestvan dike.Loma (ji ber wê) her deqek guzarişt (ta'bîr) ê li kesayetî û hinava (hundur) nivîskarên deqan dike, rewşa derûnî ya nivîskaran di nav deqan da xwe vedişêre. Dema ku rexnegir jî dest bi vekolîn û şîroveyên deqan dike, dest bi şîrovekirina kodên (şîfre) nav deqên helbestê dike.Di heman demê da ev karê rexnegir xwe bi xwe karekî derûnnasîyane ye, çimkî nirxandineke giştgirî (fireh) encam da ye li ser rêmanên derûnî. Ji bo ku deq bigêjin delaletên veşartî yên pişt nivîsandina deqan, ji vir da rêbazên derûnnasî dest bi derxistinê dikin, çimkî şikil û şêwazên her rêbazî cuda ye.Ev li alîyekî li alîyê din coreyên rexneyî ya şîroveya derûnî serîhildide, têkilîya vê jî bi destnîşankirina rewşa derûniya helbestvan ve heye. Ji ber wê dema ku dibêjin; rewşa derûnî ya xwedîyê vê helbestê cîgir e yan necîgir e yan jî her rêmaneke din be ji vî karî re dibêjin ''Karê Rexneya Derûnnasane''.Me di vê vekolînê da rêbaza wesfî ya şîroveyî bikaranî, armanca me ya ji bo hilbijartina vê mijarê ji çi çavkanî wergirtîye?.Bi rastî di nav karê wêjeyî da û di derbarê wêjeyê da gelek lêkolîn û xebat û nivîs têne xuyakirin, lê li ser derûnnasî û pêwendîya wê bi wêjeyê heta nika xebat û vekolînek wiha encam nedaye. Eger ku vekolîn û xebatên li ser hebin jî gelekî kêm in, her ji ber wê me ev vekolina weke erk û peywira ser milê xwe zanîbû ku em li ser vê mijarê xebatê bikin.Bi wê hêvîya ku valatîya vê mijarê em tijî bikin

**Destpêk**

Me bi erkê xwe yê zanistî ve zanî ku, bi dîtina derûnî ango psîkolojîk ve em çav li Ebdula Peşêw û berhemên wî yên helbestî bikin û di bin navnîşana ‘’Rehendê derûnî di helbestên Ebdula Peşêw’’ de, li gor rêbaza derûnî, bi taybetî li cîhana helbestî û wêjeyî de, em li Peşêwê helbestvan binêrin. Bi vê armancê em ronahiyekê bixin ser gelek aliyên derûnî yên berhemên wî yên helbestî, ku heta naha bi awayekî zanistî nehatine ronahî kirin. Di lêkolîna me de, ku bin navnîşana rawekirina helbestên Ebdula Peşêw, di bin ronahiya bingehên derûnînasî de, me berê xwe da çend çemkên derûnî, ku wana geşbînî, reşbînî, xemxwarî, tirs, şerm, dilnazikî, xeyal, xew bi giştî ji aliyê teorî ve her çemkek ji wan çemkane kurteyek me di vê derbarê de danî holê, piştre jî nimûneya helbestan li ser hate dayîn. Diyare naverok û rêveçûna helbestan wa lê kiriye, em berê xwe bidin û çend çemkekan rabin hilbijêrin ji aliyê derûnî ve û piştî avakirina kurteyeke teorî di vê derbarê de, piştre nimûneyeke helbestê anî da berhev û li ser bingehê ronahî û xasiyetên çemkên wan de rawe û lêkdanek ji bo helbestan me kir, ku bi rêya rawekirina psîkolojîk a aliyê navxweyî ya helbestên Peşêw û lêkdan û rawekirina wan li gor bingehê derûnî û pratîk kirina çemkên dibistanê analîz û rawekirina derûnî em bikin binemayê derûnî û xasiyetên derûnî yên helbestvan ku di nav helbestên wî de diyare û xwedî rol in, di berhem anîn û bidestxistina nivîsên helbestî de hebûna xwe diyar kiriye û bi vê mekanîzmayê ve jî aliyên veşartî yê helbestvan wê ji bo me derxe hole, ku jiyana wî ya psîkolojîk di nav nivîsên wî yên helbestî de çawa reng daye. Rehendê derûnî di helbestên (Ebdula Peşêw) de. Rêbazê derûnnasî bi giştî û rêbazê rawekirina derûnî, bi taybetî tê de bikar hatiye. Dema ku bi dîtina zanistî ve em karekê pêkbînin û dinivsînin, bê guman dibe kemasî hebin. Ji aliyê wêjeyî û navnîşaneke nû, ku emê destnîşan bikin pêwîstiyeke zêde bi çavkaniyan heye, nebûna çavkaniyan jî yek ji pirsgirêkên herî giringe di nivîsîna nameyeke zanistî û akademîkî de.

## Beşa Êkem

## 1. Saykolojî û Edebîyat

### 1.1.Term û Têgeha Saykolojîyê

Têgehiştina terma saykolojiyêji aliyê wate û peyvê ve têgekeke aloz û ne zelal e. Lê ji aliyê wate û navde arêşeyeke bingehîn nîn e. Her ji ber wê yekê, eger vegerîn ji bo sinc û koka terma derûnnasiyê dibe ku destpêk li binaxe û binetara derûnnasiyê destpêbikin û xal bi xal hemî mebest û aliyên zanista derûnnasiyê destnîşan bikin. Paşan ev peyv çewan û ji ku derê hatiye, ji bo çi meremêtê bikaranîn. Li ku derê bikar hatiye, eger em ji terma derûnnasiyê bi xwe tê bifikirin, ji bo me ronî dibe ku zanista derûnnasiyê bi çendîn awayên cuda hatiye şirovekirin û lêkolînên zanistiyên hûr li ser hatinekirin. Her derûnnasek bi awayek cuda şîrove û lêkolînên zanistiyên hûr li ser kirine. Her derûnnasek bi şêweyek raman û hizr û bîrên xwe li ser vê termê diyar kirine. Her ji ber vê yekê dibînîn zanista derûnnasiyê bi çendîn mekteb û rêbazên cuda derkeftiye. Ruhn û eşkere ye ku ew şiroveyên û cur bi cur yênku van mekteban kirine dibin sedemên alozîyan ji bo cudahiyên bîr û hizrên lêkolîneran û twêjerên derûnî. ((*Peyva derûnnasî li peyva (Psychology) hatiye wergirtin, ew jî ji du paran pêk hatiye.(Psych) bi maneya rih yan derûn)*)[1], li *((gel peyva (logy) bi maneya zanist yan lêkolîn dihêt))*[2]. Wate (Psychology) bi maneya zanista derûnî yan jî ruh dihêt.

Paşan ev peyv ku di zimanê Yewnanî de *((terma derûnzanî(Psychologos) ku bi zimanê Înglîzî(Psychology) û bi Ferensî(Psychogie) ye, di dumahiyê de rewşenbîrên Ereb ji bo gelek cur û şêwazan te`bîr li terma derûnnasiyê kirine. Weke, e`lim û alnefis, saykolocia, e`lum alnefis))*[3]. Ji ber wê yekê di nav rewşenbîr û nivîsarên Kurd de hinek term û peyvên cuda dihên bikaranîn. Her çend ji aliyê forma wê peyvê ve formên cuda hebin jî, ji aliyê watê ve heman mane heman naverok heye.

---

[1]. E`zeddîn Ehmed E`zîz," *Binemayên Derûnnasîya* Giştî ", Çap û Belavkirina Rojhelat, Hewlêr2012, Çapa Sêyemîn, R 19ê.

[2]. Mihemed Yunis. "*Mebadî E`lim AlnefisÊ"*, Daralşerq lilneşir û Altewzie` Ordin 2004, R 17ê.

[3]. Mihemed Mehmud Alcibury, "*Mebhes Fî Mtabe"*` Came` (Musil, Mudirîyet Metbe`t Alcame`e, 1984, R 52ê.

Ew termên ji bo saykolojiyê ku di nava Kurdan de dihên bikaranîn evin.*(( zanistên hiyomen, saykolociyetî, saykolocya, derûnnasî))*[4], Eger em awirek bidin hemû van termên cur bi cur ên cîhanê, ruhin dibe ku terma saykolojî wek peyvek hevpar bikar Hatiye di nav zimanan de û wateyeke hevpar eve*((saykolojî manaya derûnzanî yan jî zanista derûn li xwe digire))*[5]. Ev terma*((psychology))*[6]bo cara yekemîn ji aliyê derûnnasê Emrîkî (Wiliyam Ceymis) di sala 1898'an de, di kitêba wî ya bi navê(Binemayên Derûnnasiyê- Principle of Psychology) de hatiye bi kar anîn. Derûnzanî *((zanistek e ku jiyana kesan vedikole; hest, soz, bîr, hizir, hêvî, miraz û helçûnên kesan li xwe digre. Derûnzanî li ser mirovan dixebite û lê dikole kamirov çawa dihizire, çawan tiştan diîne bira xwe, çawan fêr dibe, û çawan hez dike û çawan têdigehêje. Her wiha derûnnasî pêkhateyên kesayetî û helwestên civakî û reftarên nexwaz vedikole. Di derûnzaniyê de mijarên sereke reftar û sincin.))*[7]Reftar hemî çalakîyên mirovan vedigire. Wek çawan dixwe, çawa têdigihêje, çawa dixwîne, çawa bi rê de diçe, çawa hizir li kesên nêzî xwe dike, yan jî çawa li gel xwe reftar dike. Yanê ew reftarên dike ka gelo di jiyana rojane de xêrek ji wî re heye an na? Lê belê raman û hizirek hûr li terma derûnnasiyê ruhin dibe ku, derûnnasî bi çendîn şêweyên cuda lêkdan û şirove jê re hatine kirin. Her derûnasek bi awayek û li gorî hizir û bîrên xwe derûnnasiyê şîrove kiriye. Her ji ber vê sedemê ye ku çendîn mekteb û rêbazên derûnnasiyê hatine avakirin. Zor û ze`fîya mekteban vedigerin bo cudahiya raman û hizrên zanayên derûnnasî.

### 1.2. Edebiyat û Rexneya Derûnnasiyê û Mekteba Derûnşîroveyîyê

Dema lêkolîner bi ramana hundirî ve li *((berhemên edebî dinihêre, ev kar bi xwe rexneyeke edebî ye. Parek mezin ji lêkuleran di wê baweriyê de ne ku li lêkdan û şîroveya her babetek edebî gavavêtineke ji bo hundirê zanista derûnnasî)).*[8] Her li vir ruhin dibe ku derûnnasî amêrek alîkarî ji bo derxistina têgeha waqe`î ya mijarek diyarkirî ya edebî ye.

---

[4]. Serdar Ese`d, "*kurte Basêk le Bareî Saykology Giştî*", Çapxaniy Mukrîyan, Çapa Êkem Hewlêr, 2014, R 10ê.
[5]. Kerîm Şerîf Qereçetanî, "*Derwazey Derûnzanî*", Çapxaney Zanko, Çapa Êkem, Hewlêr 1996 R,1 ê.
[6]. Tele`t Mensur, "*Oses e`lim Alnefis*", Misir Çapa Êkem, 1978 R, 10.
[7]. Fuad Sidiq," *Derûnzanî komelayetî*", Berîweberayetî Giştî Ktîbxanekan, 2015 R, 12ê.
[8]. Dîçiz, "*Rawanşnasî", Tihran Çapa Yakam ,bê waşanxane 1379,* R 38

Ji ber wê yekê*((derûnnas dikare li ser babetên edebî ramanên taybet bi xwe hebin. Bi awayek din, derûnnas bi cudakirina têgehên alozên edebî radibe, heya ku maneya temam yan jî wateya waqe`î ya berheman destnîşan bike.Her kesek jibo ku kareke wisa bike xwe bi karek derûnî ve mijûl kiriye, ji ber ku şîrovekar aliyek zêhnî û ebistrak a merivan werdigre))*[9]. Rexneya derûnî di destpêka Derkeftinê De bi awayek diyar û ser bi xwe li holê tunebû, lê*((hemî berhemek edebî kêm yan zêde xwediyê aliyek derûnî ye, bi şêweyeke rasterast(direct) yan jî ne rasterast (indirect) halê hundûrê xwediyê berhemî di dem û dewra nivîsên deqê derdixe))*[10].Bi lêramanek hûr li deqên edebî eşkere dibe ku eger her berhemek edebî straktorek hebe, aliyê derûnî dibe beşek ji wê straktorê.Ji ber ku*((li destpêkê lêkolînên derûnî, mêtafîzîkî û felsefî bûn. Lê li destpêka çaxê raperînê mijara derûnî ji ramanên felsefeyê rizgar bû. Paşê ji aliyê pisporên taybetmend bi şêweyek giştî layenên derûnî û rexneyên derûnî di nava berhemên din de derdikeve.))*[11].

Derbarê tirajediyayê de Erîstodibêje*((tirajediya rûdanên wiha di nav de hene ku dilsojî û bezeî û tirsê çêdike, bi vê yekê jî paqijbûn ji van herdu sozan derdikeve))*[12]. Dema mirov li berhemek edebî dinêre, kartêkirinek erênî li ser dil û hundirê mirovan dibe. Êdî di vir de rexneya derûnî dest pê dike. Li gel werara berheman ew jî geşeyek esasî dike. Hevdem di gel werara rêbaza romansîzm de rêbaza rexneya derûnî bi awayek berbiçav geşe bi xwe ve anîye. Ji ber ku*((ew hewldan derkeftin ku edîban bi derûnnasiyê ve girêdide, hewl dide cihana hundir a merivan derbixin, heya ku kesek wek Kilod Riç bi rêxweşkerî ji bo Froydî rê vekirîye))*[13].

Bi ramaneke hûr ji bo berhemên edebî, ruhin dibe ku pareke zor ji nivîser û feylesufan di berhemên xwe de giringiyek bi aliyê derûnî ve daye. Dibe ku ev giringîdan bi şêweyek bêdestî yan jî bêagahdarbûn jî be. Firûyd bi xwe jî li ser vî babetî dibêje*:((hunermend rolê zanayek derûnşîroveyî dibîne, meznatiya wan bi*

---

[9]. haman jêder,R 43

[10]. Adil Germiyanî, "*Derûn Şîkarî û Edebî Derûnî*", Govara Aynde, Hejmar 43, 2003, R, 34.

[11]. Kamil Hasan Besîr, "*Mêjûy Rexne Sazî*",Çapa Êkem Silêmanî, R, 37-38.

[12]. Şukriye Resul,"*Tîyorî Edebî*", Wergêranî, Serdar Ehmed Gerdî, Çapxaneî Mardîn, Hewlêr 2010 R, 38ê

[13]. Heman Jêder, R, 60ê.

*serxwe radikêşe, vedîtina vî karî ji bo wan vedigerîne))*[14]. Her wiha li cihek din dibêje*:((şaêran neagahiyan vedîtin, pêşî ku ez vebînin))*[15]. Şaêr gelek caran ji erka sereke ya xwe der çendîn babetan derdixînin holê ku taybetên bi zanistên din in. Ji ber wê*((hewleke serekî û zanistî û xebitîn ji bo mijarên derûnşîrovê de li ser çend metodên hûr û bernamedar ji bo destpêka çerxa bîstê vedigere, ku eleqedar bû bi pêşkeftinên cur bi cur li mijarên cuda ve, bi taybet li mijarên saykolojî de, ku komek ji destkeftan bi xwe ve anî. Saykolojiya takekesî pêşkeftinek berçav bi xwe ve dît û Çendîn mektebên cuda û layenên derûnî di nava saykolojiyê de ava bûn))*[16]. Li vir dibe bê gotin ku mekteba derûnşirove, hevdemê vê pêşkeftinê bû. Ku li ser destê Freuyd ava bû. Ew jî demek rû da ku Firoydê pizişkê Nemsayî*((bi taybet li paş derçûna kitêba wî ya bi nav û denga ya bi navê Ravekirina Xewnan ku li sala 1900ê derçû de ew yêkem kes bû ku derbarê hizra milmlanêya derûnî de çend lêkolînên zanistiyên girîng nivêsîn û di vî karî de pişt bi têkistên edebê girêda))*[17]. Eşkereye ku rexneya derûnîşîroveyî û mekteba derûnşîroveyî bi heman awa û ritma mektebên din di nava hundirê zanista derûnnasiye ve nehatiye der, belkî jî di nava zanista pizişkiyê de derketiye û paşê ber bi zanista derûnî û ji wir jî ber bi edebiyatê.*((Freuyddi çarçoveya teorîya derûnşîroveyî de hewla şîroveya berhemanînê daye, ev aliyeka girginga bingehîn a koka rexnaya derûnşîroveyê pêk tîne))*[18]. Şarel Bodwan ku ew jî rexnegerekî Ferensî ye di kitêba xwe de(Şîroveya Derûnî bo Hunerî) hewl da ku metodeka derûnşîroveyî ya Froydî li ser karê hunerî piraktîze bike. *((Paşê her yek ji (Nortopfray û Rîçards) tên, ku her du bi rexnegirên saykolojiyê di çerxa nû de bernas in. Nortopfray bi kitêba (Anatomya Rexneyê) û Rîçards bi kitêba(Prensîbên Rexneya Edebî) bi yêk ji giringtirîn kitêbên rexneya edebî yên bi nav û deng in))*[19].

---

[14]. Stanlî Hêmin, "*Alneqd Aledebî we Medaris Alhdes*", Tercumet Ehsan Ebas- Mihemed Yusif Necim, Mueseset Franklin Almusahemet lil Tibaet we Alneşir, 1999 R, 262.

[15]. Îzedîn Îsmaeîl, "*Altefsîr Alnefsî Aladeb*", Dar ale`ude, Çapa Êkem, Beyrut 1981, R7ê.

[16]- Rêbwar Mihemed Melazade, "*Nalî û Saykolociyaî Şêeir*", Çapxaney Rojhelat, Çapa Êkem Hewlêr 2016, R, 204.

[17] - Newzad Ehmed Eswed, "*Mîtodî Saykolocî le Rexneî Edebî Da*", Govarî Ayinde, Jmare 78, salî 2008, R, 74-75.

[18]. Karzan Kerîm Emîn," *Arastekanî Rexneî Şêeirî Kurdî, Be Nimuney Masternamekany Edeb*",1988-2000, namey master kolêjî ziman, beşy kurdî, zankoy selaheddîn 2009, R, 39.

[19]. Îbrahîm Mehmud xelîl, "*Zanste Mirovayetîyekan û Rexney Edebî*", Wergêranî Newzad Ehmed Eswed, Govarî Serdem Jmare 56, salî 2008, R,106.

Zîgmon Firoyd, li jêr tesîr û kartêkirina bîr û hizrên curerexneyek kefte hole ku bi rexneya derûnnasî û berhemên edebî hatiye nasîn. Kurtiya vê hizrê ji wê derê hat wergirtin ku meriv her li destpêka jidayîkbûnê tûşî tawanek destpêkî bûye. Hemî akar û reftarên mirevan dûbarekirina wan tevan e. Berdewamiya wan tevan jî bi pêşbînîya (Odîpos) xwe nîşan dide. Ew jî li jêr kartêkirina hêz û meyla seksî ye di hundurê mirovan de. Bi duv vê bîr û hizrê peywendîya di navbera berhemeke edebî û derûnnasî de bi awayek berçav pir girîng e. Bi maneyeke din, nivîser dema dest bi nivîsîna her berhemekê edebî dike, di heman demê de taybetmendî û akarên xwe nîşan dide. Di rexneya derûnnasînê de bi destnîşankirina van akaran dest pê dike ku di berhemê xwe de amadeye, wek akarên kesayetî ji wan jî (hisitrya, teşwîşa hizrî) li qonaxa Seksî weke qonaxa sedemî reftar li gel hatiye kirin. Van têgehan hemûyan girîngiya xwe hebûne, lê ew hizre di ramanên nû de wek ramana (Halind) mebesta serekî Cewher û nasandine ku derxistin li gel qonaxa werara derûnî û cinsî. Her wiha hizir û bîrên Vingêl li ser (derûnnasiya min) li ser wê baweriyê bû ku çawa e`detên fêrbûn bi tiştekê yan aludebûnên serekî li gel daxwaziyên dewruber û hundirê mirovan teşwîq dikin. Ji aliyek din Firoyd, qonaxa kamilbûn ya mirovan yan jî dîroka kamilbûna civakiya mirovan dixe ber qal û gotinan ku ew jî modelek din bû. Ji bo vê meremê sûda li rûdanên serdema destpêkiya mirovan wergirt û aliyê pêkhatina reftara niha ya zaroyê mirovan bi girîngî wesf kir. Eger bi çavek hûr li peywendiyên di navbera edebiyat û derûnnasiyê binêrin, her ji destpêk aşkera dibe ku gişt lêkolîneran bîrên cuda hene derbarê lêkvedan û şîrovên derûnnasiyê,

Her ji ber hinek rayên cuda dê derxin ji wan jî(Nortiropifraî) ku yêkî ji rexnegirên bi nav û denge, xwediyê kitêba (Anatomiya Rexnegirane) ku tê de cure yasayek taybet ji bo kilasîzma edebî daniye,*(( îmaje bo wê kiriye ku edebiyata rojava bi şêweyek giştî yêk dest û yêk cur in))*[20]. Li vir dikarin bibêjin, ku rayên wî nêzîkin li (Karol Gostafyong) yan bîr û hizrên wî bandora vî zanayî li ser hebûye, ji ber ku her du zanayên navborî, di wê bawerê da aşkerabûn yan derkeftina pehlewan yan qehremanê rûdanan, bi awayekê îmajeye ji bo nîşandana peyva kevin(Arkitîp).

---

[20]. Niyoton, "*Darwnnşîkarê*",Çapxanaya Hewlêr 1996 ,Bergî Yekem,R185

Freuyd li rêka lêkolîn li efsaneyan û her wiha bi ramana wî li kitêba (Rank) wate (efsaneya jidayîkbûna qehreman) ku li ser şîreta Freuydhatibû nivîsandin, ew ji bo aşkera bû ku li nav hemî qehremanan de herdem dayîk û babek  amade ne, di nav çînên dewlemend de. Ji ber gefan wan zarok di vî seqa û halê civakî de mezin dikirin. Bêguman bi heman awayî perwerde dibe û her ew karî paşa û mîran dubare dikin. Kevintirîn efsane vedigere bû çaxê (Sargon) paşayê Ekediyan. Ku damezrînerê şaristaniyeta Babiliyan bû, di sala 2800 a pêş Mesîh. Pehlewanên van Efsaneyan ew kes bûn ku her dem li gel babê xwe bi şer hatine û bi ser babê xwe de bi ser keftine. Bi awirdanek ji bo van efsaneyan Froyd gehişte wê baweriyê ku lêkvedan û şîroveya efsaneyan û çîna bilind a civakê dibe sedema nasîn û têgehiştina derûniya xelkî. Ji ber ku di rexneya berhemên edebî de piroseya seqemgîrî û aramî, naveroka berhemên wan sûdêji peywendiya derûnnasî û edebiyatê wergirtiye. Ji bo vê meremê heta niha li lêkdan û şîroveya berhemên edebî sûdek zor li bîr û hizrên Freuyd wergirtine. Ji bomînak, trajîdiya Aşil û kesayetiya Hezretê Mûsa û qewmê wî ku ji aliyê Freuyd ve hatiye encamdan. Lê piştî Freuyd çendîn berhemên din li ser ramana derûnnasiyê hatine nivîsîn. Di zimanê farisî de ji vê ramanê çendîn berhem hatine nivîsîn, çend berhemên zindî xuya dibin. Ji wan jî şakareka edebî bi navê(Kundî Kwêr) berhemê nivîsarên Faris (Homayun Katuziyan- 1993) û (Behram Miqdadî- 1970). Miqdadî sê kesayetî di nav *Kundî Kwêr* de destnîşan kirine, ku ew jî dayîk yan her jinek din ku cihê dayîkê de be. Bab, yan her zelamekê pîr û laşê şeketî û mandî be. Kalekî qesab yê bêkes û bêcih. Bi baweriya nivêserî jinik ji ber ku bêkes û bêcih û belengaz e, li gel her kesekê dinive û sercêyî dike.

Ev wêneyê îmajeyê bû (Girêya Odêp), ji ber ku kesekê giriftarê van sincan dibe ku wêneyek ji dayîka xwe wergirtibe. Bi wê maneyê ku kesek radibe bi encamdana sercêyî û cotbûn li gel jinê de. Bi vi şêweyî ji du aliyan yêk ji wan nikare sercêyî bike ji ber ku dayîka wî ye, ewê dike xeletiyek dihê kirin li gel dayîkê sercêyî bihê kirin, ji ber ku babê wî ye.

### 1.3. Metoda Derûnşîroveyî Di Edebiyatê De

Derûnnasî û edebiyat û rexne ya derûnnasane karê serekiya wê ewe ku peywendiya navbera edeb û huner û kesayetiyê bi awayekê giştî û esasî helsengînît. Bi maneyeke din saykolojiya bi awayeke giştî û wekî zanistek serbixwe, kar li ser deqên edebî dike û naveroka deqan şîrove dike, ji ber ku *((metoda rexneya derûnî jî wekî aliyek li peywendiyên ku edeb û saykolojiyê bi hev re girê dide, bi piştgirêdan bi pirinsipên saykolojiyê, hewla encamdana piroseya rexneyê dide, bi merema têgehiştinê li deqên edebî))*[21]. Têgehiştin bi wê manayê ku aliyê derûnî û barê hundirê nivîskarî şîrove bikin, bi sedema îmajê û remxzên di nava deqê de û peywendiya saykolojiyê û edeb û bi rêka boçûn û rexneyên derûnî der bixe holê. Lê ji ber ku têgeha wê pir giştiye ku hemî pirensibên saykolojiyayê tê de beşdar in, *((her ji ber wê yekê bi şêweyek hûr û zanistî cihê xwe negirit. Heya ku nehê rakêşan ji bo nava mektebên derûnşîroveyî. Di nava van mekteban rexnaya derûnî têgeh û teknîkên taybet li ber wan hat kirin, kûrtir û hûrtir erkê rexneyê xwe cî bi cî dikir û bi awayekê zanistî li ser deq disekinî û merema xwe berhev dikir))*[22]. Karê derûnnas bi endazekê berçav ber bi pêşveçûn bi xwe re dîtiye, heya wî qadê ku li jêr rûnahiya saykolojiya nû û mektebên derûnşîroveyî têgeha rexneya derûnî wek metodek Serbixwe di mijarên edeb de kefte nava kar û bi wê yekê jî karî şîroveyek ji bo hinek aliyên hestewerên eleqedar bi deq û kesayetiya nivêserî biket. Her wiha komek pirsyarên girîng bersiv dan ku cihê girîng ya zanayan bû, weke *((afirandinên edebî çi ye û çawa berhev dibe? Kartêkirina edebê çi ye li ser hundirê nivîskar û xwendevan ji aliyek û huner li aliyek din))*[23]

Mektebên derûnşîroveyî *((li Nemsa li sala 1900an serhilda, babetên serekî nexweşiyên hundirî bû. Ji aliyê pizişkî Zîgmond Freuydbi damezrênerê wê mektebê dihê danîn, ku li encama çareseriya ew kesên hundir nexweş çend hizrên nû afirandin, ku di rastî de şoreşek nû hilxist, ne bi tenê li mijarên derûnzaniyê belkî ji ber mijarên din jî weke, civaknasî û edeb û huner))*[24].

---

[21]. Karzan Kerîm Emîn," *Arastekany Rexney Şe`irî Kurdî Be Nmuney Masetr Namekany Edeb"*, R,34ê.
[22]. Rêbwar Mihemed Melazade," *Nalî û Saykolojîya Şe`irê* ",R, 211-212.
[23]. Rêbwar Mihemed Melazade, "*Nalî û Saykolojîya Şe`irê"* ,R, 212.
[24]. Azad Elî, "*Derbareî Derûnzanî Giştî"*,Çapxanaya Hawlêr Bergî Yekem 2007 R, 25ê.

Ew mekteba he, kartêkirinek zor li ser edebiyatê hebû, bi endazê afirandinên mezinên din yên edebiyat û zanistên mirovî. *((Ji ber ku vexwandina takekesî li mektebên derûnşîroveyî bi wê arasteyê de çûye ku di hundir de kar têde dihêkirin bi sedema dafie`an û çespandin û seks. Ew bayex û puytedane jî bi hundira tak ji bo Freuyd bi xwe vedigere, ku di pêş de weke pizişk kardikir li barê çareseriya nexweşiya hîstriyayê))*[25]. Zanayekê navdar di vê mijarê de ku hizir û ramanên wî kartêkirinek zor li ser edebiyat û rave û şîroveya derûnî bo edebiyatê hebû,*(( Şarilmorn bû ku li sala 1948ê de zaravaya terma rexnaya derûnî, yan rexneya saykolojî (psycho criticism) afirand. Ev metod bi ser komek ji berhemên edebiyên navdar piraktîze kir))*[26]. Diyar e ku ev kar ji aliyê pareke zor li zanayan bi awayek giştî hebûye, lê bi şêweyek zanistî nebû. Bi manayek din, karên bi vî awayî hebûn û li jêr têgehek diyarkirî nebû. Wate têgehek zanistî bi wî mijarê nebû, paşê bi sedema girîngiya babetê navborî hêdî hêdî ber bi zansitîbûn wek zansitek serbixe xwe derxist.

Metoda derûnşîroveya edebê, hizr û rayek cuda hebû li barê edeb û berhemên edebî. *(( Edeb û karên hunerî li ramana vê metodê rêkek in li wan riyên ku hundirê takekesî bikar tîne ji bo merma xwe. Her wiha menbereke ku takekes, ji bo te`birkirin li halê xwe, hawara xwe dibetê. Her wekî ku hawara xwe ji bo xwe jî dibe.*

*Bi ramana mekteba derûnşîroveyî ve û bi dûv rayên Freuyd hemî berhem û deqên edebî te`bîr li Hundirê xwedî du îmajeye, wate du rû hene))*[27].Diyar e her berhemek edebî te`bîr li hundirê xwediyê berhem yan nivîskarî dike. Ev berhem xwedî çendîn ceveng e(remze), ceveng jî îmajeyên cur bi cur ji xwe re hilgirtine, ku ev îmaj parek ji wan jiyana nivîskarî ji xwe re helgirtiye. Li vir de, *((di derûnşîroveyê de ceveng bi riya hêmyan, yan nîşaneyan tên derxistin û dîmen û haletên din di nava xwe de hildigirin. Rexnegir ji bo vedîtina rûyê dûyem û aliyê veşartî yê deqê de, hemî ew tiştên ku girêdayê deq û jiyana nivîskarî ve girêdayîne kom dike.*

---

[25]. Rêbwar Mihemed Melazade," *Nalî û Saykolojiyaî Şeîr",*R 214.
[26]. Îbrahîm Mehmud Xlîl, "*Zanste Mirovayetîyekan û Rexney Edebî ",*R 106.
[27]. Rêbwar Mihemed Melazade," *Nalî û Saykolojîyaî Şeîr"* , R 219ê.

*Rexnegir bi riya şîrovekirina têgeh û pirensîbên derûnî hemî aliyên rûyê derveyê deqê rave(tehlîl) dike, ji bo ku bigehêje bi aliyê duyemê deqê. Bo vê meremê di destpêkê de rexnegirê derûnî hemî aliyên deqê û jiyana nivîserî li ber çav digire, lê paşê karên rexneyî û lêkolînên derûnşîroveyan di edeb û hunerê de bi du arasteyan de diçûn))*[28].

**1.4.Dîroka Rexneya Derûnnasiyê**

Baştir ewe ku dema li ser dîroka rexneya derûnnasiyê dixebitin, di destpêkê de bi pirtûka (Fîdors)î dest pê bikin. Bi wê maneyê ku dema Eflatûn bû yêkem car di vê kitêbê de *((şaîr û hozana rasteqîne (heqîqî) bi curek ku jiberxwe axiftinê bi me nasand, ku ew jî di dil û mejiyê merivî de, alozî derdikeve))*[29]. ( Aristo) dema *((qala şanoya trajedî dike, îmaje bi (Katarsîs) wate arambûna hundir dike, bi vî şêweyî kartêkirin û şîroveya derûnnasîneya edebiyatê li ser xwîner û bîner nîşan dide. Erestu dibîje, temaşakirina trajediya, du cur kartêkirin li ser xwîner û bînerî heye, hem tirs hem soz. Tirs li rûdana wan karesatên ku dibe bi ser me jî de bên, ku bi ser pehlewanan de hatiye, ew ji layek li aliyek din heskirin bi soz û rehm li pehlewananda amadeyî heye, ji ber ku pehlewan bi sedema xeletiyek biçûk tûşî karesatek diltezîn û mezin bûye, ku dibe hejiyê wê karesata diltezîn nebît.*

*Di dumahiya şanoyê de meriv xweşî û arambûna hundir hîs dike. Ev jî derfetek baş e ji bo ku bîner girêdayê arêşe û çarereşiya pehlewanan nebît))*[30]. Erestu vî halî bi Kartasîs navdêr dike, lê pirensîbên rexneya derûnnasîne , bi mana ewrupiya wê bi hemî ew liq û tayên ku hene, hemî li bîr û ramanên Freuyd bi navê (hizra ne hişyarî) derdikeve. Her çend ku pêş Firoyd, kesayetiyek weke (Hirbêrt Fexfîr)li ser hizra nehişyar axiftiye, lê hilgirtin û komkirina vê hizrê her wiha şîrovekariya hûr li vê mijarê eleqedar bûye bi nave Freuyd ve.

---

[28]. Rêbwar Mihemed Melazade," *Nalî û Saykolojîya Şe`irê* ",R, 219

[29]. Zerînkub Ebdulhusên, "*Neqdê Adebî*", Çapxanaya Emîr Kebîr Çapa Çaram, Têhran 1369, R, 282.

[30]. Erestu, "*fenê şeîr*", tercumêyê Ebdulhusîn Zerînkub,Çapxanaya Amîr Kbîr, têhran 1369 Çapa dwem, R 105-135.

### 1.5. Pêwendî(Eleqe)ya Derûnnasî û Şîîrê

Arek Fromyêk ji wan derûnnasên bi nav û deng, ku guhrîn di pirensîbên hizrî yên Freuyd durist kirin. Bîr û hizrên xwe li ser mijarên civakî ava kirin. Firom berûvajiyê Freuyd, lêkolîn li ser nivîserê her berhemekê dest pê kir. Li ser nîşanên hunerî, derûnnasiya kartêkirina berhemên hunerî hevdengiyek bi dest xist.

Wate, bîr û hizrên wî li ser şêir û di encam de bi awayekê derûnî pirdeng kartêkirin hebû li sinc û reftarên civakî. Bi bîr û hizrên Firomî di hundirê meriv de xêr û şer nixaftîne. Li hember vê nixaftinê, du rêyên çareseriyê hene, ku mirov dikare bi helbijartina yêk ji van duyan yan jî aramiyeka manewî(me`newî) di waqi` de bigehêje qonaxa (pêş mirovî)ye, bi vê ramanê jî yêkemîn helbijartin rêya fesadî û rêya duyemîn rêya geşe û wenarê ye.

Arek From*((li ser wê rayê ye ku zarok dema ji dayîkbûnê bi şêwazek ne bi temamî li gel nîşanên dayîkê de têkel dibe, bi maneyek din li paş ji dayîkbûnê û rizgarbûn ji zikê dayîkê ku weke zindanek ew ji cîhana derve cuda kiriye, li cihek ku azadiya temam bi dest bixe û bi duv ezmunek nû gava bihavêje, kesayetiya serbixwe ya xwe ragire û li ser lingên xwe raweste))*[31].

Lê ev kar bi awayek sanahî bi dest nakeve. Sedemên pir metirsî weke berbestek dikevin pêşiya wî, eger nikare wan rik û kîn û metirsiyan be, ewê di jêr hejmûna dayîkê de dê bimîne. Ev nakokî ye dibîte sedema geşenekirina eqlê zaroyî. Firom dibêje, ji bo xilasbûn ji tirs û nerehetiya berhemê vê nakokîyê çareserî heye, yan dibe zarok ber bi pêş rêya xêrê gavan helîne, yan dibe ber bi rûyê şer û herfiyan biçe, wate ya dibe serbixweyî û azadî ya xwe ji aliyê dayîka xwe rabigirît û rû bike aliyê din, yan dibe sozdarê dayîka xwe be û bi temamî guhdarê dayîka xwe be. Bi awayek ku divê vegere rehm(nav zik)a dayîka xwe. Ser bi xwe nebit û ber bi tund û tujiyan biçe, tund û tujiyek serokaniya wê tirs û gef bin, di rastî de kesê ture ji bo parastina xwe û dayîka xwe dest bi bergirî yan gefan dike. ‘Egîdî û hêrs û bergirî di hundirê wî de heye.

---

[31].Arik firom ,”*Amiyd Anqlab”*, tircmayî micîd ruşingir, Tihran 1368 Çapa êkî, ,1387 , R 117

Her ev xerîzeye, dihê veguhastin bo demê mezinbûnê,lê bi taybetmendiyên civakî. Wate kesek yan nivîskarek berhemek edebî nexasme şeîr biafirîne çendîn xerîzeyên bi vî awayî di hundirê wî de pengiyayîne. Ji bo ku li wê şeîrê bigehêjin, dikarin li hundirê şaeîrî bigerin, li riya şeîra wî ku xwe li şîroveya hundirê şeîrê de dibîne, ew jî girêdayê bi aliyê derûnî û civakî nivîser yan şaîr e.

Bi maneyek din, meriv her li ezel mehkûmê çend xerîzeyên weke xêr û şer, azadî û êxsîrî, li zaroktiyê dema mezin û kamilbûn, ev xerîze wiha li merivan dikin her tim kesek muxeyer be. Wate extiyarker be di navbera çakî û xirabiyan….htd. Dema nivîserek şeîr ya berhemek dinivîse, peyamek hilgirtiye ku delalet li hundirê wî dike. Rexneger yan lêkolînerek derûnî, dema lêkolîn li berhemî dike bi şîrovekirina berhemî radibe, ev jî xwe bi xwe lêkolinek derûnî encam daye, li wir peywendî û eleqeya şeîr û derûnnasiyê ji bo me aşkera dibe. Dibe bihê gotin çend lêkolînên edeb girîng bin ji bo berhemek edebî, bi heman qas lêkolînên derûnî ji bo berhemên edebî girîng in. Li vir derdikeveku peywendiyek tund û mukim di nava zanistên mirovî de heye. Bi taybet şeîr û derûnnasî yan rexneya derûnî, serencam rexneger di navbera peyvên çîrokê de, li riya çîrokbêjî dixwaze li gel kesekê mucered(selt) sercêyî bike, lê tûşî kusp û arêşeyan dibe.

Lê eger berûvajî bû û peywendiyek nerast û ne tendurist gihişt encamê li gel dayîk û babê xwe di wî demî de kesê selt şiyana karek dirust nîn e. Rexnegir digehêje wê encamê ku çîrokbêj li nîveka rûberên(Kundê Kwêr) weke volkanek kêşe û arêşeyen civakî teqandine, hestên derûniyên xwe ku tirs û nearamî û tureî û bêhîvîtiye bi halekxemgîn derdixe.

### 1.6. Huner û Edeb

Berî dakevîn nava behsa xwe, bi awayek gelemperî, dibe bê rûhinkirin merema me ji edeb û hunerî çi ye? Huner bi şêweyek giştî û edeb bi awayek taybetî *((huner peyweke dihê giştandin bi ser her karek ku bi lêzanî û pisporî bê encamdan. Ji ber wê yekê dibînin bi sedan cur huner hene, weke hunera peykertraşîn, wênekêşan, xwarinlênan …htd))*[32].

[32]. Şewqî Çîf(d), *"fî eledeb we elneqd"*,Çapxanaya Daralmearif, Elqahire,Çapa yekem 1999, R 71.

Ji ber wê yekê huner û sirûşt, berdewamiyek nevebirî heye, çunkî huner serokaniya xwe li sirûştî wergirtiye. Sirûşt û mirovî jî peywendiyek kevin bi hevre heye. Li ser erdî nasiyariyek li gel hev peyda kirine, her karek bi lêzanî û şarezayî ji aliyê mirovî bê encamdan ew hunere bi şêweyeke giştî, her ji ber wê yekê her nivîser û lêkolîner bi duv bîr û hizr û dunyabûniya taybeta xwe û lêkdan û şîroveyek cuda cuda bû hunerî heye. Ji ber hindê dibêjîn*((huner berhemê destê miroviye ku li dewrê regezên ciwankariye dizivire, yan ciwanî di esas de li dewrê berhemî de dizivire))*[33]. Di esas de hemî kesek hunerek diafirîne, înca ev hunere regezên ciwankariyê têde bin yan ne bi şêwê giştî jê re huner dibêjin, lê dema qala huner ji bo hunerî tê kirin, bi maneya edebî dibe huner ciwaniyê bide bi wî berhemê ku li dewrê wê de dizivire, weke hunera numayiş û axêvandin…htd.

### 1.7. Jiyan û Berhemên Siegmund Freuyd

#### 1.7.1 Jiyana Freuyd

Freuyd li sala 1856 li bajarê Firayborkê Elmanî ji dayîk bûye, li sala 1881 birwanameya pizişkî li zanîngeha (Vîyenna) wergirtiye, di nexweşxaneyeka hikumî de mijûlê karkirinê bûye.

Freuyd li destpêkê, pispurê demarnasiyê bûye û behra pitirî ya lêkolînên wî li ser nesaxiya demaran bû. Di sala 1885 lêkolînên wî li ser mijarên derûnnasiyê bûn. Di sala 1893 heya sala 1922, girîngtirîn bîr û rayên xwe bi riya çapa wan belav kirin. Li gel destpêkirina êrişa supayê Naziyan Freuydçûbû bajarê Londona li Birîtaniyayê û heya mirinê (1939) li wê derê ma. Du kesayetiyên weke (Karil GosafYong û Alfirêd) li dumahiyê di gel beşek li hizrên Freuyd dijayetî hebû, bi taybet li ramana (Lîbdo)yê de(qonaxa destpêkî rêya xwe ji ya Freuyd cuda kir. (Adlêr li sala 1870ê li bajarê (Vîyenna) ji dayîk bûye, paşî birwanameya masterê li mijarê pizişkî bi dest xistiye, di dumahiyê de hogirê lêkolînên derûnnasî yê bûye li sala 1902ê.

---

[33]. Mihemed Zexlul Selam,*"Bê navnêşan"* elnaşir menşa elmearif Eleskenderiye, Elqahire, 1981, bê Çap R 1ê.

### 1.7.2. Girîngtirin Hizr û Ramanên Freuyd di Parvekirina Straktora ‘Eqlê Mirovan de

#### 1.7.2.1. Haydarî

Bi parek li mêjiyê mirovan tê gotin, ku di rastî de mirov livînên hişyarên xwe bi sedema wê parê digehîne encamê.*(( Ev beş haydariyek temam li ser nihaya merovan heye, ji layê reftar û çalakî û sincan ve. Ji bo vê haydariyê jî mirov nehewceyê hewildan û hizirkirinê ye))* [34]. Sercem ew kar û çalakiyên li hizir û mejiyê mirovî dane, pêdivî bi inbarkirinê nîye, ji ber ku ev beş hêsiye û rasterast bû astên din dihinêre. *((hest sercemê wan hez û miraz û meyl û rûdan û çalakî ne ku berdewam takekes(ferd) his pê dike û li ber hestewerên merovan da))*[35]. Bi şêweyek kurt û temam, pişka haydariya ‘eqlê mirovan, wê parê li xwe digire, ku li cihê xwe de his bi çalakiyan dike.

#### 1.7.2.2. Ne haydarî

Ev beş li heş û çalakiyên mejiyê me daye, em nehaydarîn, lê kartêkirina xwe li hez û xwest û helbijartinên mirov di kiryar û reftar û hizra mirovan de xwe derdixe. *((ev aste bi giringtirîn ast tê hesibandin û mezintirîn rûberê parvekirina*

*Freuyd li xwe digire, Freuyd girîngiyek zor bi vî astê daye, karê meznê xwe li ser vê tekez kiriye))*[36].Girîngiya pêş haydariyê, lewra ye ku her tiştekê mirovan pê nexweş e û di halê ne awarte de dilgiran dike diêxe para pêş haydariyê û li wê derê bend dike. Bi maneyek din, ew rûdanên ku mirovan hêrs dikin di jiyana asayî de ji bo me pesend û cihê razîbûnî nîn e. Yan dijayetî li gel rahînanên civakê de heye. Yan jî li gel hizir û sincên aînî û dab û nerîtên giştî û taybet de. Heya ku kesayetî û rêz a mirovan di nav civakê de, birîndar nebe vekêşanê pê dike bo pêş haydariyê. Piştî lêkolînên zor, Freuydgehişte wê encamê ku*((şiur di kesayeta merivî de aşkera kir û komek sedem ji bo hebûna şiur kire belgeh wek xewn, jibîrkirin, xeletiyên zimanî, çûna di demê xewê de, çareserkirina arîşeyan di dema xewê de, îşaretên piştî xewna mignatisî…htd))*[37].

---

[34]. Rêbwar Mihemed Melazade, ”*Nalî û Saukolojyaî Şeir*”, R 223ê.
[35]. Kerîm Şerif Qereçetanî, ”*Siroştî mirovayetî le rrwnagey Can Cak Roso û Zigmond Firoydewe*”, çapî yekem, çapxaney wezaretî perwerde, hewlêr 2003, R 107ê.
[36]. Rêbwar Mihemed Melazade, , ”*Nalî û saukolojyaî şeir*”, R 135ê
[37]. Sozan Cemal, ”*Qutabxanekanî Derûnnasî* ”, govarî zanistî Serdem jimare 38 salî 2010, R 43ê.

### 1.7.2.3. Pêş haydarî (Preconscious)

Ew pare ji mejiyê mirovan ku me ji bîr kiriye, yan ji bizava wê ne haydar in. Lê bi awayek sivik û hêsan, yan ji ber derketina rûdanekê xwe wek haydarî nîşan dide. *((ev beş, yadgeh(zakîre) ye, hemî ew zanyarî û bîrewerî û ew tiştan li xwe digire ku mirov dikare bi riya bîrkirinê(hizirandinê) bi bîra xwe bîne))*[38]. Ji bo minak eger kesek tuşî rûdanekê bû, ev rûdan li astê pêş haydariyê de hatiye hilgirtin, di demên asaîyên wî kesî de. Lê dema kesek jê bê xwestin rûdanê vegêre, ew li riya bîrkirinê, wê rûdanê li astê pêş haydariyê vedigerîne ji bo astê haydariyê, ji ber wê yekê, dibe ev beşe

weke*((mimorî berdeste ew bireweriyên ku di dema niha de hizrê lê nake, lê bi asanî dikare vegirîne nav hizr û hişên xwe))*[39].

### 1.7.3. Kesayetî Bi lêramana Freuyd ve

Kesayetiya mirovan bi lêramana Freuyd ve li sê şêwe û riyên sereke pêk hatiye, ku ew jî min(Ego) û ew(Id) û minê bilind(Super Ego) in:

### 1.7.3.1. Ez - Min (Ego)

Serûkaniya (min)ê hizirmendî û nasîna pirensibên pêşhatiyên rast û waqiê civakê ye, min, peywendiya kes li gel dewrûber û reftarên kes di gel civakê de û rastiyên demî li situhê xwe digire. Min berpirse li hevsengî ragirtina her du rêbazên hest û soz ji aliyek û bê sozî û dijî lojîkî ji aliyên din.

Ji aliyek din tekoşîna xweperêsiya ew(Id) ji bo darimandin û wêrankirina her tiştekê ji bo mana xwe dike. Di heman dem de li hêza tûnd û tûjiya ew ji bo manê bi awayekê lojîke sûdê dibîne. Ji aliyek din xwesteka min a bilind ji bo bextkirina xwe û mirinxwestinê û desthilgirtin ji dinyaya kêm û bêbiha kêm dike. Çunkî kesayetiya min *((ew pişke ku mirazên ew(Id) li gel dem û cih de hevsû dike û xwest û bîrkirin dikeve ber vê pare û min haydarê wê yekê ye ku çawan bergiriyê li şerm û tirsên xwe bike))*[40]. Yan dibe îmaje bi wê yekê bihêkirin ku*((ew pişke li wê kesayetiya mirovan*

38. Rêbwar Mihemed Melazade, *"Nalî û saukolojyaî şeir"*, R 224ê
39. Rêbwar Mihemed Melazade, "Nalî û Saukolojyaî Şeir", R 224.
40. haman jêder, R 240

*ku dikeve navbera cihana derve û xwestên wî, bi duv mebdea waqê reftar dike û weke navbijîkerek di navbera sê hêzan de))*[41].

Bi kurtî dikarin bêjin min dikeve navbera her du cihana haydarî û nehaydarî ye.

**1.7.3.2. Ew**

Ev aste kaniya derûnî ew jê ra tê gotin. Diyare zarok di dema ji dayîkbûnê de (ew)êke çalak û pir bizave, merema (ew) dûrêxistina ewe li derd û xem û bi destanîna zewqê ye. Bê çavdêrîkirina min û min a bilind halekê wêranker û têkder yê hey. Li wê derê ku fakterên ew di kesayetiya mirov de, bi tenê bidestxistina zewqê ye.

Wate ew*((pareke systema derûnî ye ku her li jidayîkbûnê bi awayek wirasî di merovan de wicud hebûye. Dikarin bi kaniya tevaya hêzûn derûnî bizanîn. Ev kaniye nebe sedema bi karxistina du beşên din yên Sistema min û min a bilind))*[42].

**1.7.3.2. Min-Ez a Bilind (Super Ego)**

Ev pişka sêyemîn ya kesayetiyê ye, ji aliyê Freuyd ve ku*((navenda hemî layenên bilindên reftar û bihayên civakî û olî berûvajiyê kujiyê ew fişaran dixe ser goşeya min, li jêr pirensibên siza û padaşt kar dike))*[43]. Şêwaz û sistemek dine li pirinsîbên kesayetiya mirovan, ji bo parastina biha û tixûbên civakê şêwe û qaliban werdigire. Min ê bilind di derencama hewcehiyên baş û xirab de perwerdeyên exlaqî û olî ...htd li nav hundirê mirovan bi aramî û asayî şikil digire. *(( Çunkî min ê bilind hewl dide ji bo serkutkirina palner û xwest û hezên ew nexasme ewên sîmayên seksî dujmin karî hene, min ê bilind hewil dide ku cîhana derve û hundir ser ji nû bi dûv xwest û awatên nimuneyî bi afirîne bi şêweyek ku ew dixwaze))*[44].

---

[41]. Kerîm Şerîf Qereçetanî, "*saykolojyaî giştî*" , çapxaney Zanko Çapa êkem, hewlêr 2014 ,R 304ê
[42]. Rêbwar Mihemed Melazade," *Nalî û Saukolojyaî Şeir*", R 241-242.
[43]. Heman Jêder, R 242.
[44] . Kerîm Şerîf Qereçetanî," *saykolojyaî giştî*", çapxaney Zanko Çapa êkem, hewlêr 2014 pera308ê.

## Beşa Duwem

### 2. Jiyannameya Ebdulla Peşêw

### 2.1.1. Jiyana Ebdulla Peşêw

Navê temam yê Peşêw, *((Ebdullayê kurê Mela Şêx Mihemedê Bîrkotî ye. Peşêw li malbateke dîndar û li gundê "Bîrkot" yê nêzîkê bajarê Hewlêrê ji dayik bûye ))*[45]*((Ew gund niha bûye beşek ji bajarê Hewlêrê. Bavê wî ku melayê gund bûye, ji ber sedema nexweşiya penceşêrê zû koça dawî dike. Peşêw dibêje: "Mamên min ez handam ku ez dest bi xwendinê bikim. Destpêkê ez çûme dibistana "Xalidîye" û li wir min bi Erebî xwend. Piştî hingê min xwendina xwe ya navendî û paşnavendî li bajarê Hewlêrê temam kir." Peşêw, demek li gundê "Kendal" yê ku dikeve binîya çiyayê Qereçox bûye mamosta. Peşêw sala 1961ê dest bi nivîsandina helbestan kir û yekem helbestên wî di heftenameya "Hewlêr" de hat bilav kirin))* .[46]

Peşêw, di sala 1963'yan de peywendî bi Yekîtîya Qutabiyên Kurdistanê re çêdike û di naverasta salên şêstan de dibe berpirsê qutabiyan û kadroyekî pêşkeftî yê Partiya Demokrat a Kurdistanê. Û di heman salê de dest bi bilavkirina helbestên xwe dike û li rojnameya *Elexbar*, *Deng û Bas* helbestên xwe bilav dike ku wê rojnameyê di wê demê de rûpelek ji bo zimanê Kurdî terxan kiribû.

*((Sala 1968 li Bexdayê bi Şêrko Bêkes re dibe heval û her di wê demê de Bitî Şkaw çap kir. Û di heman salê de bi yekcarî dev ji hizbayetiyê berdide û biryarê distîne ku xizmeta bîr û ramanên "Serxwebûnxwaziyê" bike. Pirsiyarek jê tê kirin û jê dipirsin: "Kî bûn ewên ku tehdayê li te kirin?" Ew jî dibêje: "Ewên ku zilamên hukûmeta navendî bûn xiwya bû ku ew ji min hez nakin û wek çepên wê demê ez wekî neteweperestekî wesf kirim û li aliyê dî jî ez ji partiyê vekişam, lewma hevalên min ên berê ji min xeyîdî bûn))* [47]

---

[45] .Mihemed Xidir Meûlod, "*hevpeyvîn digel Ebdulla Peşêw govara Raman*" , J (78) Kanona yekem 2002

[46] .Şermîn Îbrahîm Ezîz , "*Peşêw Tazekirdnewe Le Şîrî Kurdî da",* hawlêr namaya mastar R 17

[47]. Ziyad Nadir Elalî ," *Ebdulla Peşêw le regezî serbizêwî* ", çap û belawkirdnewe xanaî Erbîl , çapî yekem R 245- 246

Ji ber wê yekê *((di sala 1973'yan da ku bikare xizmeta ziman û edeba kurdî bike û xwendina xwe berdewam bike diçe Yekêtiya Sovyêta berê û li wir li Morîs Tûrêz Kolêja Wergîranê, Beşa Zimanê Inglîzî û Rûsî temam dike û piştî hingî bawernameya diktorayê ya li ser edebiyatê werdigire û mijara diktoraya wî li ser helbestvanê mezin yê kurdî Pîremêrd bû))*[48] Paş bi destveanîna bawernameyê ya *((li Rûsyayê, ew wî welatî bi cih dihêle û li navarasta salên heştêyan berê xwe dide welatê Lîbya û dibe mamosta li Zanîngeha Fatîh. Heyamê pênc salan ew di wê zanîngehê de ders dide . Paşê dîsan vedigere Rûsyayê û di sala 1995'an de diçe welatê Fîlenda û wek penaberekî siyasî li Fîlenda tê wergirtin))*[49] Peşêw, *((li*

*Rûsyayê jiyana hevjîyê pêkanîbû û du zarokên wî çêbibûn, ên bi navê Avêsta û Yara))*[50]

Peşêw, *((ji bilî zimanê kurdî û erebî zimanê Rûsî, Inglîzî û Elmanî jî bi awayekî gelek baş dizanî û wergerên wî yên li ser Poşkîn û Wîtmen karîn û şiyanên wî û jêhatîbûna wî didin xwiya kirin))*[51] . Peşêw, her çavê wî li ser Kurdistanê dimîne.

*"Deryan kirdim*

*Çunke şî'rim*

*Minalêkî çetûn asa*

*Bilûke berdî hewêşte*

*Malî şoşebendî gewran*

*Deryan kirdim*

---

[48] . Kameran Mihemed Emîn Simaîl ," *hevpeyvîn digel D.( Ebdulla Peşêw )"* , g ( nîga ) , j 60 , Çapxana Şivan , Silêmanî , 2006 , R 33-34
[49]. Şermîn Îbrahîm Ezîz ,"*Peşêw tazekirdneweî şî'ri kurdî de* ", R 45
[50]- Kameran Mihemed Emîn , "*Hevpeyvînek digel , d ( Ebdulla Peşêw )* "R 36
[51] .Ziyad Nadir Elalî ," *Ebdulla Peşêw Şaîrek le regezî serbizêwî"* çap û bilawkirdneweî xaneî erbîl , çapî yakam , R 246

*Çunke şî'rim hêlî bezand*

*Le rûyî gencîneyî dizrawa*

*Gilopêkî*

*De hezar voltî dagîrsand"*[52]

Her çend zordar û sitemkar hewl bidin ku jiyana mirovan nexweş bikin û welatê wan bifroşine wan jî lê wê nexweşî li sitemkaran bizivre. Helbestên Peşêw, *((tomarekî waqî ye, tijî ji trajedî û jan e. Piştî rizgarkirina Kurdistanê di sala 1992'yan de û piştî 19 salan cara yekam Peşêw vedgere Kurdistanê))*[53] û cara duwem jî di sala 1994'an de vedgere welat û wê demê jî kurdan şerê hev dikirin û her kes yê din bi xayîntîyê wesf dikir. Lewma ev bûyer bûne sedem ku Peşêw dest bi rexnegirtin li desthilatadaran bike û di helbesta xwe de ya li ser wê demê bi navê "Birakujî" dibêje:

*"Emro rojî şî'ir niye*

*Bûye min botan dême go*

*Be zimanêkî yekcar sade*

*Pêtan delêm:*

*Eweî Kurd bê û Kurd bikujê*

*Zole, terese, gewade*

*ke birakujek debînim*

*Birwa nakem rişanewem dê*

---

[52].Ebdulla Peşêw , *"Pişt le Newa û Rû la Kirêwe Şî'rî 1965_1979"* , çapî çarem , Kurdistan 2014 , R 325, 326

[53]. Şermîn Îbrahîm Ezîz *, "Peşêw Taze kirdneweî le Şî'rî Kurdî da",* R 40

*Ta beyanî heda nadem,*

*Daym emdîo ewdîo dekem.*

*Sed qonaxîş dowr kewmewe,*

*Bûnî lakî makerêkî tû pîo dekem!"*[54]

Di dawî de Peşêw *(( xudanê helwest e û dîsan welat bi cih dihêle û berê xwe dide Fîlenda.))*[55] Ebdulla Peşêw yek ji wan helbestvanên nûxwaz bû û dikarî ku tiştekî nû bixe nav karwanê edebîyata kurdî. Di salên heftiyan de her helbestvanekî karîbû bibe xudanê deng û rêçkeyeke taybetî xwe da ku bi riya helbestên xwe bê naskirin. Peşêw, bi zimanekî rewan û paqij û bi muzîka şi'îrî û herdem helbestên wî alîgirên hejaran bûn û guzarişt li zilm û zordariya ku li ser miletê kurd dihat meşandin kir û zilma dagirkerên Kurdistanê da xwiyakirin û girêdana miletê kurd bi axa xwe ve û derxistina sozê dildarî û evîndariya paqij ya kurdan û dilsozya mirovê kurd kir nav ziman û edebîyata kurdî. Helbestên wî di seqayekî pak parwerde dibin û ew wek helbestvanekî xwediyê helwest herdem li aliyê mirovê hejar û zulmlêkirî û bi taybetî li alîyê mirovên hejar di nav miletê xwe de disekinî.

Em dikarin bêjin ku mamosta Ebdulla Peşêw yek ji dahênerên deqên zindî li cîhana helbestê bû û wêneyên helbestên zindî xiste kar.

### 2.1.2.Taybetmendiyên Kesayetiya Ebdulla Peşêw

A)-*((Peşêw, weko mirovekî xwedî bîr û raman û bi destê xwe, bi rêya qelema xwe li zingilê gelek mijarên ku ji berî wî kes behs nedikir da. Ew kesek biwêr bû û gelek mijaran behs kir ku berî wî kes llediwêrî behs bike yan jî li cem wan tiştek muqedes bû û nedibû ku behsa wê bê kirin. Çunkî ew kufr û gunehekî mezin bû, mîna rexnegirtin li siyaseta çep û xwar ya serkirdeyên kurd.*

[54].Ebdulla Peşêw, *Hespim Hewre û Rkêfim Çiya* , Şî'rî 1890_ 2005 çapî çarem , Kurdistan 2014 ,R 456_455
[55].Fexredîn Amîdyan , "*şeraî namdar kir* ", Çapxanaya neşir ana , Tehran Çapa êkem , 1388 , R 141

B)-*Peşêw, kesayetîyek yekdeng bû û bîr û bawera xwe pêş xist û li ser şopa xwe ma (bîrî kurdayetî) û ev jî di dema bîra çeprewî li cîhanê bilav bibû û Kurdistan jî li jêr bandora wê bîrê de bû. Di vî demî de Peşêw wek mirovekî dilsozê neteweya xwe hate qada serxwebûn û kurdayetiyê. Herwiha bi sedemên cuda raman û nêrînên cihê cihê yên hinek kesan li ser helbestvanîya Peşêw yan li ser kesayetî û dîtinên wî hene, lê bêgûman her ku pênûsê li dijî opozîsyonê bigre destê xwe şîyan û dahênanên wî yên wêjeyî yan hunerî wê ji pênûsên alîgirê serdestan xurttir û bihêztir be))*[56]

**2.1.3. Nerînên Nûseran Derbarê Kesatiya Ebdulla Peşêw**

Heta ku em zêdetir helbestvan Peşêw nasbikin emê behsa nerînên çend nûser, edîb û helbestvanên kurd yên li ser Peşêw bikin.

*1- ((Pirofêsor Diktor Marf Xeznedar: "Peşêw di destpêka helbestvaniya xwe de bû helbestvan ew weko helbestvanek ji dayk bû , Peşêw helbestan bo rûdawan nanivîse lê ew rûdawan dike helbest. Takedengê helbestê bû ku bi nirx ma û tu caran bihayê xwe ji dest neda di van salên dawî de. Çunkî bi qehremanî li hemberî karên nerew yên van rêxirawên li vir sekinî ku helbesta "Maç" û komela helbesta "Birakujî" vê rastiyê derdixe holê."*

*2- Helbestvan Şêrko Bêkes: "Ebdulla Peşêw yek ji helbestvanên herî xûyay yê kurd e û em hevtemenên yekin. Peşêw bandorekî mezin li ser beşek ji helbestvanên Hewlêrê hebû. Dîwana wî ya dawiyê min dît û tu cara ji ciwaniya helbestê bê par nebû."*

*3- Pirofêsor Şukriya Resûl: "Ji bilî ku xelkê bajarê Hewlêrê ye lê bi rastî Peşêw helbestvanêkî Kurdistanî ye. Rast e Peşêw ti peywendî bi ti partiyan re nebû lê xwîna wî û mejiyê wî û helwestên wî her kurd bûn .*[57] *Û mezintirîn belgeyê li ser kurd bûna wî ku jina xwe ya rûsî fêrî kurdî kiribû û zarokên wî jî bi kurdî diaxvîn."*

*4- Îsmaîl Berzencî Helbestvan û Rojnamenivîs: "Peşêw yek ji wan kesan bû ku ji me Hewlêrîya re tim muzîk û coş û xiroşek çêdikir em fêrî evîndarîya keçan û*

---

[56]. Ziyad Nadir Elalî , "*Ebdulla Peşêw helbestvanêk le regezî serbizêwî* " , çap û bilawkirdnewe xaneî Erbîl , çapî yekem , R 249 - 250

[57] .Ziyad Nadir Elalî , "*Ebdulla Peşêw helbestvanek le regezî serbizêwî* " , çap û bilawkirdneweî xaney Erbîl , çapî yekem , R 258

*ciwanîya jinan û çiyayan û gulan û kurdayetîyê kirin û ez dibêjim Peşêw yeksan e bi Hewlêrê re. ))*[57]

### 2.2. Hêma û Hêmagerî di Helbestên Peşêw de

#### 2.2.1. Naskirina Çemkê Hêma û Hêmagerî

Di her vekolîneke zanistî de dibe ku di destpêkê de em wî zaravî ron bikin ku vekolîn li ser tê kirin, dibe ku em bizanin gotina hêmagerî ji çi hatiye û wateya wê çiye. Gotina hêmagerî ji gotina *((symbol û ji kiryara "sîmballein" hatiye wergirtin û her ji vê nerînê, D. Kemal Merûf dibêje ku gotina sîmbol ji fermana sîmballein hatiye wergirtin û bi çend wateyan tê, (wek nîşan , durûşm , remz , amaje))*[58] yan jî bi *((wateya zindîkirinê tê))*[59] û di zimanên cîhanî de gotinên cûda yên hêmageriyê tên bikaranîn, mîna zimanê Îngilîzî gotina sîmbol bi kar tîne û zimanê erebî gotina remz bi kar tîne û di zimanê kurdî de gotina hêma û nîşan û amaje û cifigiyan tê bikaranîn û ji bilî van gotinan gelek caran gotina*(( sîmbol wek remz tê bikaranîn.*

*Ev sebaret bi nasandinekî zimanî ye, lê heger em nasandinekî zanistî bidenê her vekolerek li gor nerîna xwe hêmageriyê dide nasandin û dibêjin, hêma derxistineke ne rastexwe ye ku çavkaniya wê ji derûnîya mirov e û peywendiyeke di nevbera kes û tiştan de ye û mirov pê diçe cîhaneke bêyî ku heydar be û deq digehîne rewşekî derûnî ))*[60] Ji ber hose hêmakaran .Dibînin ku derûnîya helbestvan çavkaniya dahênanê ye. Firwîd dibêje, *(( çinkî hêmagerî di koka xwe de hestê mirov yê veşartî ye, yê ku girêdayî bi hemû rûdaw û diyardeyan e. Ew jî wateya wê ew e ku ev nerastewxwe ye û aliyê derûnî yê veşartî derdixe. Remiz tişteke û amaje bi tiştekî din ê nexwiyanî dike û ev jî cewherê remz e.))*[61]. Paş vê pênasînê em digihên wê rastiyê ku her lêkolerek li gor nerîna xwe pênaseyek bo çemkê hêmagerî daniye, lê hemû jî hevneêrîn in

---

[58].Kemal Meirof, "*Rexneî Nwêî Kurdî* ",Çapxaneî xanî wezarety roş*enbry, silêmanê 2007.R78*

[59].Muhemed Ebdulla Kelarî , "*Sembolîzim Derbirînî ne Bînraw be Hêma û Zalbûnî bîr be Ser Waqî da"* , g (Raman), J(105) , çapxaneî wezaretî perwerde , Hewlêr , şûbatî 2005 , R 139.

[60].Adil Germiyanî,"*Derûn Şîkarî u Edebî Derûnî"*, govara aynde, Hejmar 43, 2003, R, 34.

[61]. Aso Omer Mûstefa ," *beha îstatîkekanî şî'rî laî Pîremêrd ,Berheva Şêx Nûrî Salih û Goran* , çapxaneî xanî , Duhok , 2009 ,R 167.

ku hêmagerî derxistinek nerastewxwe ye û tim mebesta sereke bi sedema hêmayan tê veşartin û ev veşartin li çawaniya bikaranîna ziman tê çêkirin. Çimkî helbestvan, *((di helbestên xwe de li pê wateyên xwe digere ))*[62] Mebesta helbestvan ji hêmageriyê ew e ku nerînên xwe, yan jî raya xwe ya ku di helbesta wî de ye perdeyekî bixe ser, heta ku xwe ji desthilata siyasî yan jî dab û nerîtên civakî biparêze, yan jî bi mebesta hunerî hêmakariyê bi kar tîne. Çinkî "remiz rolekî giring heye di saz kirina helbestê de."[63] Em dikarin bêjin ku hêma çawaniya bi karanîna ziman e ji aliyê helbestvan ve heta ku bikaribe perdeyek li ser helbesta xwe çê bike. Çinkî *(( hêma du wateyan dide ew jî yek eşkere ye û hemû kes fêm dike lê wateya din nihênî ye û veşartî ye.))*[64] Ji ber hindê pêwîstiya wî bi şirove kirinê heye.

### 2.2.2. Serhildana Hêmageriyê

Eger em behsa hêmageriyê bikin weko diyardeyek bê rêbaz û şopeke zelal em dikarin bêjin ku hêmageriya dîrokekî dirêj heye û di gel mirov ji dayik bûye û mirov jî li pêşberî hêmayê bû her ji destpêkê ve. Çimkî mirov pêşîya ku wateyan fam bike û pêşîya ku bikarbe wateyan ji hev cûda bike ji komek nîşan fêm kir ku dikare ji amajeyan fêm bike, wek bawerbûn (dilrehet bûn) û xeyidandin û xweşîyê û er **?**jî di sîmayên kesên hemberî wî da derdikeve. Pêşîya ku mirov ji wateyan fêm bike berî wan ji remzan fêm dike mirov ji mêj ve hêma ji bo ew tiştên ku têkilîya wan bi hevûdû re heye danîye. lê di destpêkê da bazina wan hêmana teng bû û her hêmayek tenê amajeya yek tiştî bû (ji bo yek tiştî bikar dihat), di gelek rewş da hêma wek amaje, kirdar yan her xebat û tevgereke mirovan derdiket.*(( Ev bû sedem nemana hêmaya bi vî awayî, lê hêdî hêdî pêş ket heta dawiya ku dikarî bikeve nav zanistên edebiyatê û wekî rêbazekî edebî pêk hat bi navê rêbaza hêmageriyê. Em dikarin bêjin dîroka serhildana hêmagerîyê wekû rêbazekî edebî vedigere sala 1886'an ku li dijî rêbaza Pernas li Firansa ser hilda.))*[65].

---

[62]. Komelêk nûser ," *Xeyal û Rûh Çand Têrwanînek Bû Şî'irî Kurdî* ", çapxaneî dezgaî çap û pexşî serdem , Silêmanî 2004 , R 273.
[63]. Aso Omer Mûstefa ," Beha *Îstatîkekanî Şî'rî laî Pîremêrd Şêx Nûrî Salih û Goran"* , R 164.
[64] . Pexşan Elî Ehmed , "*Şêwazî Şî'rî Goran* ", çapxaneî renc , Silêmanî , 2009 , R 215.
[65] . Ekrem Qeredaxî , "*Sîmbolîzim le Edeb û Huner de* ", Govara aynda (j) 70 Çapxanaya serdem silêmanî kanwnî dwem 2007 R 73.

Çimkî bikaranîna hêma wekû çemkekî edebî heta piştî naverasta sedeya hejdem nederketibû. *((Şaril Mûryas sala 1884'an yekemîn dîwana xwe bilav kir û piştî hingê bi du salan dîwana xwe ya duyem jî çap kir ku remziyet bi temamî têde hat xuyakirin. Lewma sala 1886 bû sala jidayikbûna sembolîzimê))* [66] .Di derbarêdamezrênerê vê rêbazê de tê gotin ku *((damezrênerê vê dibistanê Cun Muryas bû. Çimkî li 182 Siptembera 1886'an di rojnameya Vîgaro de jidayikbûna vê rêbazê hat ragihandin. Bi deqekî aliwz ku rexne li pernasîzim û natoralîzim digirt))*[67] Sedem danîna *((Cun Muryas wekû damezrênerê evê rêbazê ji bo ku ewî ji bo xelkê da xuyakirin ka sîmbolîzim çi ye û çawa ye ))*[68]

Sebaret bi navê evê rêbazê tê gotin ku *(( Frenswayê ku bi eslê xwe Yûnanî bû cara yekem ewî gotina sîmbolîzim bi karanî))*[69]û sedema serhildana wê jî vedigere rizgarkirina mirov ji hemû ew qeyd û bendên siyasî û civakî ku rê li viyana mirov digirtin.Çimkî di *(( armanca sereke ya hemû hêmagerîyekê da şikandina qeyd û rêgirên civakî û ayînî û siyasî ye yên ku dibin rêgir li pêşiya viyana azad û mejî û hîş û derûna mirov. Çimkî hêmagerî her çend derbirîneke di cîhana wijdanî de ye, lê di hundir de komek naverokên civakî û siyasî û hizrî tê de ye ku li gelek cih û deman çênabe bi eşkere were gotin))*[70] diyartirîn helbestvanên vê rêbazê *(( Bodlêr , Vêrlîn , Rimbo , Mallrmê , Cun Muryas bûn))* [71] Çinkî van helbestvanan û çend helbestvanên din ku jimara wan bîst nivîserên ferensî bûn di rojnameyên wê demê de beyannameyek bilav kirin û tê de jidayikbûna vê rêbazê ragihandin, ew jî rêbaza hêmegerî bû *(( ku pişt re ev nivîskar wekî nivîskarên ne zelal hatin nas kirin))*[72]

---

[66]. Muhemed Ebdulla Kelarî , "Sembolîzim *Derbirînî ne Bînraw be Hêma û Zalbûnî bîr be Ser Waqî da* ", g (Raman), J(105) , Çapxaneî wezaretî perwerde , Hewlêr , şûbatî 2005 , R 139.
[67] . Kemal Meirof, "*Rexneî Nwêî Kurdî* ", R 81.
[68] . Mihemed Ebdulla Kelarî , "*Simbolîzim Derbirînî ne Bînraw be Hêma û Zalbûnî bîr be Ser* , R 139.
[69]. Ferhad Pîrbal , "*Rêbaze Edebiyekan* "( Amade kirdin û wegîran le ferensiyewa ) çapî dowem , çapxaneî Minare , Hewlêr , 2006 , R 144.
[70]. Ekrem Qeredaxî ," *Sîmbolîzim le Edeb û Huner de* ,R 80.
[71].Idrîs Kerîm Mihemed ," *Xwd û Beramberî le Qesîdeî ( Cardanî Merg )î Ebdulla Peşêw da* ", g ( Aynde ) , j(72) , çapaneî serdem , Silêmanî , Ayarî 2007 , R 5.
[72] . Ekrem Qeredaxî ," *Sîmbolîzim le Edeb û Huner de*" , R 80 – 79.

### 2.2.3.Cûrên Hêma

#### 2.2.3.1. Hêmagerya Mirî (giştî)

Eger em li cîhana helbestê binerin emê çendîn hêmayê cur bi cur bibînin ku hinek ji wan wateya wan eşkere ye û gozariştê li wateya xwe ya asayî dike, lê hinek ji wan wateya wan ne xûya ye û ne zelal e û bi hesanî wateya wan nayê zanîn.Hêmaya mirî yan jî giştî ew gotin, bêje yan jî hevok e ku helbestvan wek hêma di helbestên xwe da bikar tîne, lê gozarişt li wateyekî asan dike û xelk bi hesanî hest bi wateyan dike çinkî ev gotin yan destewaje, yan riste ji aliyê xelkê ve hatîne nas kirin û xelk dizanin ev hêmaye bo çiye. Ji ber hosa jê re dibêjin hêmaya mirî(giştî). Çinkî Ev cure ji bilî wateya xwe ya sereke wateyeke din jî dihewîne, wekû "rovî" yê ku hêmaya xapandinê ye û "gûl" hêmaya evîndariyê û aştiyê ye.

Yan jî dastanên filklorî wekû Mem û Zîn, Xec û Siyamend, Şêrîn û Ferhad ku hêmayên evîndariyê ne *((eger destewajeyek wateya wê ji wateya remzî rûntir be, ew remze dibe remzekî mirî, lê bihaya xweya dîrokî diparêze û bi sedema vê taybetmendiyê em dikarin jê re bêjin remiz û di helbestan de tê bi karanîn, lê wekû remzekî mirî))*[73] Ebdulla Peşêw di helbesta "Kak" de Mem û Zîn wekû hêmaya evîndariyê tine ziman.

*"Pêş eweî bême ber demit*

*Kam bîrî ciwan û xorpedare,*

*Kam dêr helbest zor be kare,*

*Şaneî dekem wek perçemt.*

*Le maweî çawqûçanêk da*

*Hezar û yek xewnî şîrîn*

*Demken bemem, detken be zîn......"*[74]

---

[73] . Kemal Meirof ," *Rexneî Nwêî Kurdî* ", R 81.
[74] . Ebdulla Peşêw , "*pişt le newa û rû le krêwe*" , R 142.

### 2.2.3.2. Hêmagerya Zindî (Kesî)

Hêmaya zindî helbestvan wekû hêma ev cure gotin bi kar tine, yan destewajê, yan ristê, lê bi awayekî ne zelal û ne xûyanî. Û wateya wê zû nayê fam kirin çinkî helbestvan vê gotinê yan destwajê yan ristê bi kartîne ji bo ku watayeke ku dûr e ji wateya xwe ya rastî. Lewma xwîner zû wateya wê fam nake. *((Remza kesî ew cure remz e ku helbestvan bi xwe çêdike bêyî ku berî hingî kesek ew remz bi kar anî be. Û ji vê remzê re dibêjin remza zindî. Çinkî helbestvan bi xwe çêdike û ew wê hêmayê zindî dike))*[75] wekû Peşêw, di helbesta "Kose" de gotina "kose" bi kar tîne wekû hêmaya diyardeyeke filklorî kurdî.

Li vê derê Peşêw, ew bi mebesteke taybet bi kar anîye. Ew nakokiyên ku di navbera şoreşvanên kurd de ji ber nezanîyê derketin, wekû kose ka çawa bi komî li deryên malan didin û xewa wan li ser çavên wan direvînin.

*"Hatin, hatin, kose hatin.*

*Bin zimanyan*

*Hezar û yek zûrnaî tyaye,*

*Gwêtan bigrin, tê nekewin.*

*Peîjekeyan*

*Dendeî rûtî birsiyekane.*

*Agadarî serbanan bin, sernekewin!..."*[76]

### 2.2.4. Sedemên Bikaranîna Hêmayê

Hemû şêwaz û riyên edebî sedemên xwe yên taybet hene û alîgirên wê neçar dike ku girêdayîyê wê rêçkê bibin û bi kar bînin. Hêma jî çend sedemên xwe hene û yên herî giring ev in ku em ê li jêr diyar bikin.

[75] . Aso Omer Mûstefa , *"Beha Îstatîkyekanî şî'ir laî Pîre mêrd , Şêx Nûrî Şêx Salih û Goran "*, R 174.
[76] . Ebdulla Peşêw ," Pişt *le newa û rû le kirê we* , Ş'irî 1965_1979" , çapî sêyem , çapxaneî (Hêvî) Hewlêr : 2006 , R 295-296.

- Sedema Hunerî

Mebest ji sedema hunerî ew e ku helbestvan tenê *(( bi merema bexşîna bihayekî îstatîkî bilind û derxistina şiyanê xwe ye hunerî remzan bi kartîne))*[77] Çinkî ji bilî ku*(( hêma sîmayekî ciwan dide helbestê lê tamekî xweş jî di de helbestê ))*[78]. Wekû tê xûya kirin di helbesta Peşêw de ya bi navê Zamî Zîndwî Şîlî ku tê de dibêje.

*"Deşî ehrîmen beheştî xwaî berkewê*

*Deşê rûbar*

*Rûle hewraz bê û serkewê.*

*Deşê mem zîndo bêtewê,*

*Le ser singî zîn bisrewê.*

*Belam naşê carêkî tir,*

*Minê dildar bigem beweî xwşimdewê....."*[79]

Wekû tê xûya kirin Peşêw di vê helbestê de du hêma bi kar aniye, "Ehrîmen" ku hêmaya ayîna Zerdeşt e. ya dowem jî navên "Mem û Zîn" Peşêw tenê bi mebesta anîna karekî îstatîkî ev hêmayana bi kar aniye.

- Sedema Civakî

Yek ji sedemên ku helbestvan naçar dike ku hêma bi kar bine ew e ku *(( hinek caran helbestvan ji ber sedema dab û nerîtên civakî nikare bi eşkere hinek tişt bibêje lewma jî remzan bi kar tine))*[80] Ev jî diyar dike ku, *(( mirov her dem li jêr bandorên rêgirîyên civakî de bû. Lewma dema ku nexwestiya yan newêrîya nerînên xwe bi eşkere di helbestê de bêje berê xwe da awayê remzî û di rêya hêmayê re karî nerînên xwe bibêje da ku xwe ji pirsgirêkên civakî dûr bixe))*[81] .

---

[77]. Aso Omer Mûstefa ," *Beha îstatîkyekanî şî'ir laî pîremêrd , Şêx Nûrî Şêx Salih û Goran"* , R 168.
[78]. Heme Kerîm Hewramî , "*Bizotneweî Sîmbolîzim Çend Nimûneyek le Edeb û Hunerî Sîmbolîzim* ", Çapxanay serdem silêmanî 2006 Çapî yekem ,R 103.
[79] . Ebdulla Peşêw ," *Pişt le Newa û Rû le Kirêwe* ", R 211.
[80].Aso Omer Mûstefa," *Beha Îstatîkyekanî Şî'ir laî Pîremêrd , Şêx Nûrî Şêx Salih û Goran* ", R 168.
[81] .Ekrem Qeredaxî ," *Sîmbolîzim le Edeb û Huner da"* , R 77.

Em ji vê rastyê digihên wê encamê ku sedema civakî roleke giring heye di *(( serhildana rêbaza hêmayê de û ev rêbaz bû yek ji sedemên retkirina wan dab û nerînên kevneperest yên ku her dem rêgir bûn li pêşiya azadiya mirovan. û ev jî bû sedem berhemanîna çend berhemekî balkêş))* [82]

Bê guman ev rêgiryên civakî jî bûne rêgir li pêş helbestvanan da ku bikarbin bi azadî nerînên xwe dîyar bikin. Lewma Peşêw, di helbesta "Sê Nameî Kurt" de dibêjê:

*"Xoşewîstim!*

*Namekanim bi sûtêne.*

*Ew hunraweî bût nûsîwin*

*Sêdareî bû damezrêne.*

*Dilgîr mebe....*

*Le laî ême, nek tû pîawiş*

*Le ser wişeyekî balder*

*Qulbest dekrê debrê le dar...."* [83]

Di vê helbestê de Peşêw, dixwaze ku evîndar xwe aram bike û dibêje ku dilgiran nebe, Çinkî ne tenê zordarî lê hatiye kirin lê li me jî hatiye kirin, her çend ku em zilam in. Çinkî Peşêw, dizanî eger kes bi evîndariya wan bizane wê dastana (Welî Dêwane û Biraîmî Mela Zêndyan , .... hwd) wê dîsan dubare bibe. Ji ber hinde daxwaz ji evîndara xwe dike nameyên wê dişewtîne da ku rastî sizaya civakî neyê.

- Sedema Siyasî

Sedemên siyasîyek ji sedemên sereke ne yên ku dihêlin helbestvan hêma bi

[82]. Kemal Meirof , "*Rexneî Nwêî Kurdî*", R 82_83.
[83]. Ebdulla Peşêw ," *Pişt le Newa û Rû le Kirêwe*" , R 162-163.

kar bîne.*(( Çinkî gelek caran mirov li hemberî desthilatîya siyasî nikare bi temamî nerînên xwe eşkere bike. Ji ber ku desthilatî dibe rêgir li pêş wî lewma neçar dibe ku hêma bi kar bîne da ku bikaribe bi rêya hêmayê hestên xwe bide xûyakirin))*[84] Ev jî wê yekê derdixe holê ku siyaset yek ji sedemên bikaranîna hêmayê ye,*(( helbestvan bi kar tine ji bo ku rastî zilma desthlatdaran neyê ))*[85] Çinkî *(( gelek rewşenbîrê cîhanê hebûn ku tim berjewendiya giştî li pêş çavên wan bû û xwe kirin qurbana xelkê bêyî ku ti qezencekî kesî ji wan re hebe û rastî eşkenceya desthilatdaran hatin û gelek ji wan jî hatin bidarvekirin))*[86] Ji ber hosa helbestvan hêma bi karanî, mina ku Peşêw di helbesta xwe ya "Nameyek Bû Dore Welat" de dibêje :

*"Sinûr dengim dexwatewe.*

*Rêî çapxane*

*Be jêr qelemêkî sor da têdeperêt.*

*Cokere Kan*

*Dergakanyan daxistwa,*

*Ferşî soryan*

*Bû bê dengîm raxistwa......*[87]

Peşêw di vê helbestê de "Qelema Sûr" wekû hêma bi kar anî, çinkî rengê sûr hêmaya sînordaryê ye bê guman helbestvan ji ber rewşe siyasî hêma bi kar aniye. Çinkî helbestvan ev helbest di sala 1972yan de li Hewlêrê nivîsîye û di wê demê de Beisîyan li Hewlêr hukum dikirin û li ser hemû saziyan zal bûn û bi taybetî saziya çandê.

---

[84]. Ekrem Qeredaxî , "*Sîmbolîzim le Edeb û Huner da*" , R 78_79.

[85]. Aso Omer Mûstefa , "*Beha Îstatîkyekanî Şî'ir laî Pîre mêrd , Şêx Nûrî Şêx Salih û goran*" , R 168.

[86]. Ebdulkerîm Hemîd Ebdulkerîm ," *Ehmed Mûxtar Begî Cav Şaîr û mirov*" , çapxaneî dezgaî çap û pexşî serdem , silêmanî , 2000 , R 187.

[87]. Ebdulla Peşêw ," *Pişt le Newa û Rû le Kirêwe* ", R 287.

Ji ber hindê helbestvan bê tirs nedikarî van tiştan bişîne derveyî welat lewma hêma bi kar anî da ku merama xwe bide xûya kirin.

- Sedema Derûnî

Sedema derûnî jî yek ji sedemên derketina hêmayê ye.*(( Çinkî mirov di hinek deman de û di rewşekî saîkolojî de hêma bi kar tîne da ku hindekê derûnîya xwe aram bike û her çi di hindirê wî de heye bibêje û derxe der))* [88]

Ev jî tekez dike ku *(( helbestvan di rêya sîmbolî re dikare xwe ji rewşa derûnîya xirab rizgar bike))*[89] Çinkî peywendiyekî bihêz heye di navbera edeb û derûnnasî da, ku herdu jî çareseriya derûnîya mirov dikin. Lewma hêma derîyeke bû da ku helbestvan xwe ji fişarê derûnî rizgar bike yên ku di encama pirsgirêkên jiyanê de derdikevin. Wekû Peşêw di helbesta xwe ya bi navê “Kirêwe” de dibêje :

*“Zor detirsim,*

*Le naw şî'rekanma şar bitnasê,*

*Kamîreî çawî kergewer*

*Wênet bigrê û helîwasê,*

*Zor detirsim, Eger bitnasin,*

*pencekanim helwerênin,*

*Şabiskî tûş bisutênin”*[90]

Eger em bala xwe bidin vê helbestê em bibînin ku ev helbest ji dil û derûnîyekî aram derketîye. Çinkî çendîn gotin hatine bi kar anîn ku hemû jî didin nîşan ku helbestvan ji dil û derûniyek aram vê helbestê dibêje. Û diyar e ku ji destpêkê de dibêje ez di tirsim. Ji van hemû tiştan ditirse ku dibin sedemên eşkerebûna peywendiya wî ya evîndarî. Û gotina tirs yek ji wan gotinan e ku derûnnasan kar li ser kirine û di encamê de wekû çemkekî derûnasî hatîye destnîşankirin.

---

[88] . Ekrem Qeredaxî , ”*Sîmbolîzim le Edeb û Huner da* ”, R 78.

[89]. Rizgar Şêxanî ,” *Êkêlof û KarîgerîNax”*, R(Hewlêr) , j(823) , 14_temûzî_2010 , R 16.

[90]. Ebdulla Peşêw ,” *Pişt le Newa û Rû le kirêwe”* , R 204.

### 2.2.5. Çavkaniyên Hêmageryê di Helbestên Peşêw de

Eger em seyra helbestên Peşêw bikin emê gelek cureyên hêmayê yên cuda bibînin ku ji çavkaniyên cuda hatîne. Çinkî Peşêw, alavên hêmageriyên xwe ji çendîn çavkaniyên cêwaz wergirtiye. Her wekû *((Peşêw di piranya helbestên xwe de remz bi kar aniye bi hemû curên xwe wekû remzên efsaneyî, olî, dîrokî, keleporî, cîhanî û xwemalî))*[91] , û her wisa *(( xweza û rengên cuda bû çavkanîyên hêmayê di helbestên kurdî yên nû de))*[92] Lewma Peşêw, wekû helbestvanekî nûxwaz Ji bilî ku fayde ji alavên dîrokî û efsaneyî û olî û keleporî wergirtibû, fayde ji alavên xwezayî û rengên cûda wergirtibû û wekû hêma di helbestên xwe de bi kar anî û bi awayekî nûxwazî. Peşêw*(( bi awayekî nûxwazî miamele bi remz re kir û bi merema derxistina naverok û pîr û meremê di helbestê de bi kar anî. Her hosa wekû rêgezeke sereke ya hunerî û şêwazeke nû di piranya helbestên xwe de bi karanî))*[93] Ji bilî vê jî Peşêw *(( karîbû di rêya behskirina serpêhatiyên neteweya xwe çendîn remzên cur bi cur kom bike))*[94] Em dikarin bêjin ku çavkaniyên hêmayê yên di helbestên Peşêw de evên li xwarê ne:

- Ayîn

Alav û rûdanên olî çavkaniyeke giringe ji bo bilavbûna hêmegeryê di helbestên kurdî de. Çinkî gelê kurd xwedîyê çendîn ol û ayîn bû wekû, Êzidîtî , Kakaîtî , Îslam , Zerdeştî û ......hwd. Vêca alav û rûdanên van olan bi giştî bû cavkaniyeka giring a helbesta kurdî. Lê şêwazê miamelekirinê ya bi alav û rûdanên olî re cêwaz bû di navbera helbestvanên klasîk û helbestvanên nûxwaz. *((Helbestvanên klasîk bi awayekî berfireh miamele di gel ol kirin. Çinkî gelek ji wan li binemalên olî mezin bibûn û ev jî bû sedema ku rêbaza sofîzmîyane bigirin û tê de bi awayekî reha kûr bin.*

*Lê belê di helbestên nû de bi awayekî din miamele di gel olê hat kirin û helbestvanên hevdem bi nerîna olî remzan bi kar neînan))*[95] Lê ew alavên olî wek rêyek bû ku helbestvan di gehandina ramana xwe de bi kar tine, wekû di helbesta “Tabloyekî Zistanî” de dibêje :

---

[91] . Şermîn Îbrahîm Ezîz ,”*Peşêw Tazekirdnewe le Şî'rî Kurdî De”* , R 204 – 205.

[92]. Husên Xazî Kak Emîn , ”*Niwêkirdneweî Şî'rî Kurdî le Salî 1932 ta kotay 1949 le Kurdîstanî Îraq* ”,Namaya master Hewlêr 2011 R 260.

[93]. Şermîn Îbrahîm Ezîz , ”*peşêw û Tazekirdnewe le Şî'rî Kurdî De”*,R 204.

[94]. Heman Serçawe , R 214.

[95] . Kemal Meirof, ”*Rexneî Nwêî Kurdî ”* , R 102.

*"Were xwarê !*

*Serî estêrekan mebir*

*Berî kilaw rojne megre*

*Lêfeî eyûb be xot da de*

*Ta duruşmî ser taqekan desotênim*

*Çîlkeî penceî tirsnukî şî'rekan*

*Kursî û mêzî*

*Jûrî kuşke samnakekan desotênim*

*Beyanîş zo*

*Le bîr nakem*

*Kilafeî rê dekemewe*

*Qasî asoî bû deşkênim*

*Kulêreî zêr derdehênim....".*[96]

Li vir *(( helbestvan merema wî ew e ku ji mirovên kurd re bêje ku hun sebrê bikişînin heta ku tu bigihêjî armanca xwe))*[97] Wekû hêma navê Eyûb Pêxember bi kar tine, çinkî ew nîşana sebirê ye di olê de.

- kelepor

Kelepor ew *(( berhemên edebî û hunerî yên ku ji bav û bapîran ji me re mane û nivşên pişt re tiştên nû avêtine*

*Ser û lewma dewlemendtir bûye))*[98] û alavên filiklorî jî ku ji helbestên filiklorî û çîrok û pendan, ....pêk tê. Vêca hemû ew alav bûne Çavkaniyên giring ya helbesta kurdî, lewma gelek helbestvanan di helbestên xwe de bi kar anîne. Wekû hêma

[96]. Ebdulla Peşêw ," *Pişt le Newa û Rû le Kirêwe"* , R 285 – 286.
[97]. Şermîn Îbrahîm Ezîz *, "Peşêw û Tazekirdnewe le Şî'rî Kurdî de "*, R 211.
[98]. Serdar Ehmed Hesen Gerdî ," *Binyatî Wêneî Hunrewî le Şî'rî Kurdî de 1970 – 1991"* , Dezgay Aras hawlêr 2000,R 300.

alavên filiklorî hatîne bi kar anîn. Peşêw yê ku alavên filiklorî bi kar anîye wekî hêma. *((Çinkî yek ji sîmayên helbesta hevdem ew e ku feydê yan jî sûdê ji semyanên filiklorî û keleporên netewî wer bigre))* [99] Mîna ku di helbesta "Eger Em Care Bêmewe" de dibêje :

*"Ey daya giyan*

*Êsta gewrem û minal nîm*

*Eşqî tamî û tifit û tal nîm*

*Ke çî eger em careşyan*

*Rêm bi kewêtewe bîrkot*

*Lêşim heram keî şîrî xot*

*Min be têşyekeî minalî de rêsimewe*

*Dar , berd , gil , qor*

*Çîm bête rê deîlêsmewe"* [100]

Li vir Peşêw amaje bi penda berê dike ya ku dibêje "Xûyê şîrî, heta pîrî". Çinkî heman wateya vê pendê heye, Her hosa di helbesta "Kak" de di rêya bikaranîna navê "Mem û Zîn" feyde ji mesnewî "Mem û Zîn" wergirtîye. Çinkî wekû hêma bo evîndarîyê bi kar anîye û tê de dibêje:

*"Pêş eweî bême berdemit*

*Kam bîrî  ciwan xorpedare*

*Kam dêr helbest zore be kare*

*Şaneî dekem wek perçemit*

---

[99]. Şermîn Îbrahîm Ezîz ," *Peşêw û Tazekirdnewe le Şî'rî Kurdî de* ",R 216.
[100]. Ebdulla Peşêw , "*Pişt le Newa û Rû le Kirêwe*", R 364.

*Le maweî çawqoçanêk de*

*Hezar û yek xewnî şîrîn*

*Demeken be mem , de tken be zîn ...”*[101]

- Dîrok

Alavên dîrokî çavkanîyên giring in ji bo hêmageryê. *((Çinkî helbestvan feydeyeke mezin jê werdigre û rûdan û karesat û serpêhatyên dîrokî di helbestên xwe de bi kar tine. Serkirdeyên jîr û jêhatî dibin remza rûdan û karesatan dikevin qalibê helbestê û bi serdemê re lêktînin))* [102] Lewma piranîya helbestvanan feyde ji çavkaniyên dîrokî wergirtine û kirine hêma, çi ji dîroka neteweya xwe be û çi jî ji dîroka cîhanî be, *(( Lewma dîrok çavkanyeke giring e û tejî ye ji rûdan û karesatan. Vêca helbestvan ezmûna xwe pê dewlemend dike û ji aliyakî din ve jî kesayetiyên dîrokî wekû hêma bi kar tîne da ku gozarişt li helwêsta helbestvan bike, yan jî kêmasyên nû derxe))*[103]

Peşêw yek ji wan helbestvanan ne yê ku çendîn hêmayê dîrokî di helbestên xwe de bi kar anîye, mîna ku di helbesta “Kejawî Giryan” de çendîn hêmeyên dîrokî bi kar anîye, wekû “Kûr Paşa” ku hêma ye ji bo Mîr Mihemed kurê Mistefa Beg*(( yê ku di sala 1813’an de bû mirê Mîrgeha Soran))*[104]

Her wisa, *((Çarçirayî Mihabad” ku hêma ye ji bo bidarvekirina Pêşewa Mihemed. Her wisa “Alayî Xwênînî Mihemed” ku hêma ye bo bidarvekirina Pêşewa Qazî Mihemed û Xencerî Kur Paşa jî hêmaya hêz û desthilatîya Paşayê Kur e ku paşayê Mîrgeha Soran bû û ji aliyêkî din ve jî Xencer, hêmaya resenayetiyê ye. Li vê derê ruhê berevanyê dide xûya kirin her hosa Mihabad û Çarçira du remzên giring in ku remzê cihê darvekirina Qazî Pêşewa))*[105] ye, wekû ku dibêje :

---

101. Ebdulla Peşêw ,” Pişt le Newa û Rû le Kirewe” , R 142.
102. Hawjîn Silêwe Îsa , ”*Binyatî wêneî hunerî le şî'rî Şêrko Bêkes de*” , çapxaneî dezgaî çap û pexşî serdem ,Silêmanî , 2009 , R 291.
103. Kemal Meriof, ”*Rexneî Nwêî Kurdî*” , R 106.
104. Hesen Mehmûd Heme Kerîm ,” Fetwakeî *Melaî Xetê ( Efsaneî MêjwNûsêk )*”, çapxaneî Çarçira , Silêmanî2006 , R 12.
105. Şermîn Îbrahîm Ezîz ,” *Peşêw û Tazekirdnewe le Şî'rî kurdî de*”, R 208.

“Biram şêrko

Kejawekeî kiryanî tû

Wek ademîzadeî raperîw

*Giyanî* germî le ber du bû

Xencerekî cewherdarî

Kûr paşaî le kemer de bû

Le pêşengî kejaweta

Alaî xwênînî mihabadim helkira bû

Le tek ewede

Sêdarekeî çarçira bû ....."[106]

Her wekû amaje pê hatye kirin ku Peşêw, feyde ji alavên dîroka cîhanê jî wergirtîye û yek ji wan alavên dîrokî navên kesên navdar yên cîhanê ne. Bo nimûne di helbesta, “Bû Martinî Mirov” de navê Loter Kîng bi kar anîye, yê ku mafparêzekî reşpêst bû yê Emrîka ku di sala 1964’an de xelata Nobel ya aştiyê wergirt û di sala 1968’an da hat kuştin û bû hêmaya aştiyê li cîhanê. Çinkî tim li dijî şer û tundû tîjiyê bû û mirovekî gelek nermenîşk û aştîxwaz bû. Wek ku dibêje:

*“Ay Loter Kîng*

*Rişî gizing*

*Şûreî aştî û birayetî*

*Derûn kangaî azayetî*

*Peyamberî reş pêstekan*

*Parêzerî bê beşekan*

[106]. Ebdulla Peşêw , *”Pişt le Newa û rû le kirêwe”* , R 153 – 154.

*Tû kûjarî zo*

*Tawanîşit her ewe bû*

*Gotit debê ....debê le jîn*

*Be yeksanî hemû bijîn”* [107]

- Reng

Reng çavkaniyekî giring ya hêmayê ye di helbestê de. Çinkî roleke mezin ya rengan heye di danîn û xemlandina helbestê de. Lewma helbestvanan karîne feydê ji rengan wergirin û wekû hêma ji bo meremên taybet bi kar bînin û her rengek meremeke taybet lê bar bikin. Ji ber vî *((ev hêma di berhemên gelek helbestvanên nûxwaz de tê xûya kirin))* [108] Vêca Peşêw ji ber ku helbestvanekî nûxwaz bû ewî gelek reng di helbestên xwe de bi kar anî û sûdekî mezin jê wergirt û her wisa wekû çavkaniyekî hêmagerî bo meremên xwe yên taybet bi kar anîn. *((Çinkî Peşêw wekû helbestvanekî serkeftî karî bû miameleyê digel her rengegî bike û wêneyên danênerên ciwan jê çê bike))*[109] Wekû mînak, di helbesta xwe ya bi navê “Defterî Sor” de rengê sor wek hêma bi kar anîye. Çinkî *((rengê sor hêmaya xebat û şoreş û berxwedanê ye. “Defterî Sor” jî hêmaya parêzgerîya mirovan e. Lewma Peşêw feyde ji vê hêmayê wergirtye ji bo parastina mirovahiya, xwe û neteweya xwe bi kar anîye. Lê bi aweyeke ne rastexwe daxwazname pêşkêşî “Yonisko” kirye ))*[110] da ku ji destê dagîrkeran rizgar bike. Wekî ku dibêje:

*“Weletanî têrî cîhanî*

*Defterêkî soryan heye*

*Bû ew mel û giyandarane*

[107]. Ebdulla Peşêw ,” *Pişt le Newa û Rû kirêwe”* , R 123-124.
[108]. Husên Xazî Kak Emîn ,” *Niwêkirkneweî Şî'rî kurdî le salî 1932 ta kotaî 1949 le Kurdistanî Îraq ”*, R 260.
[109]. Şermîn Îbrahîm Ezîz , ”*Peşêw û Tazekirdnewe le Şî'rî Kurdî de”* , R 225.
[110]. heman serçawe, R 225.

*Ke kuştinyan qedexeye*

*Tika dekem le Yonisko*

*Le deftere sorekey da*

*Nawî minîş tomar bike*

*Le rawker û bazirganan*

*Kewl û pêstim rizgar bike"*[111]

- Xweza

Alavên xwezayîçavkaniyeke giring û berbilav ya hêmageryê ye di helbestên kurdî yên nû de. Çinkî helbestvanên nûxwaz giringiyekî mezin dane xwezayê û alavên xwezayî di helbestan de bi kar anîne. *(( Xûya ye ku xweza baştrîn hêma ye ji bo helbestên kurdî yên nû ))* [112] Sedemên bikaranîna alavên xwezayî yên bi awayeke berfireh ji aliyê helbestvanên nûxwaz ên kurd ve Ew in ku *(( xweza çavkaniya yekem ya hemû tiştî ye û bêyî xwezayê tiştek bi navê helbestê nîn e ))*[113] û ji alîkî din ve vedgere bo bandore li edebîyata romansî ya kurdî.

Çinkî yên romansî dibînin ku alavên xwezayî baştirîn alavên hêmayê ne. ji bilî wê ji*(( bêzarbûna helbestvanên romansî ji waqiî wa kir ku helbestvanên romansî berê xwe bidin xwezayê û alavên wê da ku helbestên xwe pê dewlemendtir bikin))*[114] . her çende *((hêma ji waqiî tê wergirtin lê baş wergirtina wan waqiê diherifîne û dibe beşek ji cîhana bîr))*[115]Ew alavên xwezayê yên ku Peşêw di helbestên xwe de bi kar anîne gelek in. wekû, gul û curên wê , dar û curên wê, pirpirîk, çem û rubar, ba, reşeba, asman, zevî, şev, roj, ewir, baran, stêrk, birûsk, agir, werzên sale, gur, heîv, berf, terse, tavge, û hwd. Wekû mînak şev û heyv ku şev hêmaya xem û xefet û zulm û jiyana tal û tarî ye û heyv jî hêmaya ciwanîya xwezayê û dost û hevxemîya dildaran e û qubleta wan e. Ev herdu alavên xwezayî ne ku Peşêw di helbesta "Be Derge" de dike hêmaya hevderdî û hevxemîya xwe û dibêje:

---

111. Ebdulla Peşêw , "*Hespim Hewre û Rikêfim Çiya*" , R 29.
112. Husên Xazî Kak Emîn , "*Niwêkirdneweî Şî'rî Kurdî le salî 1932 ta kotaî le Kurdistanî Îraq*" , R 260.
113. Hawjîn Silêwe Îsa ," *Binyatî Wêneî Hunerî le Şî'rî Şêrko Bêkes de* ", R 281.
114. Pexşan Elî Ehmed ," *Şêwazî Şî'rî Goran* ", R 217.
115. heman serçawe , R 216.

*"Şew raşka,*

*Ejnûm şil bû,*

*Mang be taqî esmanewe helpiroka:*

*Dergeketim lê bikewe,*

*Dar û berdî ber dergetan hatine tika!........".*[116]

Yan jî di helbesta "Ême Dirextî" de gotina "Helwî Şaxan" wek hêma bo pêşmerge bi kar anîye her wekû dibêje:

*"Hestin , helwî şaxan , hestin!*

*Le hestanan da êwe zorin:*

*Çil milyon çaw,*

*Çil milyon qaç,*

*Çil milyon meçk û destin.*

*Hestin,helwî şaxan,hestin!........."*[117]

- Efsane

Efsane jî yekji çavkaniyên giring ên hêmagerîyê ye. Çinkî efsane yekem hewla mirovan ya ji bo têgeheştina diyardeyên xwezayê û zal bûn, her wisa jî efsane her wek deryaçeyeke edebî ya ku qet namiçiqe bû ku lewma helbestvanên hevdem tim li efsaneyan vegeryan û di helbestên xwe de bi kar anîn. Bikaranîna alavên efsaneyî wekû çavkaniyeke hêmagerî ji aliyê helbestvanên nûxwaz ve ji bo du mereman hatîye bi kar anîn. Ya yekem, ji bo ciwankirina dêmên helbestê û bihêzkirina wateya wê bû. Ya duwem jî ji bo derxistina meremeke taybet bû, ku wekû hêma hetîye bi kar anîn. Her wisa gelek deman jî bi merema siyasî hatîye bi kar anîn. Wekî din *((helbestvanan hêmayên efsaneyî zêdetir bi merema ku bale bikêşin ser pirisgirêkên*

---

[116]. Ebdulla Peşêw , *"Pişt le Newa û le Rû Kirêwe"* , R 149.
[117].Ebdulla Peşêw , *"Hespim hewre û rikêfim çiya "*, R 21.

*siyasî bi kar anîne))*[118] û helbestvanên nûxwaz ên kurd jî bi rêya xwendina berhemên nû yên helbestvanên îngilîz fayde ji *(( alavên efsaneyî dîtin. Helbestvanên nûxwaz hinek hêmayên efsaneyî bi kar anîn ev û kar jî ji ber xwe ve nehat. Belkû di encama xwendina helbestên hevdem yên inglîzan de bû ku ewan alavên efsaney bi karanîn, lê ewan hemû hêmayên efsaneyî bi kar neanîn.*

*Çinkî ewan berê xwe dan semyanên filklorî yên neteweya xwe û gelek hêma jê wergirtin ku ev bikaranîn ji aliyê helbestvanan ve bi merema veşartina wateyekê bû))*[119] Peşêw jî yek ji helbestvanên nûxwaz ên kurd bû ku berê xwe da alavên efsaneyî û wekû hêma di helbestên xwe de bi kar anî. Wekû mînak di helbesta "Kejawî Giryan" de dibêje:

*"Biram Şêrko!*

*Bem çawedîm*

*Zerdexeneî le diwawa bû*

*Kejawekî giryanî tû.*

*Le tinûkî firmêskt da*

*Demarî bazoî kawem dî,*

*Laşeî kewtwî zohakim dî,*

*Alaî berzî şekawem dî,*

*Asoyekî ronakim dî."*[120]

Her wekû li vir xuya ye ku Peşêw, di rêya vê helbestê re dikeve gengeşê bi Şêrko Bêkes re û di vê guftûgoyê de navê "Kawa û Zohak" tîne ziman ku ev hêma ji efsaneya "Kawa û Ejdehak" e, ku tê de "Kawa" bûye hêmaya serkeftina bindestan ya

---

118.Ebdulqadir Mihemed Emîn ," *Wêneî şî'rî le Rêbazî Romansî Kurdî da" Çapxanay mûkiryan 2010 hawlêr 2010, çapa ekem* , R 21.
119.Pexşan Elî Ehmed ," *Şêwazî Şî'rî Goran* ", R 224.
120. Ebdulla Peşêw , "*Pişt le Newa û Rû le Kirêwe* ", R 156.

li hember zalim û sitemkaran û “Zohak” jî bûye hêmaya zilm û zorê û dawîhatina wî ya bi destê bindestan. Lewma Peşêw, dixwaze bi rêya navê “Kawa” li dilê Şêrko Bêkes bide. Çinkî, “Kawa” wek hêmayeke neteweyî û rizgarker û ji bo nehiştina şer û xirabîyan tê bi kar anîn.

## Beşa Sêyem

### 3.1. Bê Hîway – Hîwa - Bêhêvî yî - Hêvî!

Hêvî; li rûyê zimanvanîyê ve gelek rêman li xwe digre (têda hene) weke; *((daxwazî, armanc, berçav, zelalî, bendewarî, pêşbînî, bawerî…hwd. Herwiha ''bêhêvî'' jî hinek rêman di xwe da digre weke; bêdaxwazî (bêumêdî) bûn, bêpar bûn, bêçareyî…))*[121] Hêvî di zimanê 'erebî da (rica) û di îngilîzî dahope û di farisî da jî omîde. Herwiha li hemberî bêhêvî ya kurdî di 'erebî da ?bi îngilîzîhopeless û di farisî da jî na-omîd e. Hêvî faktora îwa birewdan û bilindbûna mirovan e, dema ku hêvîya mirovan têk diçe jîyana kirdarî namîne.

*((Hêvî faktoreke ji bo hêsin (xud), hinav û xweşîya jiyanê û birewdanî**?** Canê mirov e))*[122] Dema ku hêvî ji destê mirovan diçe, tevgera her mirovî cuda ye li hemberî vê ji dest çûnê. Ev jî ji ber pêwendîya bi cîhanbînî û dîtina şêweyê mirovan e ku çawa li jiyan û cîhanê dinerin herwiha pêwendîya wê bi amdeyî û cor bi corîya dîtina mirovan jî heye.

''Hêvî û îman weke qalîteya serekî ya jîyanê bunyeya xwe danîye li ser siruştê, bi arasteya (bervîbûna) baştir bûna di wê rewşa ku heye. Bi şêweyê komî yan takî (tek) gavê davêje, eger jîyan bi şêweya pîvanê gavê bavêje bervî mirinê dihere, dema ku pîvana wê temam dibe ew gava mirinê ye''.

Bawerîya kesên bêhêvî bi xwe tuneye û tu car jî nikarin xwe hêvîdar bikin, ji ber wê hêza lebat û hêvîdarîyê ji deste wan çûye.

''Di vê rewşê da rêjeya çalaki û giramî (mitmane) ya bi xwe bûna kesan kêm dibe û bi vê jî rêjeya perîşanî û bêhêvîya kesan zêde dibe''. Giringtirîn xwestin û rêya serdest bûna bi ser bêhêvîtî û bêbendewarîtî yê ewe ku dîtina wataya jîyanê ye. Ji ber wê ku mirov bi encamdana kirinên ciwan nirxên jîyana xwe fam dike û jan û azarên xwe yên heye, jîyan ewe ku mirov bigêje hişyarî, zanyarî û mezintî yê.

121. Elî akbir ,"*Dihxida , Lixe Nameî Farsî''* ,Çapaxnaya tihran1372 êkem ,R 750.
122. Arik Firom ,*"Amiyd Anqlab ",* tircmayî micîd ruşingir,Çapaxnaya tihran Êkem 1368, R28.

Heta ku bi vê rêyê bikaribe çavkanîyên werçerxan û guherînan bibine û bikaribe bandoreke erênî li ser xwe û civakê bike. Mezintî bi çêbûna hemû tiştên ku mirov bi hişyarî ya xwe ve ew wataya di jîyana xwe da li ser hemû çêbûnên dirust bi dest dixe, eger bi vê şêweyê nebe tu (hîç) tiştêk bi dest nakeve û tu wataya jîyanê di dîtina mirovan da namîne. Bi şêweyekî giştî gav avêtina ji bo bêhêvîtîyê ji ber wê negihîştina mirov e ku bi wan tiştên ku bi xwe dixwaze . Dema ku bi vê şêweyê digêjin daxwazên xwe tu car beredayî (sergerdan) nabin, dewê (tenanet) rûyê erênîyê wan jî heye û hest jî bi hewlên xwe dikin, teslîmî astengîyan nabe belkî watayê dide wan.

Îman bi Xwedê û bawer bûn bi hebûnê di vê dîtinê da hêzê dide mirovan heta ku bergîya azarên jîyanê ji bo gihîştina armancên xwe bigre. Ji bo gihîştina armancan û bi vê rêya jî ji bo gihîştina îman, hêvî û evînê tevlîhev dibe, w ali mirovan dike ku aramîyê bigre û li hemberî bêwatayî û bêtalîyê şer bike.

*((Mirin li vî rûyê dawîya jîyanê nîye, belkî veguhestina rewşekê ye ji bo rewşeke din))*[123]**.** Wate (yanî) di vir da serdestî û mezintîya dibistanê heye ku dirustkerê bingeha jîyan û bawerbûna mirov e û hêvîyê dide mirov û jîyanê.

Şêweyên cur bi curên ‘’bêhêvîtî’’ û ‘’hêvî’’ yê di helbestên Ebdulla Peşêw da, li pişt wateyên helbestên Ebdulla Peşêw aşop (endêşe) û dîtineke kûr xwe dihewîne ku w ali xwendevanan dike biçine nava kûrahîya mijaran.

Ew helbestvanê ku bi dû aşopê dikeve û nirxê dide aşopên xwe ew bê armanc helbestan nanivsîne û nabêje. Ew armanca helbestyane ku ji bo mirovan diyar dike (dide xuyandin) dîtina xwe ji bo mirovên cîhanê nişan dide, bi wê piştgirîya mezhebî û îmanî û cîhanbînîya bihêz e ku heye. *(( Şêweyên cor bi cor yê hêvîyê di helbestên wî da tête dîtin, ew armancên ku hene mezintîya mirov, parastin û rêza (hurmet) kerametên mirov hêvîdar e û cihana ronî div ê rewşê da dide xuyandin))*[124]

[123]. Kar hurnay , ”*Tizad Dirunî ma*”, tercumey , Mihemmed Ca'fir Mêfa , ntişarat ciht , Tahran 1967 , rûpel 157.
[124]. Ebdella Nasrî ,”*135 Filsey Afrîniş”*, neşir nihizt zinan musilman, 1359 , R 215.

Cîhanek ku hemû mirov bi heq ji mirovtîya xwe agahdarin, ji nî'meta azadî û serbestîye sûdmendin. Ew helbestvanên ku civaka xwe baş dinasin û bi başî agahdarî êş û janên mirovên îro ye, ev mijara mezintirîn xema ramana wan e û heman hokar e ku hinek car reng û bêhna azar û êşa ye û xem û xemsarî û bêhêvîtîyê dide helbestên wan. Ji ber wê ye ku ew helbestvan amancdar e ku her tişt bi berevajîya hêvî û daxwazên wî/wê be û wan nerihet dike. Hebûna hişyarî û agahîya mirovan di nirxên mirovtîya wan wiha li wan dike ku rexneyê lê bigre, bi bawerîya wan mirovên îro xemên jîyanê ji armancên rastî û mirovtîyên xwe bê agah dike, her ji ber wê ye ku asteng û gêj bûye.  Di wê dîtinê da Ebdulla Peşêw helbestvanekî armancdar bû, hinek car dixwast ku ramanên bêdawî û hêvîdar ji bo ew armanca helbestî yên belav ji hiziran dirust bike, ji ber wê ye astengîyên cor bi cor ji bo rêya gihîştina armanca helbestî da dibîne. Her ev astengî lê wiha dike ku rastî hesret û diltengî û hinek car jî bêhêvîtîyê were.

Hêvîya bunye danîye li ser cîhanbînî û ramanên Ebdulla Peşêw ku gelek helbestên Ebdulla Peşêw ramanên wî nîşan dide ji bo cîhana nika û jîyanê ku ew helbestvanekî hêvîdar e û xwedîyê wêrekîyê ye li hemberî bilindî û nizmahîyên jîyanê koll ?nade.  Nikare eşkere bike û direve yan jî hebûna wan bi avayekî red dike bi ew peyvên erênî. Jiyana radest nebûna helbestvan wiha dike bi tenê li hemberî neguncawên jîyana xwe li ser daxwaza wî nîye ku hêvîyê ji destê xwe berde û hemû rojê bi hêvîyên baştir hebe.Di vê helbestê da derdikeve;

*Dostekanim ! Baş bizanin,*

*Dujmnanim! Baş bizanin.*

*Çend bawrim be Zerdeşt û*

*Be Avêsta û be Xwa heye,*

*Hezar hêndeş*

*Bawerim be helkirdinî ala heye!*[125]

---

[125]. *Ebdulla Peşêw , "Pişt le Newa û Rû le  Kirêwe" , R 125.*

Helbestvan bi her bahaneyê dixwaze ku jîyana ji bo kesan wesif bike, ew ji armanca helbestê, jîyana gelekî xweş û tijî hevaltî û yekrengî û azadî û aştî û oqreyî û evînê hêvîdar e.Ji nîşandana vê jîyana armancdar û ji bo têgihandina kesan gelekî xebatê dike.

*Min falçî nîm*

*Kitêb bo kesî nagrimewe*

*Naw lepî kesî naxwênimewe.*

*Keçî lêm rûn e û dezanim*

*Madam to minit xoş dewê*

*Debît be nerme besteyêk*

*Qerecekan...*

*Şewanî zistan detbêjin*

*Debît be dêrre helbestêk*

*Beyanîyan roj detnûsê*

*Ke zerdeperîş dekewê*[126]

Di helbestek din da helbestvan bihêvîye ku evîndara wî vegere, ew hêvîya pêşerojeke zelal e dibêje; ‘’Ku zane evîndara wî li kîderê be jî vedigere ba wî’’. Bendewarî  (çawerrwanî) rêmaneke (çemk) derûnî ye, di vir da em dikarin bi rêya vê rêmanê ve helsengandina rewşa helbestvan bikin û zanibin ku rewşa wî ya derûnî d içi astî da ye, her ji ber wê di vê kopleyê **?** da wî alîyê helbestvan dibînin.

*Çawerêtim*

*Degerêytewe siwênd dexom*

---

[126]. Ebdulla Peşêw ,*"Pişt le Newa û le Rû le Kirêwe"* , R 376 - 377.

*Siwênd dexom degerêytewe.*

*Ger yek yekîş*

*sinûrekan mînrêj biken,*

*Be gulle û tîr*

*Dinyaş dabêj dabêj biken:*

*Hemû rojê*

*Legellî berî beyanî da*

*Bere aso*

*Le dû dedem dezûy nîgam*

*Wa hest dekem*

*To debîte balldarêkî efsaneyî û*

*Beyanîyek dêtewe lam.*

*Degerêtewe siwênd dexom.*

*Siwênd dexom... Degerêytewe*

*Boye eger*

*Bist be bistî asmanîşit lê bitenin*

*Hemû rojê*

*Legellî berîbeyanî da*

*Pencerekan dekemewe,*

*Wa hest dekem,*

*Ke to wekû tûlenemam*

*Beyanîyek*

*Le ber pencerekem derwêy...*

*Be dîwarda helldegerêy...*[127]

**3. 2. Hêvîya Civakî ya Hîm Danîye Li Ser Daxwaza Azadî, Evînê û Hevaltîyê**

Ebdulla Peşêw di daxwazîyên xwe da çavê xwe ji ramanên xwe yên bihêvîbûnê nagre, di hemû deman da yek ji mezintirîn hêvîyên wî bi heqê siruştê û rasteqînîya xwe wateyê (mana) azadî bikin. Wate (yanî) wiha be di ramana wî da ku hîç kesek di çarçoveya jîyanê da asteng nebû be.

Eger dîwarek yan astengîyek hebe hokarên pêwendî û ronakîyê têda hatibin amade kirin heta pêwendîyê digel derve û ew alîyê hebûnê ji hev neqetin, ji ber wê nebûna ronakîyê wate hebûna tarîtîyê ve di rewşeke wiha da tişt zelal nabin û mirov di armanca helbestên wî da ji zanyarîyên rasteqînî fêm nakin, eger dîwarek hebe kurt e û dikare di ser ra derbas bibin.

Di kopleya ji bo Şovînim dibêje; Eger ez jî weke gelên din reklamê bikim ku li Kurdistanek azad dijîm, Kurdistanek ku parçe parçe nekirî be û mafê tu kesî nehatibe pelçiqandin ez ne mirovekî xwebîn û xweperist im.

*Wa Vêtnamî*

*Bo Vêtnamîyan ser dadenîn*

*Felestînî demrin, dejîn*

*Bo her dillope awêkî,*

*Bo her berdêkî Felestîn.*

*Eger minîş dawa bikem*

[127]. Ebdulla Peşêw , "*Pişt le Newa û Rû le Kirêwe* ", R 386-387-388.

*Serbest bijîm, wekû piyaw,*

*Le Kurdistanêkî azad,*

*Nek let let û pêşêlkiraw,*

*Bo şovênî û xoperist im?*

*De pêm billê xoşewîst im,*

*Bo şovênî û xoperist im?* [128]

### 3.3. Reşbînî

Li wê dîtinê da ku ‘Ebdulla Peşêw helbestvanekî armancdar e hinek car ramanên baş û berdewamî ji bo armanca helbestên wî heye. Ji ber wê gelek astengî ji bo gihîştina wî dibîne, her ev astengî wiha li wî dikin ku rastî hesret û diltengîyê were û bêhêvîtîyeke demî (ne berdewamî) bikin ku hinek car nirxandineke ne dadperwerane ji bo helbestên wî têne kirin, herwiha ev rewş rewşên demî ne ku di helbestên ‘Ebdulla Peşêw da xuya dikin. Ew tiştê ku xwe bi başî dihebîne heman bîr û ramanên helbestên wî ne ku hêvîbexş in.

Aşop (endêşe) di taybetmendîya helbestên ‘Ebdulla Peşêw di gotina helbestên wî da aşope ku ramaneke taybet bi xwe dihebîne, di van coreyê helbestan da raman û bîr ji wan hestên demî yên helbestvan tê kirin ku li şûna aşopê amaje bi wan tê kirin. Helbestek wiha nikare nîşandaneke ji bêhêvîtî û bêbendewarîya heta dawîyê bête jimartin, ji yek zêdetir rûyê rastîyaneyên wan coreyên helbestan hebe ji alîyekî rewşa êş, jan û xembarîya helbestvan nîşan didin ke hinek car ji serî heta pê yê helbestvan digrin.

Helbestvan hêvîya xwe ji dest dide (wenda dike) û dilgiran dibe û xwe weke kesên gêj û aware dibîne, bi çavekî reşbînîn li cîhan û ew tiştên têda ne dinêre. Ev coreyên bêhêvîtîyê li pêş ew civaka ne ku zêdetir êş û azarên civakê êş û azarên mirovayetîyê ne, bi şêweyekî tûnd û zelaltir di helbesta ‘’Kose’’ da derdikevin. Ewalîyê reşbînîya helbestvan ku pêwendîyê bi meseleya destwerdana ji derekî ya xak û nîştîmana helbestvan dibîne.

[128]. Ebdulla Peşêw , ”*Pişt le Newa û Rû le Kirêwe* ”, R 264 - 265.

*Hatin, hatin, kose hatin.*

*Hatin, hatin, dergey daxen, kose hatin.*

*Heyaran û meyaran*

*Ya Xwa dakate baran*

*Bo feqîr û hejaran".*

*Kesêk derge le rûy kose nekatewe!*

*Salleha ye*

*Tewnî diro helldebestin.*

*Kosekanî em dinyaye.*

*Sallehaye*

*Derwazey asman daxirawe,*

*Çawman wek pûl*

*Be zerfî reşî ruxsarî*

*Kosekanewe nûsawe.*[129]

Helbestvan hêzên mezin yên cîhanê çiwandîye (şibandîye) ‘’Kose’’ û bawerîya wî jî wiha ye ku ev hêzên mezin welatî wî dagir kirine û soz û ehdên derewîn didin. 'Ebdulla Peşêw herdem di beşek helbestên dîwana xwe da takekesên Kurd li hember ew hemû neêdaletî û dek û desîse yên dagirkeran hişyar dike û şîroveyê ji bo dek û dolabên dagirkeran dike ku takekesên Kurd tu carî bi wan nexapin. Herwiha bi reşbînîyê li pêşeroja welatê xwe dinêre ev jî dîsa ji ber wan dagirkeran e. Eşkere ye ‘’reşbînî’’ yek ji rêmanên derûnî ye, mirov ji ber xirap bûna rewşa derûnî rastî reşbînîyê tê, ji ber wê ev reşbînî ya Peşêw diçe (dikeve) xaneya derûnîyê.

---

[129]. Ebdulla Peşêw ,*"Pişt le Newa û Rû le Kirêwe "*, R 293-294.

Çimkî xirap dîtina pêşerojê gelek car berevajîya wê rast derdikeve, ev jî ji ber wê xebata berdewamî ya gelê wî ye. Her li vî rûyî Peşêw dibêje;

*Salleha ye,*

*salleha ye*

*Be qed espêy nîfokanman,*

*Be qed rişkî tûkeserman.*

*Hewrî bellên bem xake da têdeperê û*

*Dillope baranêk naye.*

*Salleha ye,*

*Salleha ye.*

*Nazanîn kilîlî asman,*

*Le gîrfanî xoman da ye*![130]

Eger em bala xwe bidin ew rêmanên ku di vê malikê da hatine bikaranîn, ji bo zelal dibe ku helbestvan bi hoya xirabî û têkçûna rewşa xwe ya derûnî rastî reşbînîyeke bi wê şêweyê hatîye û hemû tiştan bi reşbînî û şiwêlî (lêllî) dibîne.

Her çiqas hemû soz û ehd baş bin jî ew bi xirapî wan dibîne, herdem li hêvîya hatina baranekê ye ku hemû dil û derûna mirovan ji ew nerehetî yên ku hatîye serê wan paqij bike.

Xirabîya rewşa derûnîya helbestvan bi pîvanekê ye ku kilîla pirsgirêkan jî li ba wî ye, lê ew têkçûn ûpêşokawî ?ya derûnî wiha lê kirîye ku nizane çawa çareser bike û jê rizgar bibe.

Loma bi bawerîya helbestvan demeke dirêje ku serkirdeyên welatan gelek peyman dane gelê welêt lê nikarin bi şêweyekî kirdarî bînin cî, dîsa bi bawerîya helbestvan tenê gelê heman welatî dikarin alîkarîyê ji bo xak û nîştîmanê bidin hev.

[130]. Ebdulla Peşêw ,"*Pişt le Newa û Rû le Kirêwe*" , R 294-295.

Di kopleya? xerîbî da helbestvan balê dikşîne ser zarokên nîştîmanê ku gelekî xembar û reşbînin û ditirsin.

*Keçî giyane!*

*Be çawî xom zor car dîwime*

*Ke minallan*

*Lem şare da xefeti dexon*

*Wekû bêçwe mirawî dên.*[131]

Peşêw di helbesta ‘’min detirsim’’ li ser yara xwe dike û jê ra dibêje; gelekî ditirsim ku xeberek nebaş ji te bigrim  yan dema ku tu tê bîra min hinek rik û bêzarî ji evînê digê te’’.

Helbestvan ji wî tiştî ditirse ku demekê ku vegere evîndara wî guherî be û herwiha bi şêweyekî ew bi xwe jî guherî be ku nikari evîndara xwe qebûl bike.

*Çend detirsim*

*Ke dêmewe*

*Hewallêkî tallit pê bê.*

*Çend detirsim*

*Ke baweşit pêda dekim.*

*Bonî namoyekit lê bê*

*Çend detirsim*

*ke dêmewe*

*Gramerî zimanî çaw,*

*Rênûsî hêmat gorra bê.*

131. Ebdulla Peşêw , *"Pişt le Newa û Rû le Kirêwe"* , R 383.

*Çend detirsim*

*piler germiy pencekanit,*

*Wek be cêm hêşt wa nemabê*

*Le meş zêtir.*

*Çend detirsim kesim hawrrêm,*

*Ke dêmewe,*

*To wek xot bît, min bigorrêm!*[132]

Di helbesta ‘’Tirs’’ da helbestvan amajeyê bi wê dike ku her tişt û her candar ji tiştekî ditirsin, ev jî siruştîya jîyanê ye ku her tişt tirsê li dû xwe tîne. Ew amajeyê bi wê dike; dibe ku di hinava candarên siruştê da şêweyekî tirsê hebe, lê ew tiştê ku helbestvan bi xwe jê ditirse ew e ku li welatekî bimre ne welatê xwe be û gelê wî welatî ji zimanê wî tênegên (fam nekin).

*Minîş zirawm rijawe*

*Detirsim le sere merga*

*Sîyekanim bizrîkênin,*

*Bo tosqallêk heway willat.*

*Detirsim bimnêne xakêk*

*Nemin aşnay bonî ew bim,*

*Ne zimanim ew têy bigat!*[133]

Di kopleya ‘’Xewn’’ da helbestvan şayîşdar e (nîgeran) û ditirse ku eger rakeve (razê, binû, ) evîndar û welatê xwe wenda dike.

---

[132].'Ebdulla Peşêw,”*Hespim Hewre û Rikêfim Çiya”* , R 43-44.
[133].'Ebdulla Peşêw,*Hespim Hewre û Rikêfim Çiya ,* R 78.

Di wêjeya romansîzm da herdem tirsek helbestvanan heye, ev tirsa ji helbestvanan nagere ku bi dilên xwe xewn û xeyalan bikin.

Di vê kopleyê da helbestvan naxwaze gavekê tenê jî rakeve, çimkî xew li ba helbestvan dibe alavek ji bo ji destdana destkeftên helbestvan. Ji ber wê ‘Ebdulla Peşêw jî naxwaze gavekê tenê rakeve, çimkî zane xewna wî dibe hokara ji destdana welat yan jî yara wî, bi hoya wê xewn dibe hokara wendakirina yara wî çimkî her ew bûye hoya ji destdana hemû hevalan.

Her vê tirsa ku bûye hoya ji destdana hevalan bûye hoy ku helbestvan ji xewê hez neke, helbestvan di vir da têgiha tirsê weke rêmana xwe ya serekî ya derûnî datîne. Çimkî tirs heye dibin hoya nearamî û nerehetîya rewşa derûnî, di vir da jî rewşa derûnî ya helbestvan tabloya nearam e û di demeke rewşa xerap da ye.Her weke ‘Ebdulla Peşêw dibêje:

*Xewim nayê*

*Detirsim birrom winit kem.*

*Xewim nayê*

*Rojanman ewaney mawin,*

*Be pencey dest dejmêrdirên.*

*Çend dillope şewnimêkî ber hetawin*

*Detirsim birrom winit kem*

*Xewim nayê.*[134]

### 3.4. Aştî

Cîhanek gelekî ewle û tijî aştî di her serdemê da hêvîya mirovan bû û cîhana îro jî ji ya duhî (diwênê) zêdetir pêwîstî pê heye. Eger ku ev daxwaza di dîtina dîroknivîsan da hêvîyeke hinekî dijwar e, lê di dîtina dînî (ayînî) û mezhebî da mafê gihîştina bi cîhaneke wiha gelekî zehmet nîye.

---

[134] .'Ebdulla Peşêw ,”Pişt le Newa û Rû le Kirêwe” , R 372.

Ji ber wê di demeke kurt da ku dewlet di bin destê pêxember, hekîm û mîran da bû ev daxwaza mirovan hatîye cî.

Her bûyereke ku carekê hatibe ezmûnkirin (tecrube) bi hukmê aqil dûbarekirin yan çend caran dûbarekirina wê bûyerê ne zehmet e. Li vî rûyî ve aştî û dadperwerî ya asayîşa rasteqîne ji bo mirovan di demeke dîrokê da rû bide yan jî mirov dikare bi pîvana binemaya exlaqî û şêwaza zanayî û çêkirin û bi sêbera asûdeyî û aramî ve bi ser xwe da bîne.

Lê bi cî anîna van soz û ehdan pêwîstî bi faktorekê û bi cî anîna van faktorana jî ku têkoşîna pêxember û kesên baş yên li ser bûn, pêwendî bi nasîna vî zevîyî ku ji bo aştî û dadperwerî heye.

Ji ber wê hemû hokarên zilmê ku çavkanîya şer û hingame ya takekes yan gel û dewletan dibe heman astengî ya aştî û dadperwerî yê. Herwiha ji bo nasîna mirovan pêkhateya navekî pêwîste, loma helbestvan di vê helbestê da hêvîya aştî û dadperwerîya hevaltîyê ji bo hemû mirovan dixwaze.

Di vê helbestê da helbestvan aştî çiwandîye kevokekê ku bawerîya wî wa ye ev kevoka li ezmanê welatê wî hew (bi tenê, tenha) bi dengê gule? bifire.

*Xwa dezanê*

*Ballay tifengim xoş nawê!*

*Belam ax! Kotrekey aştî*

*Kirr e wekû şêrebefrîney beyanî.*

*Le ser lûley topî matî westa recib*

*Denûkî xoy*

*Xistote jêr ballekanî,*

*Wek bîstûme.*

*Ew kotire mangirtuwe,*

*Le asmanî willatêkî bê alla da.*

*Be şirîxey tefing nebê,*

*Qet le şeqey ballî nada!*[135]

### 3.5. Bîra (Ramana) Mirinê

Li rojava yekemîn kesê ku ramana mijara mirinê kirîye û dîtinên rojavayîyan li ser mijara mirinê guherî Sigmound Freud bû ku bi nivîsandina gotareke bi navnîşana ‘’Komek Ramanên Guncaw Digel Dema Ceng û Mirinê ’’da *(Thoughts For The Times On War And The Death)* bîrkirin û rewş ji bo kesên weke Martin Heidegger ku ramanên wî yên bûnewerî ji bo mirovan hebû. Bi şêweyekî ku civaka rojava û raman û dîtinên civaka rojavayî ji bo mijara mirinê û bi şêweyekî giştî temamê jîyan û rûyên cor bi cor guherî.

Rojava nikarî bû çavê xwe bi ser mirinê da bigre, di serdema navîn da civaka rojava bi şêwazeke berfireh neçarê kuştin û ji navçûnê bûn, lê digel hatina Rênîsans ev dîtina hate guherîn. Mirovên wê serdemê di salên 1495 ta 1965 bi şêweyekî fêrî ramanên vê serdemê (îroj) hate kirin, kêmî her tiştî bîra (ramana) mirinê dikirin.

Her ev mijara bû hoya wê ku dilpakîya nû temamê ramanên xemê mirovan ji bo destxistina destkeftên mezintir û baştir bûn.

Friedrich Nietzsche (Nîçe) feylesofê sedsala nozdehem yê rojava bi şêweyekî rast û rewan gotîye: *((Ewên ku gel naxwaze bi tu şêweyî ramana mirinê bikin min kêfxeş dikin))*[136]

Cenga wêranker ya duyem ya Cîhanî bû hoya wê ku mirov ji xwe da biçe û wiha bîr bibe (bifikire) ku ew bi xwe hokarê cengê ye û meraqîyê mirinê ye. Ev meraqa jî taybet nîye bi mirovên seretayî (berayî, îlkel) û şikeftan, dîroka huner, wêje û felsefe di serê sedsala bîstan da bi dijwarî rastî guherînê hatin.

---

135. *'Ebdulla Peşêw,*” *Pişt le Newa û Rû le Kirêwe”* , R 270-271.

136. Ên'tî zade Keman û Dîgran *,”(Mirg )micmu'e Mqalat”*,Çapxana antişarat arixnun , tihran ,1388 R 7.

Nivîsên nû yên weke ew romanên taybet bi tawan û çîrokên Sherlock Holmes û Piwaru ?ku mirovên gur, xwînmij û heta dawîyê bi pirranî di nava wêje û hunerê da giringîya wan hebûn. Dewê (tenanet) di felsefeya sedsala nozdehem da jî ji destê nivîskarên weke Friedrich Hegel (Hîgil) û Arthur Schopenhauer (Şopinhawr) da’’mirin’’ ji hemû mijarên din zêdetir xwe nîşan dide.

Sînema û wêje her yek bi şêweyekî şîroveya şêwazên mirinê rê didin (pêşkeş dikin) û hinek car şîroveyê (zelalkirin) ji bo xurtbûna qahremanekî didin di dema mirinê da.

*(( Ev bîrkirina (raman, fikir) heman bîrkirina Socrates û Eflatûn e ku dibêje; mirin armanca mirov ya dawî ye’’.*

*Her ji ber vê Schopenhauer bi berevajîya ramanên Descartes (Dîkart) tevgeryaye ji bo pêşîyê û mirov jî ji bo alîyê jîyanê bi gav avêtin ji bo paşîya (pişta) tiştên tên dîtin (tiştên hest pê tê kirin) ên jîyanê, wate ji bo aştîyê digel mirinê teşwîkê dike.*

*Feylesofên weke Darwîn, Maltus û Hegel ku tirs di mirina xwe da ji pêwendîya Xweda û qûlan da çiwandine (şibandine) ‘’Şivan û Kerî=Şiwan û Mêgel’’ yê.*

*Bûye hoy ku Schopenhauer ramana xwe derbîne ku ‘’ Tu (hîç) kesek di dawîya jîyana xwe da bi hişyarî navbijwanîyê (hakemî) bike û digel xwe rastgo be daxwaz nake ku careke din jîyana xwe bijî’’.*

*Bi vê şêweyê bi hêsanî (nebûn)ê hildibjêre, di dawîyê da jî teşeya (çonyetî) bîrkirin û dîtina rojhilatîyan bi ser rojavayîyan da misoger dike))*[137]Bi vê şêweyê xalek hesta (soz) nû ji bîrkirina mirovan derdikeve, bi hişyarî neguncawa (Paradozicil) diqede (kotayî dêt). Bi vê watayê ku daxwaza ji bo jîyanê bi dûrketina ji azara mirinê diqede.

---

[137].Ên'tî zade Keman û Dîgran ,*’’(Mirg )micmu'e mqalat*”, Çapxanaya antişarat arixnun , tihran 1388 ,R12 .

### 3.6. Mirin

Em dikarin bi du şêwe pênaseya peyva ‘’mirin’’ ê bikin:

**1- Bi wateya zimanevanî:** Mîrin ji ‘’mewt’’ ê pêk tê, herwiha wateya ji jîyanê veqetîn jî dide (merg).

**2-Bi wateya razberî (watayî):** Dawîya jîyana cîhanî (dunyayî).

Di rastî da eger bixwazin tiştekî/tiştekê li dijî wê binasînin divê ku bibêjin; ‘’Ku mirin dawîya jîyan û cîhanê ye’’. Di dîtina felsefî da ‘’mirin’’: cudabûna heta hetayî ya can (ru’h) ji laşê mirov ku bi şêweyekî siruştî yan nesiruştî rû dide.

*(( Dil bi îmana Xweda ku heyamekê wendabûna bîr û ramanana çê dibin ta heyameke kurt li cîhanê bimîne heta gava mirinê, çimkî dema ku mirin digêjê eger ew rêçkeya kum e hilbijartîye dil be û nemire. (... فَلَنُحْيِيَنَّهُ حَيَاةً طَيِّبَةً... ) 97 النحل, eger rêçke dil nebe û nemire, mirina giştî be ( ..... أَمْوَاتٌ غَيْرُ أَحْيَاء )21 النحل ev wataya wê heye))*[138]

Mirin dawîyê li hemû têkoşîn, pêwendî, daxwazî û armancên cîhana mirovan tîne, bi vê pênaseyê ‘’mirin’’ dawîya hemû tiştan e lê di rastî da wate û bi rastî mirin nebûna dawîya jîyanê nîye, belkî ji cîhanê derbasbûn e û gihîştina razberî û jîyana heta hetayî ye.Mirin bi wateya koça ku ji cihekî bo cihekî din tê. Em digêjin cihekî ku ji cihekî bo cihekî din guherkarîyan derbas dikin bi cîgirî digêjinê. Mirov di dawîya ‘’Kevana nizmbûnê’’ ji cîhana aqil bo cîhana maddeyî tê û bi dêmenî? mirinê ‘’Kevana bilindbûnê’’ derbas dibe û li cîhana madde bi razberî li dinêre.Kewate (yanî) di vê dîtinê da em dikarin bibêjin; ‘’Mirin cudabûna nefsêye ji laş *(( Ev can di laş da ye û tevgera can bi şêweya tevgerekê ye ku tevgera min çawa ku bixwazim pênûsê rawestînim yan jî eger bixwazim dilivînim, ji vê tevgerê re tête gotin ‘’veqetandina mirinê’’, ji derbasbûna vê destbiser dagirtinê re jî tête gotin ‘’veqetandina jîyanê))*[139].

---

[138].'În Alqva Hemedanî , Abul alm'alî 'bdalle bin mihimd misyancî , timhîdat ,*“Şirh 'Fîf 'Sran* , çap dwem , antişarat mnuçhir , tihran ,1369 , R 163.

[139]. Çavkanîya navborî (heman çavkanî) , rûpel 152.

Mirin bi dû şêweye: Mirina Asayî û Mirina Hatîye Hilbijartin.

**Yekem: *Mirina Siruştî***

Di Qur'ana Pîroz da bi vê şêweyê behsa wê hatiye kirin*((ecel mismî, di Qur'anê da du cor ecel heye ku ji bo mirovan hatîye danîn, yek ''mirina ji nişkave'' ye ya din jî ''mirina siruştîye))*[140]

Xwedayê Mezin di Qur'ana Pîroz da difermo; (( وَالَّذِينَ هَاجَرُوا فِي سَبِيلِ اللَّهِ ثُمَّ قُتِلُوا أَوْ مَاتُوا لَيَرْزُقَنَّهُمُ اللَّهُ رِزْقًا حَسَنًا وَإِنَّ اللَّهَ لَهُوَ خَيْرُ الرَّازِقِينَ''(( الحج 58

Wate; *(( Ew kesên di rêya Xwedê da koç kirine li dû wê hatibin kuştin yan ewên rastî mirina asayî bûn û li cîhanê nemane Xwedayê Mezin ceza û padaşteke baş dide wan. Ji ber wê Xweda baştirîn raziq e û dilovanê xêr û başîyê ye)).*[141]

Mirina siruştî mirinek e ku hemû mirov taqî dikin (tecrube dikin), ev jî dawîya siruşta cîhanê ye. Xwedayê Mezin bi vê şêweyê di Qur'ana Pîroz da difermo; (( كُلُّ نَفْسٍ ذَائِقَةُ الْمَوْتِ ثُمَّ إِلَيْنَا تُرْجَعُونَ ))

Wate*; ((Hemû kes wê mirinê biçêje (ta'm bike) û paşê jî vedigerin ba me)).*[142]

Herwiha di العمران ( Al- 'Îmran) 185 الانبياء ( Al- Enbiyaa ) 35 العنكبوت ( Al- Enkebût ) 57 da ; di vê coreya mirinê da temamê hêz û hest û beşên laşê mirovan ji kar dikevin û di demeke asayî ya cigirkirî da ji alîyê Xwedayê Mezin ve digêjin dawîya jîyanê.

Lê di mirina ji nişkave da beşên laşê mirovan li jêr bandora hokar (sedem) astengîyên derveyî, pêş gihîştina bi dema siruştî dawîya jîyanê tê.

Di nivîsên cîhanê da ''mirina ji nişkave'' weke ''mirina xerap'' û giştîya hinek gunehan tê zanîn, hinek Xweda ji bo nîşandana hêz û mu'cîzeyan bi gel û hinek kes bi mirina ji nişkave dide mirin.

---

140. Raxb Asifhanî ,Hsîn bin Mhimd , *''Tircme û Tihqîq Mifirdat Alfaz Qrrirn Krîm ''*, tircmey xlam rza xisruy hsînî , antişarat mirtçuy1375, tihran, R 154.
141. Mistafa xrim dil ,*''Tifsîr Nûr* ,Tihran Çapxanaya Ahsan 1379 , R 696.
142. Çavkanîya navborî *(heman çavkanî)* , rûpel 1379 . 846.

Qur’ana Pîroz behsa jîyannameya hinek qewman kirîye ku rastî ‘’mirina ji nişkave’’ hatine, weke ‘’Qewmê Lût’’, ‘’Qewmê Nû’h’’.

**Duyem:** ***Mirina Hatîye Hilbijatrin***

Di fermûdeyan da (‘hadîs) hatîye ((مؤتوا قَبل أَن تَموتوا)).

Wate; ‘’Pêş wê ku dê bimrin, bimrin’’.

Kewate (yanî), pêş wê ku bi neçarîya siruştê ve dê bimrin, mirinê hilbijêrin. Ji ber wê ye di rastî da mirin dûrketîne ji maddîyat û xweşîyên cîhanê û ew kesên li cîhanê ku dev ji cîhanê berdane , di rastî da mirin hilbijartine û bi rastî ehlê Xwedêne.

*(( Di serî da binemaya takekes ewe ku mirina ma’newî ji bo xwe diyar kiribe, eger ev şêweya hate dirustkirin ((فَقَد قامَتْ قيامَتَهُ)) bi ser wî/wê da were qebûlkirin)).*[143]

Mirina yextîyarên heman ji ber derxistina xweşîyên cîhanê û daxwazên nefsê ye. Eger mirov wataya mirina hilbjartin yan cudabûna ji maddîyat û cîhana dosatyetîyê û dûrketina ji gunehan bi rastî têbîgê (fêm bike) dizane ku bi vî karî digêje jîyana rasteqîne.

Ku wiha be mirov heta di siruştê da nemre di rastî da zindî nabe *(( lê mirinek li wî alîyê qalibekî meydanî. Jîyaneke din ya ji bilî şêweyê vê jîyanê dinase (nas dike) ))*[144]

Ew dema ku mirov li cîhanê dijî, divê di zîndana cîhanê da jî xwe bi îmanê û bi başîyê çê bike û ji gunehan dûr bikeve herwiha ji qurbandana nefs û canê xwe dûr bikeve. Ji daxwaz û xwestinên nefsa xwe û ew tiştên nerehetîyê çê dikin dûr bikeve û westandina mirina yextîyarîyê hilbijêre, heta hêdî hêdî jîyana bêdawî û tije xweşî û li cîhaneke din da ezmûn bike.

Di 'îrfan û sofîzma îslamî da ‘’سالك الى الله ‘’ herwiha di dema mirinê û ezmûn kirina mirinê da ye.

---

143. 'În Alqva Himdanî ,”*Timhîdat ”*,R 322.
144. Çavkanîya Navborî, R 320.

Her ji ber wê ye ramana (bîrbûna) mirinê di helbestên ‘Ebdulla Peşêw da ji girîngtirîn berhemên bîrbûnê ne ji rewşa mirovan bo ‘Ebdulla Peşêw gav avêtina rastîyên wê ji bo ramana wan kesên ku mirinê bîr dibin, tevlihevîya mirinê di vê heyamê da ji bîr û heşê ‘Ebdulla Peşêw da tê digre.

Dibe ku bi rêçkeyeke berdewam di helbestên ‘Ebdulla Peşêw da bi heman şêwe behsamirov û jîyana mirovan kirîye û bi berevajî wê jî behsa mirinê jî hatîye kirin. Hinek car naçar bûye van peyvana bike, her gotinek yan her peyvek jîyanê mirin anîye bîra ‘Ebdulla Peşêw û helbestên wî di bin bandorên hemû van tiştana da ne.

Di vê navberê da mirin bi şêwazên cor bi cor bervî rûyê ‘Ebdulla Peşêw hatîye, ew jî azar û êş û tirsa xwe ji hebûna bêdawî li sîbera wê da beyan dike. Dîtinên ‘Ebdulla Peşêw ji bo mirinê yek şêwe nîye û rûyê mirinê di dîtina helbestên wî da rûyekî yeksanî nîye .

'Ebdulla Peşêw çawa sûdê ji jîyanê werdigre ji bo bunye danîna deqeke helbestî, bi wê şêweyê jî sûdê ji mirinê werdigre ji bo heman armancê. Ew mirinê li hemberî xwe û kesên din datîne û bi vê rêyê ve derfetekê dibîne ku heta giringî û bîr û bawerî û hestên xwe yên li hemberî jîyanê di sîbera giranîya mirinê da heye beyan bike.

‘Ebdulla Peşêw nikare bê bîrbûna mirinê û bê qisekirin li ser jîyanê bûyerên pêwendîdar têdaye derbas bike, hemû tiştê jîyanê ji bo helbestvan bê bîrbûnê ji çarenûsa wî nabe binema ji bo hîm danîna deqên helbestê.

Ew nikare bê giringîyê berdewamî bide jîyanê , herwiha jîyanê 'Ebdulla Peşêw agahdarî mirin û dawîya jîyanê kirîye, her ev mijara dibe peyveke destnedana mirinê

*Ewî dinya cê dêllê,*

*Siware û esp taw deda,*

*Zîne cêgey mirdinî*

*Retbirdin û gilanî.*

*Çon bû her wa demênê*

*Le lay dost û dujminî.*

*Mirdin! Madam to her dêy,*

*Rojêkî awa were*

*Xom bo lat berêwe bim.*

*Rojêkî awa were*

*Girrim danemir ka bê*

*Serberz û be pêwe bim*! [145]

Bi vî şêweyî 'Ebdulla Peşêw ji destçûna laş û bûyîna laş weke xwelîyê nizane, belkî ramaneke ji mirinê bilindtir radigihîne. Mirin hebûneke ji bo jîyana serbestyane û dûrketine ji bêdadîyê, herwiha têgîhiştina mirovane ye di jîyanê da.

Di kopleya ‘’Cardanî Merg’’ da ‘Ebdulla Peşêw mirinê ji bo jîyanê dixwaze, ne jîyanê ji bo mirinê. Ev coreya ramanê qencîya mirovên vê serdemê nîşan dide, ku ta radeyekê hevcîhet û hevterîb e digel ramanên ‘arîfane ji mirinê, bi cudahîyekê ku komunîst mirina wan weke azadbûna ji maddîyatê dûr û pêwendîkirina wan jî weke xaliqê xwe zanin.

Di rewşekê da ‘Ebdulla Peşêw mirina xwe weke ji bo serbest jîyana kesên din dizane.

*'Eyamêke*

*Qelemekim xollemêşe û*

*Agirêkim nenûsîwe.*

---

[145].'Ebdulla Peşêw, *Hespim Hewre û Rikêfim Çiya , R 82-83*

*'Eyamêke*

*Le ser befir ....ranekişawim*

*Le ber baran ....ciwanêkim ranemûsîwe!*

*Ewe minim.....Çî dî neçime ber memikan û*

*Berew cêjwanan pê negrim?*

*Ewe minim...Kanîy sîhir*

*Le gerdenêk hellqullêt û giwêy lê negrim?*

*Ew agirey*

*Legell bûnima hellaysa û*

*Satêk hêwr nedebowe.*

*Çon damirka? Key kujawe?*

*Eger şêtî û eoyn tewaw...*

*Edî bo çî bêdengim û*

*Mergî xomim carrnedawe?!*[146]

**3.7.Geşbînî**

Eger em temaşa her berhemên wêjeyî bikin bi taybet jî helbest, ji bo me zelal dibe ku du mijarên giring dûbare dibin, bi watayeke din di hemû berhemên romansîzm da du cemserên giring xuya dibe ku yek ‘’reşbînî’’ û ya din jî ‘’geşbînî’’ ye.

Geşbînî, ew tiştên berçav û zelal yên hêvî û bendewarîya ne ku li ba helbestvan egera (hoya) bidestxistina wan gelekin. Helbestvanên romansîzm dema ku li pêş

[146]. 'Ebdulla Peşêw,’’ *Hespim Hewre û Rikêfim Çiya , R 345-346.*

bûyerekê radiwestîyan renge ew bûyera hinek girane û dixwastin egera nehênanedî **?**yê jê derxin.

Lê helbestvan bi çavekî dûrbîn û geşbînane ve li wê mijarê dinêre, divê bi xewn û xeyal bendewarîya bidestxistina wan be, di gelek rewş da jî bi xewn û xeyalan ve ew bendewarîyên xwe tîne cî.

Herwek 'Ebdulla Peşêw di helbestekê da dibêje:

*Bo baran heye, ger carêk*

*Le nîwey rê terim neka?*

*Bo befîr heye , ger carêk*

*Têy nekewim û sirrim neka?*

*Qûllîy eoyn çon bipêwim.*

*Ger azîzêk*

*carêk destberdarim nebê?*

*Jîyan be çî berawird kem,*

*Eger mirdin*

*nêzîkî kenarim nebê*! [147]

### 3.8. Xurbet

Bi çend şêweyan behsa *((dûrî (xurbet) yê hatiye kirin, lê li rûyê wataya peyvê ve; Dûrî (xurbet), ji peyva ''* axtirab *'' herwiha ew jî ji reha ''* xieb *'' ku tê wateya ''dûrketina ji welêt'' û di ser wê da jî tê wateya ''hibijartina cî )).* [148]

Herwiha wateyeke wê ya din jî li pişt wateya wê ya serekî heye tê wateya *(( hevsergîrîya digel kesekî/keseke nenas'', lê peyva ''axtirab'' a di vê gotinê ''axtirab*

---

[147].'Ebdulla Peşêw, *Hespim Hewre û Rikêfim çiya , R 117-118.*

[148]. Zibîdî , *"Bê nav Nêşan"* Weşanxane nediyare ,Tahran Çapa Dû 1425 .
*rûpel 276- 279.*

*filan'' da ji bo ''kesên ku digel kesên nenas hevsergîrî kirî be'' bikartê. ((Di fermûdekê da hatîye ''axtırabla tıfwa׀''.*

*Wate; hevsergîrîyê (zewac) digel kesên nenas bike.*

*Yan jî bi watayeke din; ji nenasan jina bînin ku zarokên we lawaz (ze'îf) û bêhêz nebin. ))*[149]

Dûrî ew dûrketina mirov e ji ew kesên lê ji dayik bûne û li rûyê can û hestên civakî digel hev di pêwendîyê da bû ye.

Wiha pê diçe ku ji wê demê ve mirov li rêçkeya armancên xwe ve gavê davêje û corek ji hestên xerîb dinirxîne, di vir da em dibînin ku di wêjeya mirov bi van hestane ve girêdayî ne.

Peyva ''nostaljî'' peyveke firansî ye ku ji du pêkhateyên yonanî tê wateya ''veger''ê.

''Algos'' a yonanî jî tê wateya ''jan û azar'' ê. Pênaseya vê peyvê di ferhengan da bi vî şêweyê ye; xembarî û bêzarîya cî bi hoya dûrîya ji welatê dayikê û azara welêt xemek e bi hoya daxwazîya dîtina nîştîmanê çê dibe.

Di zimanê farisî da ev peyva ; di pirranîya demê da bi xema xurbet û hesta xerîbî (Homesickness) û hewesa raborî ye. Ji ''axtirab'' a 'erebî ketîye farisî.

Axtirab; dîmenek yan tişteke ku bi rêmaneke taybet nehatîye dîyarkirin, ji bilî ew demên tirs, bêbiryarî û nearamîyê di rewşa sîyasî, civakî û aborîya civakê da zêde dibe.

*(( Ev dîmen dikare bi navnîşana mijareke serekî ji nivîsên wêjeyî û vekolînên civakî û lêkolînên felsefî da derkeve))*[150]

Bi berevajîya mijara ''axtirab'' ê herwiha çarçoveyeke diyarkirî ya vê boçûnê (ramanê) tuneye.*((Wateya wê bêgahdarîya bikaranîna ji mijarên cor bi cor guherîn*

---

[149]. Abin Mintevir , *Bê Nav Nêşan 1408 , çapa dehem , rûpel 32-33.*
[150]. Zibîdî ,*''Bê nav Nêşan''* weşanxane nediyare ,*Tahran Çapa dû1979 , rûpel 131.*

*bi ser da hatîye ku cudahîya wê heye digel wateya wê ya serekî, bûye hoya dirustbûna şîrovekirina cor bi corên vê mijarê))* [151]

Helbestên ‘Ebdulla Peşêw di rastî da azarê mirovên li temamê cîhanê da derxistîye lê dîsa coş û azarên welêt dev ji wan bernade. Evîna ji bo nîştîmanê girîngitirîn û ciwantirîn daxwaza her helbestvanî ye ji bo hîm danîna deqên helbestê, çimkî gelê welatê helbestvan hevzimanê helbestvanin û ji kesên din baştir hest bi peyam û peyvên helbestvan dikin.

Li rûyekî din bi soz dayîna civakî ve hatîye girêdan, nikari be xwe ji tiştekî derbas bike ku helbestvan rû bi rûyê wî/wê tiştî/tiştê dibe. Helbestvan ji bo gel pênaseya welatekî diku têda hatîye cîhanê û mezin bûye û digel dîrok, çand, qewm, sîyaset û şûnewarîyê bilind bûye ku xwe pê girtîye.

'Ebdulla Peşêw serdana welatên din kirîye lê herdem evîndarîya welêt di dilê wî da bû, bi dîtina wî divê di serî da xwedî welat be ta ku dawîyê cîhanê weke welêt bibîne.Li ser xurbetê ‘Ebdulla Peşêw dibêje:

*Ey daye giyan!*

*Le yademe ke minall bûm!*

*Eşqî tamî tift û tall bûm.*

*Gillim dexward*

*Qurrim decuy,*

*Toş zilleyekit lê dedam*

*Hemût pêtwr firrê dedam*

*Ey daye giyan!*

*Êsta gewrem û minall nîm,*

*Eşqî tamî nift û tall nîm.*

---

[151]. Eltusî , *”Bê nav Nêşan”* weşanxane nediyare *,Tahran Çapa deyem 1979 , rûpel 13 .*

*Ke çî eger em careşyan*

*Rêm bikewêtewe bêrkot*

*Lêşim bidey.*

*Lêşim heram key şîrî xot,*

*Min be teşîyekey minallî derêsmewe*

*Dar, berd, gill, qurr...*

*Çîm bête rê deylêsimewe.* [152]

Pirranîya helbestên ‘Ebdulla Peşêw kûrahîya coreke xurbeta sîyasî ne, xurbeta sîyasî dema ku takekes yan jî çend kes hest bi mafên xwe bikin ku di welatekî da hatîye xwarin dirust dibe, herwiha paşê jî dema ku karbidest û hakimên hukumeta wî welatî wan dersînor dike û digihêjin alîyê xwe ku bi şêweyekî bibêjin temamê vê nîştîmanê ya wan e.

Ev coreya xerîbîyê dibe hoya paşkêşa (bi şûn da gav avêtin) takekesan, wekemînak bêagahbûna ji çarenûsa welêt û beşdarî nekirin ya di pêkhateyên welêt da.

Di encamê da ev paşkêşî dibin hoy ku takekes biçin welatên derve ku ji bo herdem navê welêt di dilê xwe da ji bîr bikin.

Helbestên wî ku ji bo xwe û dûrîya welêt nivîsandîye ciwantirîn helbeste wek:

*Eger em care bêmewe*

*Beyanîyan,*

*Wek berxolleyekî sawa.*

*Le naw qersîlî parawa*

*Til dexom û*

---

[152]. Ebdulla Peşêw ,*” pişt le Newa û Rû le kirêwe” , R 363-364*

*Giyayekî tift... Têrtêr decûm,*

*Ta kift debim,*

*Pê û belekim*

*Le şewnimî sard helldesûm!*[153]

Di vê kople helbesta ciwan da helbestvan wiha xwe nîşan dide; eger careke din vegere nîştîmana xwe temamê hêvîyên xwe wê bîne cî, ji her kanîyekê wê qurtek (gulmek) avê vexwe ta ku kanîyên welêt dibin dayika wî, Di her şikeftê da wê şevekê bimîne ta ku bike mala xwe:

*Eger em care bêmewe*

*Le goymemkî her kanîyek*

*Qume awêk dexomewe*

*Giştîyan dekem be dayikî xom.*

*Le her eşkewtêka şewêk*

*Ser be gaşeberdêk dekem*

*Giştîyan dekem be lankî xom*. [154]

Di kopleya ‘’Futbol’’ da helbestvan careke din hewar dike ku welatê wî ji ber dagirker û bêganeyan giriftar e, bûye qerf (geltecarî) di devê hêzên mezin da (dewletên dagirker).Di vê kopleya qerfok da helbestvan behsa lîstoka topa pê (futbol) dike ku du taxim (yane) dilîzin yek Koşka Kremlîn (Rûsya) yê din jî Koşka Spî (Emrîka), lê topa wan serê Gelê Kurd e û tora golê jî (qele) Kurdistan e.

*Ajansekanî dengûbas rayangeyand:*

*Yarîyekî futboll dekrê,*

*Dû tîpeke: Krêmil û Koşkî Spî.*

---

153. Ebdulla Peşêw *,”Pişt le Newa û Rû le kirêwe” , R 365.*
154. Ebdulla Peşêw*, ”Pişt le Newa û Rû le Kirêwe” , R 395.*

*Top serî: Kurd,*

*Gol : Kurdistan.*

*Temaşaker: Dinyay kirrî wek gorristan.*[155]

### 3.9. Azar û Renc (pîkol)

Mirov di seretayî ya bûyîna xwe ya li cîhana ducemserî da hest bi azar û zehmetkêşîyê kirîye. Ew ji yekemîn tawanê mirov ta weke îro bi hevdemî têgihîştina azar û renc dest û yakeya ev derd û azarî ji mirovekî/mirovekê bo yekî/yeka din û civakekê bo civakeke din têgihîştina cor bi cor bi dû xwe da tîne.Bi hevdemî dikare têgihîştina hevbeş di navbera gelên cor bi cor da bi dû xwe da bîne. Helbestvan û nivîskar ji zûda ve (mêj da) nûnerê ferheng, çand û bawerîya gel in.Ji wî cîhî (şûn) ve ku helbest bi coreke ji coreyan pêwendî bi hestê mirovan ve heye û ev hesta jî beşek ji laşê helbestvan li xwe digre û nabe paşguh bête kirin. Di vê navberê da helbestvan û nivîskar hene ku gelek terkîz li ser vê mijarê û hinek mijarên din jî kirine.

Hinek ji wan helbestvan û nûser ketine jê bandora romansîzma rojavayî û gelekî beşên helbestên xwe li ser vê rêbazê danîne (diyar kirine), ev nivîsa pêdaçûnekê bi rûyên renc û azarê da li du helbestvanên vê rêbazê dike.

‘Ebdulla Peşêw di dîrok û çanda wêjeya kurdî da kesekî taybet û bandordar e û herdem dimîne, Peşêw helbestvanê ciwantirîn, zîndîtirîn, şadtirîn û evîndartirînê vê serdemê ye. Li pişt helbestên sîyasî û civakî da wêneyekî bêhempa ji êş û azarû zehmetkêşîyên mirovên vê serdemê nîşan dide.Wî bi êş û azarên civakê ve xwe di civakê da taybet kirîye ji bo pirsgirêkên herdemî yên mirovan ku dem û gavên wan niye, helbestvan ji hinava civakê ve ji azar û bêdadîya civakê bê tevger nîye û herdem digel guherînên jîyana civakî gavan davêje.Wî di dema hejarîya wêjeyî da û di destsergirtina aşopê (xeyal) da ku di pirranîya demê da li ser ‘’tenahîya rût û daxwazên rût’’ qise dikir û rengekî gelekî xweş da helbest û helbestvanan û di xizmeta gel û nîşandana xemû azarên gel û bêdadî û ji rêda ketina civakê da şer û yekdestî karê desthelat bikar anîye.

155. Ebdulla Peşêw *, "pişt le Newa û Rû le kirêwe" ,* R 338.

‘Ebdulla Peşêw bi dûrketina ji rûyê pir û payendeya helbestên xwe, helbestên wî bi kûrbûn û bi girîyên digel can û ruhê civakê û şerkirina li dijî zilm û sîtemê û bi taybetî di rewşa bêhêvîtîya welatê xwe da xizmeta şerê ji bo bidestxistina azadîya mirovan û parastina armancên mirovayetî dike. Bi pîvanekê ; şerê civakî li dijî zilm û sitem û bêdadîyê mînakên berçav yên helbestên wî ne.

Peşêw di ser ew rewşa bêhêvîtîya derdorê dikari bû hêdî hêdî bi bêhneke dirêj dengê bergirtina (parastina) xwe ya hevdemî û hevarasteyê digell gêncan û lehengîya mirovên bihêz yên şerê dema xwe bi vê şêweyê der bibe (bide xuyandin).Ev bandorên civakî hinek car derketina hêrsbûna li dijî ew kesên ku bûne hokarên bêdadî ku di helbestên wî da hene.

*Bêşkeyekî lasûtawî ... Tenya cêmaw*

*Be kull daye pirrmey giryan.*

*Bo kanîyek girrûgallî*

*Ta hetayê xefekiraw.*

*Êstaş degêrrnewe û dellên:*

*Lew kate da*

*Zewî girya,*

*Asman girya,*

*Încîl girya,*

*Qur’an girya,*

*Girya....girya..*

*Hemû şitêk bêdeng girya.*

*Tenya le naw minalldanî afretêka*

*Giyanêkî niwê çawî pişkût,*

*Nîgay gêrra û le pirrêka.*

*Le naw mişkîy diway dozexa*

*Trûskayî rabûnêkî tazey pêka.*[156]

Zilm û nedadperwerî bînî (dîtin) renc û azarên mirovayetî pirsgirêka hemû demên ‘Ebdula Peşêw e. Herdemê mirovên ji ber bêdadperweran ji rê da ketine bîr dibe (difikire) ku tenê ji bo xem û zehmetî û janê li jîyanê ne.

**Pêkhateya Azar û Renc Di Pergala Bîrê Da**

Ji wê dema ku mirov nigê xwe li ser vê rojgerana xakî (hesarey xakî) danîyê, xem û azar digel xwe anîye û derbas kirîye. Di jîyana mirov da renc fermaneke ku nabe înkara wê bêtekirin.

*((Mirov ew tiştê ku dibe hoya rev û dûrketina ji derd û renc bibire, renc dike rastîyeke ku nabe jê bireve. Ji vê ramanê ve ku bîrmend û feylesof bi taybetî mezinên dîn bi gera li dû rastî pêkhateya azar û renc û hokar û rêyên dûrketina ji wan giringî danê))*[157]

Wekemînak ew helbestvanên ku hatine nav van mijarana cihekî wan yê mezin heye di peyvên derd û renc û bandorên wan da, pêwendîya wê bi mirovan cihê destnîşankirinê ye û ‘Ebdulla Peşêw yek ji wan helbestvanan e.

Wî di berhemên xwe da behsa vê mijarê kirîye, bi destnîşankirina ramana mirovên klasîk yê vê serdemê di derbarê azar û renc e ew mijarên bi coşa van hokarana zane ev tiştê ku di ramana ‘Ebdulla Peşêw cihê destnîşankirinê ye.

Yeksanî (wekhevî) û cîhanîbûna helbestên wî ew e ku hemû tiştên taybet bi mirovan li xwe digire, di dîtîna wî da pirranîya gel bi hoya bêpar bûna ji mafê mirovan alozîyên fikrî û rewan yê mirovên vê serdemê li hemberî ev derhawuyiştane ye?Her çiqas ku hebûna mirov û amadebûna wan di vê cîhanê da bi xwe derdeke ku

---

[156]. Ebdulla Peşêw , *"pişt le Newa û Rû le kirêwe" , R 277-278.*

[157].Mistefa Gricî ,"*Hirke rae Drist aw Birdist bu"* , pjuhişgae 'lum alinsanî û mgal'at actma'î chad danişgahî, tihran R 87.

ji seretaya hebûna mirov heta nika heye.Di helbesta ‘’Newroza 1979’’ da ew alîyê azar û xema helbestvan em di nebûna ‘’Kurdistanek Azad’’ da dibînin.

*Emsal bê çiya newroz nakem.*

*Bê bonî giya newroz nakem.*

*Newroz nakem*

*Bê billêsey sûrî agir.*

*Newroz nakem*

*Ger reşbellek toz nekat û*

*Be xom nebime serçopîgir.*[158]

'Ebdulla Peşêw helbestvaneke ku hest bi azarên civakê dike(êş û janên civakê hîs dike), ew helbestvanekî civakî ye wek beşek ji laşê xwe hest bi pirsgirêkên civakê dike

*Le çawî to da cengey behar e,*

*Le çawî min da çiley zistan e.*

*Le zarî to da xoşî lêwrêj e,*

*Le zarî min da xem ta çokane.*

*Nîwem le tek to*

*Wekû xollemêş sirr û mirduwe.*

*Nîwekey tirim*

*Lay şoxêkî dî girrî girtuwe.*[159]

---

[158]. Ebdullla Peşêw ,”*Pişt Le Newa  û Le Rû  Krêwe”* , rûpel 458.

[159]. Ebdulla Peşêw, ”*Hespim Hewre û Rikêfim Çîya”*, rûpel 90.

Azar û rencên ‘Ebdulla Peşêw ku hinek car helbestvan nerihet dike, sîbera xem û azar bask li ser helbestên wî da vedike, azarên îroja civaka mirovayetîyê ji ber têgihîştina hele (çewt) teng bûye.

Ramana ‘emrê wê kêm e ji ber ji hev fêmnekirina xwe mezin zanîn, xwebînî û nefretê ye.Bi dîtina Surn Girkgur, *(( dema ku jîyana mirovanî ya exlaqî armancdar dibe mirov ji vê qonaxê ve êdî bi dû çêj wergirtinê nakeve. Belkî bi dû çêbûna armancên exlaqên xwe dikeve, çi takekes yan jî bi civakî be û mezinbûn û mezinayî ya civakî weke daxwaza ‘edaletê ye.Jimara armanca mirovên exlaqî ji hev cuda ne, dibe ku tenê yek armanca wan hebe yan jî zêdetir. Daxwaza azadî, bilindbûn û dadperwerîyê…))*[160].(160).

Mirovên exlaqî û dînî (ayînî) ji blî azar û janên mirovên asayî êşên wan yên din jî hene, bi bawerîya vê bîrdozê (teorî) giringtirîn azar û jana mirovên exlaqî negihîştine çêbûna armancên exlaqî.

Bi bawerîya Girgurr, pêkhateya cîhana siruşt bi berevajîya jîyana kesan in ku dixwastin bi exlaqî bijîn. *((Cîhan siruşt digel ger û şêweyê exlaqî niye, bi ramaneke din ew mirovên ku jîyana exlaqî hilbijartine jîyaneke giran û zehmet dixwazin wate jîyaneke hêsan naxwazin. Mirovên exlaqî bi dîtina bêhêvîbûn ji kiryara kirina armancên exlaqî li cîhana derve bi kiryara kirina armancên exlaqî yên di hinava xwe da eger civaka derve ji bo wan nêguherîn lê bi hêsanî cîhana navî (hinavî) ji bo wan tê guherîn. Du şêweyê serekî yên mirovên exlaqî heye; aramî û xweragirî (sebir) û nirxê aramîyê hinekî din zêde ye ji ber wê li hemberî jan û zehmetan bi şêweyê xweragirane aramîyê digre. ))*[161]‘Ebdulla Peşêw jî weke mirovên exlaqî armancdar e û ji ber vê hôyê jî azar û rencên xwe taybet kirîye bi xwe, çêbûna wê armanca mirovên exlaqî ji bo hemû mirovan hêvîxwaz e.

---

[160]. Gircî, Mistefa ,”*Hir ke ra Dirdist aw birdist bu”,* tihran: pjuhişgae 'lum ansanî û mgal'at actma'î chad danişgahî , 1388, R 35.

[161]. Gircî, Mistefa,”*Hir ke ra Dirdist aw birdist bu”*, tihran: pjuhişgae 'lum ansanî û mgal'at actma'î chad danişgahî , 1388, R 35.

Ew ji wê xeyidîye ku mirovên vê serdemê agahdarî kerametên mirovayetî û nirxên rastî yên xwe niye û ji armanca rasteqîne ya dirustbûn û jîyanê dûr ketine, helbestvan ji van pirsgirêkana têdigê (fêm dike).

Têgihîştina van mijarana ji bo helbestvanan azarbexş in, ew dizaninku mirov di xefletê da ne û rastî alozîyê hatine. Baştirîn alîkarî ji bo mirovan agahdarkirina wan e ku ; ji kerametên wan xeflet û bêagahîya mirovên vê serdemê wiha li helbestvan dike ku rexneyê li wan bike.

*Ta çiray ême nesûtê,*

*Êwe hergîz rûnakayî*

*Nabînin be çawî xotan.*

*Ta ême dîl û koyle bîn,*

*Her kot û nîr,*

*Toq û zincîr dekeyn botan!*

*Qirrman deken?*

*Qurrtan be ser!*

*Ger bişmirîn*

*Tenya dîlî dedorrênîn,*

*Çi heye le dîlî talltir?*

*Ger bişmirîn her serkewtûyn,*

*Kiwa le koyley şehîd zalltir?*[162]

### 3.10. Evîn ('Eşq)

Di helbestên Peşêw da car caran em rastî ‘’dilketî (me’şûq)’’ tên ku hêmaya asûdeyî ye ji bo helbestvan, ew digel wê da behsa hemû azar, têhelçûn, xeyal,

[162].'Ebdulla Peşêw,”*Hespim Hewre û Rikêfim Çîya*”, rûpel 97_98.

armanc û biryar û ramanên jîyana xwe dike, wate tiştekî veşartî di navbera wan da tuneye.

Demekê ku bi terkîzkirinê ji bo pêşhateyên çav û heşê xwe û gelê xwe dixebite, dixwaze wê jî digel xwe da divê rêyê da bike hevrê lê dilketîya wî di bazneya hilbijartina xwe da tengav nake.

Dilketîya ‘Ebdulla Peşêw di pirranîya demê da bersivdana pirsgirêkan e ku herwiha helbestvan dixwaze tirsan ji ramana dilketîya xwe dûr bixe, ku wiha bêhêvî û bêbendewar be dixwaze cîhaneke ciwantir di ramana wê da çê bike.

Ji bilî van jî dilketîya xwe ji nebaşîyên ser rê hene biparêze û agahdar bike ku yek caran ev dilketîya wî bi bêçareyî ji destê wî çûye, ku çîrokeke Xwedayê Mezin heye lê helbestvan naçar e vê çîrokê bi dawî bike heta ku asûde be bi vî alî ve ku dilketîya xwe di xeyala xwe da dimirîne.

Dilketîyek (hezkirî) ku di helbestên Peşêw da gelekî qure û înkare û  li ser heş û mezinîya helbestvan da veniştîye. Digel wê jî evîn di helbestên wî da nunerê hezkirî ya zemînî ye, lê helbestvan digel vê dilketîyê behsa azadî, mezinî, nefs û kerametên mirovayetîyê dike û di dawîyê da jî bêhna mirov di vê cîhanê da bihêzeke xurt dixwaze.

'Ebdulla Peşêw di evîndarîyê da gelekî nazik bû, di pêwendîyeke tûnd da û di bêhnên di navbera evîndar ku xwe ye û hezkirîyek ku ev evîna bi temamî tevlihev bûye eşkere dike.

Lê di vê mijarê da gelekî kêm ji bazin û sînorê zevî diçe derê, hemû demê dixebite û li ber xwe dide ku şûna nigê (pîyê) hezkirîya xwe li vê cîhanê da bibîne. Peşêw gelekî kêm di cîhana evînê da gihîştîye çêja (ta’ma) sur al û asmanîyewe,?hîn zêdetir bêhna hezkirîya xwe di riwekên derdorê da dibîne.

Peşêw hinek car bi naçarî xwe ji vê hezkirîyê dûr dixe, xwe wiha dike ku rastî azara wîjdana wê dike.

Ev rewşana xwe li ser daxwaza helbestvan ji hezkirîya xwe û bêhêvîtî ji ber cudahî yên jîyana giran helbestvan e, wata eger rewşeke aramtir ji bo helbestvan çê bûba; şûn (cî) guhastin, şer, pêrew (parîzrawbûn) û tirs lê rast tê û bi vê şêweyê jî naçare ku ji hezkirîya xwe bireve û hezkirîya wî ji xeyala wî nediçû.

Her weke di helbesta wî ya bi navnîşana ‘’Bo Kiçî Bilind’’ da ji ber dûrketina hezkirîya xwe ji serî heta binî xemên xwe nîşanî me dide. ‘Ebdulla Peşêw di helbesta xwe da agahîya wî ji hebûneke taybet û dil û zaneya ji bo zarokan heye.

Cîhan û pirsgirêkên wê keristeyên gelek başin ji bo helbestên wî bi taybetî zarok, di pirranîya şûnan da mijar û raman, xeyal û daxwazên xwe bi zimanê zarokan yan bi meşxûlbûna bi cîhan û pirsgirêkên wê ve dihewîne.

Helbestên Peşêw bi sînorên cografî nayên sinûrdarkirin, ramaneke wî ya gerîde (gerokî) û fireh heye. Ev raman di helbestên vî helbestvanî da wiha hatine berçav ku lehengên cîhanî yên hemû gelan bi çalakî amadebûna wan heye.

Wî berdewam ji şer û aşopên (endêşe) wan sûd wergirtîye û ji ewên hezkirîye behsa wan kirîye, wî helbestek ji bo Martîn Luther King şervanê reşik yê Emerîkî gotîye bi navnîşana ‘’Martînê Mirov’’.

Behsa wî kirîye bi vê rewşê jî her gelê xwe dihizirî, di cîhêkî da dibêje; ‘’Eger jîyan bi rastî rê bida min, minê di helbestên xwe da bi xeyaleke asûde behsa jin û ciwanîya wê bikira. Lê rastîya wê ewe ku ez zarokê bêbexttirînê gelê cîhanê me’’.

Peşêw ji şîyanên keşifnekirî yên ziman û wêjeya kurdî bi qasî têgihên cor bi cor sûd jê wergirtîye, ji bîr û ramanên metelok û efsane yên kurdî gelekî sûd wergirtîye. Peşêw ji helbestên cîhanî xeyal wergirtîye lê ji piştîvanîya (destek) çanda kurdî bêagah nebû, belkî bi werçerxan û çêbûna mijara nû helbesta kurdî ya vê serdemê xurttir û ciwantir kir ta ku nêzikî helbestên cîhanî bike.

Lehengên helbestên Peşêw hinek car beloq (zeq) dibin ku dibêje helbestên çîrokekê ne ku bi têgih û ziman û forma helbestyane beyan kirîne (hatine beyankirin). Beyankirin di helbestên Peşêw dataybete bi keşeke (pîvan) helbestî behskirina ew alîyana ku ji wêjeya çîrokî hatîye derê biteknîk û forma helbestvanî tevlihev bûye û bûye sînorê helbestî.

Wata beyankirin di çarçeweya wêneyên helbestyane da, remz (sembol), nêrîn, îtîraz, şubhandûn bûyte şuynî ?watayî, beyankirin û derfeta derketina wê dît. Hinek car ev alî di ramanên helbestvan da li cîhana xeyalê çê dibe û çîrokên derhawêştey van ramanên derûnî dûbare dibin.

Peşêw di pirranîya helbestên xwe da bi wêneyekî dîtbarî behsa navnîşan, şûna pêşanîyê, bûyer, pirsgirêk û rewşa hizrî ya helbestên xwe kirîye. Bi şêweyekî ku bi xwendina van helbestana wek wiha ye ku perdeya sînoran wêda bike û herwek helbestvan derhênerê şanoyekê be ku bi peyvên xwe nimayîşekê tîne ser ekranê, ekranek ku ramana xwendevanan e û dîyalog beşek berçav yê helbestên Peşêw li xwe digre.

Ew girîngî bi pirranî bi derxistina aşop û ew mijarên ku di hinava wî da mane bi rêya dîyalogê ku digel kesên din da hene, di helbestên Peşêw da hinek car zimanê sînemayê xuya dibe. Helbestvan wek her derhêneran rastîyan bi hevdû re girê dide, wan di yek kesayetî da bi nimayîşê derdixe hemberî heman xwendevanan.

Helbestên wî wata di dilê xwendevanan da çêkirîye ku dema xwendevan bangî (gazî) wan dike ev wênana wek planeke sînemayê di ramana xwe da wêne dike û bi heve montaj dike.

Wekemînak di helbesteke bi navnîşana ‘’Hingame’’ da topbaranê bi şêweyê dirust bi wêneyê fîlmekî wêne kirîye, Ew e ku kesekî serê wî tevîhev bûyî di nava bombardumanekê da ye û nizane di vê rewşê da kîjan ‘ezîzên xwe rizgar bike.

Yek ji wan wêneyên bi şêweya sînemayî yê helbestên vî helbestvanî, agah jê bûna zêde pêwîst bi veqetandina rastîyên heşa hilnegir in, lê ev rastîyên heşa hilnegir zêdetir nêzikî sînemayê ne.

Di rastî da ev helbestvan bi mînakeke derhêner pirranîya çavpêketinên xwe ji kesên xeyalî ku rastî wan hatîye bi ziman û wênekirinê hiltîne.

Peşêw evîn bi mirov û xak û nîştimana xwe li du kefên (paye) mêzînê da danîye, her dul i ew alîyê şevê da di hesta helbestên xwe da taqî kirîye (ceribandîye). *(( Peşêw helbestvanekî rastgo û li jêr fermana gelê xwe da ye û rêzê dide hemberê xwe, ew hemû demê li hember ev rewşa nika di şer da ye ku heta baştir bike))*[163]*((Peşêw dîtin û ramaneke rastî ya psîkolojîk, pirsgirêkên canî (ru'hî), evîn û şerkirinê tevlîhev kirîye û materyalên helbestên xwe ji wan wergirtîye))*[164]*((Helbestên helbestvan tijî (tije) ne ji wêneyên mijarên zelal û eşkere, wek evîn, dûrî, azadî, ceng, daxwaza dadperwerî û çirûskên muzîkên ji bîr çûne yên siruşta pak ya mirov e))*[165]

Zimanê helbestên Peşêw û raborîya wî tijîye ji tirs, coş û şikandinê, ew sûdê ji vê coreya zimên werdigre û çi tiştekî xerap û dagirkerî hebe ji bo mirovan li djî wan radiweste. 'Ebdulla Peşêw di helbestên xwe da behsa renc û bêpar mayîna gelê xwe dike, ji ber wê ye ku helbestên wî weke sozdana gelê wî ye.

Taybetmendîya serekî ya berhemên wî ewe ku; hem çîna (sinif) xwendevan û helbestxan û hem jî kesên asayî yên civakê bi yek astê çêjê ji helbestên wî werdigrin, ji berk u xwerûka nerihetî û azarên wa ne.

Peşêw ji herkes û her tiştî  zêdetir ji serdest û serdarên xayin yê gelê xwe hêrs dibe, gelekî hêrs dibe ji ber wê hinek car serkêşîyên wî çê dibin û helbestên wî digêjin sînorê propagandayê wekemînak dixwaze çavê çîna jêr ya civakê veke û wan hişyar bike.

*Xelk mêjûyekî heye,*

*Ême dû mêjûman heye.*

*Hemû dunya*

*Yek serkirdey lê bela ye,*

---

163.Kameran Cewherî "*Hellweda,Peşêw Le Nêwan 'Eşq û Nîştman da"*, Kovara Mehabad hawlêr, jimare 131-132 sala 2012.

164. Nasir Babaxanî, "*Hewtenamey Peyamî " Kurdistan*, jimare 29,  13 Pûşpera 1385 a Koçî.

165. Marif Xeznedar, "*Bitî Şikaw (Pûtê Şikyayî)*", Kerkûk, 1968, Pêşekî Çapa Yekem.R 22

*Ême le wîş dû man heye. !*[166]

Belkî ev helbesta sade zêdetir propagandaya li dijî şerê mal wêranker yê navxweyî û birakujî ye, ku xwe jî helbestek Komeleya Şêrpencey Birakujî ye, di sala 1994 an da diçe Hewlêrê û rewşa wê ya xirap dibîne behsa vê mijarê dike.

*Bawer biken,*

*Her çî deyken bo ême ye!*

*Her çî deylên bo ême ye!*

*Her bo ewey*

*Lem azare rizgarman bê û*

*Xoşawî şehadet firrkeyn,*

*Her bo ewey*

*Xwên wekû nan giran nebê û*

*Hemû cêyekî lê pirr keyn:*

*Yekêk dênin qirrman bika.*

*Eger nehat?*

*Fêrman deken yektir qirr keyn!*[167]

### 3.11. Şerim

Şermkirin hesteke berbelav ya binçîneya jîyana mirov e di seranserê cîhanê da, hokareke ji bo ku mirov bikari be xwe digel binema û rêbazên civakê biguncîne. Bi şêweyekî giştî şerm ji hestkirina neguncana hestek din e, peyvek, tevgerek, şêweyek yan ma'meleyek e, digel derdor û civakê da şermkirin vetîreyeke psîkolojîk e û bi rêjeyekê di hinav, derûn û laşê hemû mirovan da heye.

---

[166]. Peşêw, "*Hespim Hewre û Rikêfim Çîya"*,R 444
[167]. 'Ebdulla Peşêw, "*Hespim Hewre û Rikêfim Çîya"*, R l440_441.

Lê rêjeya şermkirinê li ba herkesî cuda ye û diguhere, eger rêjeya şermkirina kesan kêm be ev vetîreyeke ku di hebûna hemû mirovan da hest bi wê tê kirin û tiştekî asayî ye. Lê eger rêjeya şermkirinê zêde be evtiştekî asayî nîye, kewate (yanî) dikeve rewşeke derûnî û diçe nava şêweyeke ji tirsê.

*((Şerm li rûyê derûnîyê ve, şêweyeke ji şêweyên tirsê))*[168]Şerm wek vetîreyeke (diyarde) derûnî gelek car dibe hoya astengîyeke alozî ya derûnî, di hizr û bîra hinek kesan da gelek car nikare derbas bibe. Weke vetîreyekê hemû tiştên ciwan û xweş li ser xwe dadixe (qapat dike) û xwe dixe rewşekê ku dûr be ji tevbûn û çûyina nav gel û wiha xwe derdixe ku kêm yan heta rêjeyekê ji kesên asayî kêmtir e.Tirs û şerm wek du vetîreyên tirsnak pabend bin (girêdayî) bi hinava kesayetîyê ve, eger ev her du vetîre ji rewşa xwe ya asayî wêda kir, ew dibe mirovekî netendurist ku bandorê li çêbûna kesayetîyê dike.Şermkirin, digel tevger, tevhevbûn û gengeşîkirina bi kesên derdorê ra rû dide, lê tirs di rewşeke tenyayî (tenêbûn) û bêtevhevbûnê da gelek car bandorê li mirovan dike.*(( Şerm û coşa civakî du têgihên ku bi hevûdû re girêdayîne lê ne hevşêweyê hevûdû ne. Peyva şerm (shiyness) amaje ye ji bo hebûna daxwazîyeke ji tenêperestîyê, dudilî yan hest nekirin bi asûdeyî di nav wan rewşana da ku pêwîste têda pêwendî digel kesên din bête kirin))*[169] Mirov pêkhateyeke aloz e, di nava xwe da hest bi gelek vetîreyên derûnî dikin û vetîreyên wan nêzikî hevûdû ne, şermînî wiha li mirovan dike ku tenêperist û xerîb bin çimkî berdewam tirs û coşekê da ne û wiha li mirovan dike ku her çi di zîhna wan da heye derbibe (îfade bike) bi gumanekê derbibin.

Herwiha tu (hîç) kêmasî jî di derbirîn û şêweya mirovan da nebe lê dema ku gumana mirovan ji şîyana xwe hebû ew çi derdibe bi şermî derdibe. Çimkî herdem kûrtirîn hest ji bo kesan ewe ku nikari be di jîyana xwe da be destî bînî derrîy brrêt ?, çimkî *((ronkayî di hundurê me da ye, tenê reng di derûna me da ye))*[170]

---

[168].Yûsif 'Usman Hemed, ”*Genc û Girifte Derûnîyekan”,* Berga yekem û duyem, çapa sêyem, Le Billawkirawekanî Newalley Niwê, Çapxaneya Minare, Hewlêr, rûpel 27.

[169]. Martin Entonî, û | Meşxell Kewllosî, ”*10 Rêgey Asan Bo Çareseriy Şermînî”*, Çapxaneya Renc, çapa pêncem, Silêmanî, 2012, rûpel 13-14.

[170].Maksênis Fêrmîn, û | Azad Berzincî, ”*Sêyney Rengekan Romanî Befir”*, Çapxaneya Renc, sala berga dûwem hewlêr2006.R 145.

*Herwek Peşêw dibêje:*

*Le her cêyek çîya bibînim,*

*Dillim,*

*Wek le jiwanî yekemim da,*

*Dadexurpê,*

*Radeçellekê,*

*Sersam dewestim le binya...*

*Wa têdegem,*

*Le çîyay minrra dest pê deken*

*Çîyakanî hemû dunya!*[171]

Eger em temeşayekê li serê parçeya vê helbestê bikin, ji bo me zelal dibe ku Pêşew bi şêwazeke yekser amajeya tirsê nekiri be, ev jî ji ber wê ye ku peyva ‘’şerm’’ zêde di ferhenga helbestên Peşêw da tuneye.Lê bi rêya çenk odan (şîfre) ve şerm destnîşan kirîye, her di serê helbestê amaje bi ‘’terpilandina dilê xwe’’ kirîye. Eşkere ye ku ‘’veciniqîn’’ û ‘’terpilîn’’ ji ber şermê çê dibe, di vir da Peşêw di rewşa xwe ya derûnî da hem şerm dike û hem jî rastî hest guherînê hatîye.Bi wê ku ‘’her çîyayekî bibîne dilê wî vediciniqe (vecidiniqe)’’, di vir da şerm derketîye û sersam (matmayî) dibe ji wêneyê ku hest guherîna wî çê kirîye.

[171]. 'Ebdulla Peşêw, ”*Pişt Le Newa û Le Rû Kirêwe”*, rûpel 491.

**Encam**

Di vê vekolîna xwe da me çend alîyên ‘Êbdulla Peşêw xist rû û bi dîtina derûnnasan ve em di nav taqîkirina helbestên helbestvan da daqul bûn. Di dawîyê da em gihîştin çend encamên rekxistî ku bi belgeyên xurt yê berhemên helbestên helbestvan.Pêwendîyaderûnnasî bi wêjeyê ra rastîyeke nehaşatî ye (nayê înkarkirin). Çimkî pêwendîyeke wan ya dûr û dirêj bi hevdû ra heye, bi vî alî ve me perde li ser gelek raman û dîtin û behsan hilgirt û ew xetên di navbera derûnnasî û wêjeyê da diyar kir. Dibistanên (ekolên) derûn şîrovekar li ser destê Freud serîhildan; hokarek bû ji bo serhildana rêbaza rexneyî ya derûnî ku di derbarê helbestê da cextê li ser jîyannameya helbestvan û ew jîngeha ku helbestvan têda dijî dike, alîyê xazeyî (mecazî) û delaleta derûnî di cîhana helbestê da jî li alîyekî.Di nav ev ekolana da rexneya derûnî rêman û teknîkeke taybet bi xwe hebû, karê xwe yê rexneyî bi haweyekî (şêweyekî) kûrtir û dûrtir bi rê dixist, herwiha bi şêweyekî zanistî li ser deqan radiwestya û armanca xwe pê dike.Wek her nivîskar û helbestvanan ew cihê ku lê jîyaye li ser ‘Ebdulla Peşêw bandordar bûye, herwiha dema ku nîştîmana xwe bi cî dihîşt nîştîmana xwe ji bir nedikir. Peşêw ji alîyê neteweyî û welaparêzî li dû Ehmedê Xanî û Hecî Qadirê Koyî tê.Helbestên Peşêw, tomara rasteqînîyeke tijî jan û mahîyeta şikana dîrok û zilm û zorîya dagirker û kêmpayeyên (zelîl) kurd û tawana şêwaza navxweyî û sîyaseta felçbûyî ya kurdî ye. Helbestên wî li avhewayeke paqij perwerde dibin û wek helbestvanekî xwedî helwest û dijî hemû jîyaneke dirinde û reş û şeytanî da diçe û dibe alîkar û alîgirê mirovên pelçiqandî (mazlûm) yên cîhanê û bi taybetî mirovên pelçiqandî yên gelê xwe.Hêmagerî (sembolîzm) vetîreyeke nû nîye, belkî her ji mêj ve ev vetîreya di helbestên kurdî da hatîye dîtin, lê di helbestên hevçerx da zêdetir ketîye nava helbestan. Ev li alîyekî û li alîyê din jî armanca wan cuda ye. Herwiha di helbestên hevçerx da çavkanîya hêmayên wan cuda ne, hêmager (sembolîst) wezin û qafîye têkşikandin ev jî bûye hoya serhildana helbestên azad ku Peşêw jî yek ji wan e.Bikaranîna hêma ji alîyê helbestvanan ve ji bo veşartina mexzaya ? sîyasî, civakî û dildarî ye ku bi têgihîştineke din helbestên xwe dihûnin.Çavkanîyên hêmagerî di helbestên Peşêw da ji keriste (malzeme) , bûyerên dînî, efsane, dîrok, reng , siruşt û kelepûran pêk tê.Bêhêvîtîya Peşêw di helbestên wî da xuya dibe, çimkî li gorî wî wiha ye ku gelê wî naxwînin û bi dû zanyarî û zanistan nakevin, herwiha li gor wî tenê dengê çepikan diçe guhê berpirsan.

**Çavkanî**


- Abin Mintevir*, Bê Nav Nêşan* ؟, Çapa Dehem, Tihran 1408.
- Adil Germiyanî*, ”Derûn Şîkarî û Edebî Derûnî”,* Govara Aynde, Hejmar 43, Hewlêr, 2003.
- Arik Firom ,*” Amiyd Anqlab ”,* Tircmayî Micîd Ruşingir, Çapaxnaya Tihran Çapa Êkem, 1368.
- Aso Omer Mûstefa *,” Beha Îstatîkekanî Şî'rî laî Pîremêrd, Berheva Şêx Nûrî Salih û Goran*, çapxaneîxanî,Êkem, Duhok, 2009.
- Azad Elî, *”Derbareî Derûnzanî Giştî”,*Çapxanaya Mûkiryan Hawlêr Bergî Yekem , 2007.
- Dîçiz, *”Rawanşnasî”,* Tihran Çapa yakam, Bê Waşanxane ,1379.
- E`zeddîn Ehmed E`zîz,” *Binemayên Derûnnasîya Giştî”,* Çap û Belavkirina Rojhelat, Çapa sêyemîn, Hewlêr 2012.
- Ebdella Nasrî *,”135 Filsey Afrîniş”,*Neşir Nihizt Zinan Musilman, Çapa *Êkem,Sinndc 1359.*
- Ebdulkerîm Hemîd Ebdulkerîm *,” Ehmed Mûxtar Begî Cav Şaîr û Mirov” ,* Çapxaneî Dezgaî Çap û Pexşî Serdem, Silêmanî , 2000.
- Ebdulla Peşêw ,”*Pişt le Newa û Rû la Kirêwe Şî'rî 1965 - 1979” ,* Çapî Çarem , Kurdistan 2014.
- ____________ *,” Pişt le Newa û Rû le kirê we , Ş'irî 1965 - 1979” ,* Çapî Sêyem , Çapxaneî (Hêvî) Hewlêr 2002.
- ____________, *”Hespim Hewre û Rkêfim Çiya” ,* Şî'rî 1890 - 2005 çapî Çarem , Kurdistan 2014.
- Ebdulqadir Mihemed Emîn *,” Wêneî Şî'rî le Rêbazî Romansî Kurdî Da”* Çapxanay Mûkiryan , Çapa Êkem, Hawlêr 2010.
- Ekrem Qeredaxî *, ”Sîmbolîzim le Edeb û Huner de ”,* Govara Aynda (j) 70 Çapxanaya Serdem Silêmanî Kanwnî Dwem 2007.
- Elî Akbir *,” Dihxida , Lixe Nameî Farsî” ,*Çapaxnaya Tihran, Çapa Êkem 1372.
- Eltusî , *” Bê Nav Nêşan”* Weşanxane Nediyare ,Tahran Çapa deyem 1979 .
- Ên'tî zade Keman û Dîgran *,”(Mirg )Micmu'e Mqalat ”*, Çapxanaya Antişarat Arixnun , Tihran 1388.
- Erestu, *”Fenê Şeîr”,* Tercumêyê Ebdulhusîn Zerînkub, Çapxanaya Amîr Kbîr, Çapa Dwem, Têhran 1369.
- Ferhad Pîrbal *,”Rêbaze Edebiyekan ”* Amade kirdin û Wegîran le Ferensiyewa , Çapî Dûwem , Çapxaneî Minare , Hewlêr , 2006
- Fexredîn Amîdyan *, ”Şeraî Namdar kir ”,* Çapxanaya Neşir Ana , Tehran Çapa Êkem , 1388.
- Fuad Sidiq*,” Derûnzanî Komelayetî”,* Berîweberayetî Giştî Ktîbxanekan, Çapa Sêyem, Hewlêr, 2015.

- Hawjîn Silêwe Îsa *, "Binyatî Wêneî Hunerî le Şî'rî Şêrko Bêkes De" ,* Çapxaneî Dezgaî Çap û Pexşî Serdem ,Silêmanî , 2009.
- Heme Kerîm Hewramî *, "Bizotneweî Sîmbolîzim Çend Nimûneyek le Edeb û Hunerî Sîmbolîzim ",* Çapxanay Serdem Silêmanî, Çapî Yekem, 2006.
- Hesen Mehmûd Heme Kerîm *," Fetwakeî Melaî Xetê ( Efsaneî Mêjw Nûsêk )* , Çapxaneî Çarçira , Silêmanî, 2006.
- Husên Xazî Kak Emîn *, "Niwê kirdneweî Şî'rî Kurdî le Salî 1932 ta kotay 1949 le Kurdîstanî Îraq ",* Namaya Master Hewlêr, 2011.
- Îbrahîm Mehmud xelîl, *"Zanste Mirovayetîyekan u Rexney Edebî",* Wergêranî Newzad Ehmed Eswed, Govarî Serdem Jmare 56, Silêmanî,salî 2008.
- Idrîs Kerîm Mihemed *," Xwd û Beramberî le Qesîdeî ( Cardanî Merg )î Ebdulla Peşêw Da ",* G ( Aynde ) , j(72) , çapaneî serdem , Silêmanî , Ayarî 2007.
- În Alqva Hemedanî , Abul Alm'alî 'Bdalle Bin Mhimd Misyancî , Timhîdat ,*" Şirh 'Fîf 'Sran* , Çap Dwem , Antişarat Mnuçhir , Tihran ,1369
- Îzedîn Îsmaeîl, *"Altefsîr Alnefsî Aladeb",* Dar Ale`ude, Êkemî Beyrut 1981.
- Kameran Cewherî "*Hellweda,Peşêw Le Nêwan 'Eşq û Nîştman da*", Kovara Mehabad hawlêr, jimare 131-132 sala 2012.
- Kameran Mihemed Emîn Simaîl *," Hevpeyvîn Digel D.( Ebdulla Peşêw )" ,* g ( Nîga ) , j 60 , Çapxana Şivan , Silêmanî , 2006
- Kamil Hasan Besîr, *"Mêjûy Rexne Sazî",*Çapa Ekem Silêmanî , Bê Sal.

- Kar hurnay , "*Tizad Dirunî Ma ",* Tercumey , Mihemmed Ca'fir Mêfa , Ntişarat Ciht , Tahran 1967
- Karzan Kerîm Emîn*," Arastekanî Rexneî Şêeirî Kurdî, Be Nimuney Masternamekany Edeb",*1988- 2000, Namey Master Kolêjî Ziman, Beşy Kurdî, Zankoy Selaheddîn 2009
- Kemal Meirof, *"Rexneî Nwêî Kurdî ",*Çapxaneî Xanî Wezarety Roşenbry, Silêmanê 2007.
- Kerîm Şerîf Qereçetan*î, "Derwazey Derûnzanî*", Çapxaney Zanko, hewlêr 1996 .
- ____________________, *"Saykolojyaî Giştî" ,* Çapxaney Zanko Çapa êkem, hewlêr *2014.*
- _____________________, *"Siroştî mirovayetî le rwnagey Can Cak Roso û Zigmond Firoydewe", çapî yekem, çapxaney wezaretî perwerde, hewlêr 2003.*
- *Komelêk nûser ," Xeyal û Rûh Çand Têrwanînek Bû Şî'irî Kurdî ", çapxaneî dezgaî çap û pexşî serdem , Silêmanî 2004.*
- Maksênis Fêrmîn, û| Azad Berzincî, *"Sêyney Rengekan Romanî Befir",* Çapxaneya Renc, Sala Berga Dûwem , Hewlêr 2006.

- Marif Xeznedar, *”Bitî Şikaw (Pûtê Şikyayî)”,* Pêşekî Çapa Yekem, Kerkûk, 1968.
- Martin Entonî, û Meşxell Kewllosî, *”10 Rêgey Asan Bo Çareseriy Şermînî”,* Çapxaneya Renc, Çapa Pêncem, Silêmanî, 2012.
- Mihemed Mehmud Alcibury, *”Mebhes Fî Mtabe”*` Came` (Musil, Mudirîyet Metbe`t Alcame`e, 1984.
- Mihemed Xidir Meûlod, ”Hevpeyvîn Digel Ebdulla Peşêw Govara Raman” , J (78) Kanona Yekem, Hewlêr 2002.
- Mihemed Yunis. *”Mebadî e`Lim AlnefisÊ*”, Daralşerq Lilneşir w Altewzie` Urdin 2004.
- Mihemed Zexlul Selam*,”Bê Navnêşan”* Elnaşir Menşa Elmearif Eleskenderiye, Bê Çap, Elqahire, 1981,
- Mistafa Xrim Dil , *”Tefsîr Nûr”* , Çapxanaya Ahsan, Tihran 1379 .
- Mistefa Gricî , *”Hirke Rae Drist Aw Birdist Bu”* , Pjuhişgae 'lum Alinsanî û Mgal'at Actma'î Chad Danişgahî, Tihran 1359.
- Muhemed Ebdulla Kelarî *, ”Sembolîzim Derbirînî ne Bînraw Be Hêma û Zalbûnî Bîr Be Ser Waqî Da” ,* g (Raman), J(105) , Çapxaneî Wezaretî Perwerde , Hewlêr , Şûbatî 2005.
- Nasir Babaxanî*, ” Hewtenamey Peyamî ”* Kurdistan, jimare 29, 13 Pûşpera 1385 a Koçî.
- Newzad Ehmed Eswed, *”Mîtodî Saykolocî Le Rexneî Edebî Da”,* Govarî Ayinde, Jmare 78, Hewlêr 2008.
- Niyoton*, ”Darwnnşîkarê”,*Çapê Yekem , Hewlêr 1996.
- Pexşan Elî Ehmed *, ”Şêwazî Şî'rî Goran ”,* çapxaneî renc , Çapa êkem, Silêmanî , 2009.
- Raxb Asifhanî ,Hsîn Bin Mhimd *, ”Tircme û Tihqîq Mfirdat Alfaz Qrrirn Krîm ”,* Tircmey Xlam Rza Xisruy Hsînî , Antişarat Mirtçuy, Tihran1375.
- Rêbwar Mihemed Melazade, *”Nalî û Saykolociyaî Şêeir*”, Çapxaney Rojhelat, Berga Ekem, Hewlêr 2016.
- Rizgar Şêxanî *,” Êkêlof û Karîgerî Nax” ,* R(Hewlêr) , j(823) , 14_Temûzî_2010.
- Serdar Ehmed Hesen Gerdî ,*” Binyatî Wêneî Hunrewî le Şî'rî Kurdî de 1970 – 1991”* , Dezgay Aras, Çapa yekem, Hawlêr 2000.
- Serdar Ese`d, *”Kurte Basêk le Bareî Saykology Giştî”,* Çapxansy Mukrîyan, Berga Dwem, Hewlêr 2014.
- Şermîn Îbrahîm Ezîz , *”Peşêw Tazekirdnewe Le Şîrî Kurdî Da”,* Hawlêr Namaya Mastar 2005.
- Şewqî Çîf(d), *”Fî Eledeb We Elneqd*”,Çapxanaya Daralmearif, Çapa yekem , Elqahire,1999.
- Sozan Cemal*, ”Qutabxanekanî Derûnnasî ”,* Govarî Zanistî Serdem Jimare 38 , Silêmanî 2010.

- Stanlî Hêmin, *”Alneqd Aledebî we Medaris Alhdes”,* Tercumet Ehsan Ebas-Mihemed Yusif Necim, Mueseset Franklin Almusahemet lil Tibaet We Alneşir,Qahêre 1999.
- Şukriye Resul, *”Tîyorî Edebî”,* Wergêranî, Serdar Ehmed Gerdî, Çapxaneî Mardîn, Hewlêr 2010.
- Tele`t Mensur, *”Oses e`lim Alnefis”,Bê Weşanxane ,* Çapa Ekem, Misir 1978.
- Yûsif 'Usman Hemed, *”Genc û Girifte Derûnîyekan”,* Berga Yekem û Duyem, çapa Sêyem, Le Billawkirawekanî Newalley Niwê, Çapxaneya Minare, Hewlêr2000.
- Zerînkub Ebdulhusên, *”Neqdê Adebî”, Çapxanaya* Emîr Kebîr Çapa Çaram, Têhran 1369.
- Zibîdî *, ”Bê nav Nêşan”* Weşanxane nediyare , Çapa Dû , Tahran 1325 .
- Ziyad Nadir Elalî *, ”Ebdulla Peşêw Helbestvanek le Regezî Serbizêwî ”,* Çapî Yekem, Çap û Bilawkirdneweî xaney Erbîl 2006.

**Xwe Jînenîgarî**

Di 13/6/1989 li Bajêr a Hewlêr ê hatim dinya yê. Lise ya xwe ji xwendinge yê “Azadî” qedandiye herwisa lîsansa xwe  li Zanîngeha Selaheddînê qedandiye. Niha jî xebat dikim ku lîsansa bilinda xwe li Zanîngehe Yuzuncu yîlê biqedînim....